KT
Zanîngeha Mardîn Artukluyê
Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî
Teza Lîsansa Bilind

# DI HELBESTA CEGERXWÎN DE RENGVEDANÊN TÊKILIYÊN ÎQTÎDARÎ

Mikail BÜLBÜL
10711004
Şêwirmend
Doç. Alk. Dr. Abdurrahman ADAK
Mêrdîn 2013 ii

Ev xebat ji aliyê jûriya me ve di Beşezanista Bingehîn a Ziman û Çanda Kurdî de weke teza lîsansa bilind hatiye pejirandin.
(îmze)
Rêvebir :…………………………………….
(Nîşana Akademîk, Nav - Paşnav)
(imze)
Endam :…………………………………….
(Nîşana Akademîk, Nav - Paşnav)
(îmze)
Endam :…………………………………….
(Nîşana Akademîk, Nav - Paşnav)
(îmze)
Endam :…………………………………….
(Nîşana Akademîk, Nav - Paşnav)
(îmze)
Endam :…………………………………….
(Nîşana Akademîk, Nav - Paşnav)
Sediqandin
Ez disediqînim ku îmzayên jorîn ên endamên perwerdeyê yên navborî ne.
Îmze ....................................
Nîşana Akademîk, Nav-Paşnav
Rêvebirê Enstîtûyê
(Mor) iii

**KURTE**

**“DI HELBESTA CEGERXWÎN DE RENGVEDANÊN TÊKILIYÊN ÎQTÎDARÎ” MİKAİL BÜLBÜL**

Di vê tezê de “têkiliyên îqtîdarî” yên di helbestên Cegerxwîn de ku weke yek ji helbestvanên herî mezin ê edebiyata kurdî yê sedsala bîstan tê zanîn, hatine şîrovekirin. Cegerxwîn ji ber xisûsiyetên dewra ku tê de jiyaye bûye şahidê gelek bûyerên civakî, exlaqî, aborî, siyasî ku Şerê Cihanê yê Yekemîn, Şoreşa Oktobirê ya li Rûsyayê, serhildana Şêx Seîd, dagirkirina Frensayê ya Sûrî, Şerê Cihanê yê Duyemîn, avabûn û hilweşîna Komara Kurdistanê li Îranê, Şoreşa 58an li Iraqê ji bûyerên girîng in ku bi awayekî xurt tesîr li feraset û paşxaneya nivîsîna helbesta wî kirine û sînorên teorîk yê helbesta wî diyar kirine. Ji van bûyerên jor, hemûyan çi rasterast çi nerasterast tesîr li kurdan kirine û şikestin û serûbinbûnên civakî yên mezin pêk anîne. Ji ber ku Cegerxwîn jî ev şikestinên mezin di xwe de jiyane û helbesta wî ji vê atmosferê zaye; şer, bê statubûna kurdan, bêrîkirina dewrên biaram, xwestina netewe- dewletê hwd. mohra xwe li helbesta wî xistine û bi awayekî xurt hêma, fikr û têgehên têkildarî “îqtîdarê” tê de peyda bûne ku di vê xebatê de ev hemû di çerçoweya “têkiliyên îqtîdarî” de hatine ravekirin.

Gotina “têkiliyên îqtîdarî”, di tezê de ne hew di wateyekê de ku dikare bi têkiliyên “dewlet”, “rêvebirî” û hwd. bê referekirin, lê di wateyeke berfirehtir de hatiye bikaranîn ku hem hemû rengvedanên îqtîdarên makro yên mîna dewletê hem jî di wateya hemû têkiliyên ku rengvedana têkiliyên dora navend û jêderkên îqtîdarê pêk tên, hatiye bikaranîn. Lewre di vê tezê de hatiye dîtin ku rewş, têkiliyên ku têkildarî îqtîdarê ne, rengvedana xwe daye gelek helbestan. Di tezê de, di çerçoweya edebiyata neteweyî û îqtîdar, reddiyeya îqtîdarê, mîmarî û îqtîdar, dînitî û îqtîdar, zanîn û îqtîdar û raweya fermanî û îqtîdar de, şopên van têkiliyên îqtîdarî hatine tespîtkirin û ev weke rengvedana têkiliyên îqtîdarî hatine ravekerin û bi tehlîlên psîko-sosyolojîk û bi perspektîfek projeksiyonî ku perpektîfeke xwîner-navendî ye, şîrove hatine kirin.

**Peyvên Sereke:** Cegerxwîn, helbest, têkiliyên îqtîdarî iv

**ÖZET**

**CEGERXWİN ŞİİRİNDE İKTİDARİ İLİŞKİLERİN YANSIMALARI**

**MİKAİL BÜLBÜL**

Bu tezde yirminci yüzyıl Kürt Edebiyatının en büyük şairlerinden biri olarak bilinen Cegerxwin'in şiirindeki "iktidari ilişkiler"in yansımaları yorumlanmıştır. Cegerxwin, yaşadığı dönem itibari ile birçok önemli toplumsal, ahlaki, ekonomik ve siyasi olaya şahitlik etmiştir. Birinci Dünya Savaşı, Rusya'daki Ekim Devrimi, Şêx Said İsyanı, Fransa'nın Suriye İşgali, İkinci Dünya Savaşı, İran'da Mehabad Kürt Cumhuriyeti'nin kuruluşu ve yıkılışı ve Iraktaki 1958 devrimi bunlar arasındadır. Bunlar onun şiirinin arkaplan ve ferasetini güçlü bir şekilde etkilemiş ve şiirinin teorik sınırlarını belirlemiştir. Yukarıda sıralanan olayların hepsi, dolaylı yada dolaysız bir şekilde Kürtleri etkilemiş ve kırılmalar, alt üst oluşlar gerçekleştirmiştir. Cegerxwin'ın bu büyük kırılmalardan etkilenmiş olması ve şiirinin savaş, Kürtlerin statüsüzlüğü, ulus-devlet istemi, geçmiş dönemlere özlem gibi süreçler yaşamış olması "iktidari ilişkiler" olarak değerlendirilebilecek birçok imge, fikir ve kavramın kullanılmasına yol açmış ve tüm bunlar "iktidari ilişkilerin yansımaları" olarak ele alınmıştır.

Tezde "iktidari ilişkiler" söylemi sadece "devlet", "yönetim" gibi kavramların refere ettiği ilişkiler olarak değil, daha geniş bir anlamda kullanılmış bu söylem hem devlet gibi makro bir iktidarın hem de bu iktidarın merkezi ve kaynağı etrafında gerçekleşen tüm ilişkilerin çeşitli yansımaları anlamında kullanılmıştır. Dolayısıyla bu tezde iktidari ilişkilerin birçok şiire yansımasının olduğu tespit edilmiştir. Tezde ulusal edebiyat ve iktidar, iktidar ve reddiye, mimari ve iktidar, delilik ve iktidar, bilgi ve iktidar, emir kipi ve iktidar gibi açılardan iktidari ilişkilerin şiirdeki yansımalarının izleri tespit edilmiş ve bunlar iktidari ilişkilerin yansımaları olarak ele alınarak, psiko-sosyolojik tahliller, okuyucu merkezli projeksiyon yöntemiyle analiz edilmiş ve yorumlanmıştır.

**Anahtar Sözcükler:** Cegerxwin, Kürt şiiri, iktidari ilişkiler

**ABSTRACT**
**THE REFLECTIONS OF POWER RELATIONS IN CEGERXWIN'S POETRY**
**MİKAİL BÜLBÜL**
This dissertation interprets the reflection of "power relations" in the poetry of Cegerxwin who is known as one of the greatest poets in the Kurdish literature of twentieth century. During his life, Cegerxwin witnessed a lot of moral, economic and political important events. Among these events were the First World War, Sheikh Said's Rebellion, occupation of Syria by the French, The Second World War, the Foundation and Demise of Kurdish Republic in Iran, and the 1958 Revolution in Iraq. These events affected strongly the background and perception of his poetry and defined the theoretical boundaries of his poetry. All the events mentioned above affected the Kurds and breakings and upsets happened. The fact that Cegerxwin was affected by these breakings and upsets and the fact that the poetry went through the process such as no statute for Kurds, the demand for nation-state and nostalgia led to the using of a lot of images, opinions and conceptions and all these were dealt with as "the reflection of power relations".
In the dissertation, power relations are used not only as the reference of the conception such as "state" and "governance", but also in the broader sense as different reflection of all the relations taking place around both macro power such as state and the centre and source of power. Therefore in this dissertation you can see the reflection of power relations to a lot of poetry. This dissertation establishes the reflection of power relations to poetry in terms of national literature and power, power and denial, architecture and power, lunacy and power, knowledge and power, imperative mode and power. Psychosocial analysis are used and interpreted by reader centred projection method.
**Key words**: Cegerxwin, Kurdish poetry, power relations 

**NAVEROK**

KURTE.....III
ÖZET.....IV
ABSTRACK.....V
NAVEROK.....VI
PÊŞGOTIN.....IX
KURTEBÊJE.....XI
**DESTPÊK**
**1.** Bi Kurtî Jînenîgarî û Berhemên Cegerxwîn.....1
**1.2.** Xebatên Sereke yên di Derbarê Cegerxwîn de .....4
**1.3.** Rêbaza Tezê, Têgeh û Keresteyên ku di Tezê de Hatine Bikaranîn.....5
**BEŞA YEKEM**
**DI HELBESTA CEGERXWÎN DE ÎQTÎDAR Û REDDİYEYA ÎQTÎDARÊ**
**1.1.** Di Helbesta Cegerxwîn de Rengvedana Reddiyeya Îqtîdarê.....8
**1.2.1.** Di Helbesta Cegerxwîn de Reddiyeya Îqtîdara Arîstokratîk.....11
**1.2.2.** Di Helbesta Cegerxwîn de Rengvedana Reddiyeya Îqtîdara Teokratîk.....18
**BEŞA DUYEM**
**DI HELBESTA CEGERXWÎN DE RENGVEDANÊN TÊKILIYÊN ÎQTÎDARÎ**
**1. Di Helbesta Cegerxwîn de Têkiliya Îqtîdarê û Edebiyata Neteweyî**
**1.1**. Têkiliya Îqtîdarê û Edebiyata Neteweyî.....27
**1.2.** Di Helbesta Cegerxwîn de Rengvedana Têkiliyên Îqtîdarî di Çerçoweya Edebiyata Neteweyî de.....30
**1.2.1.** Evîna Welat û Îqtîdar.....38

**2. Di Helbesta Cegerxwîn de Têkiliya Îqtîdarê û Zanînê**
**2.1.** Têkiliya Îqtîdarê û Zanînê......................................................................................50
**2.2.** Di Helbesta Cegerxwîn de Rengvedana Têkiliyên Îqtîdarî di Warê Zanînê de.......51
**3. Di Helbesta Cegerxwîn de Têkiliya Îqtîdarê û Mîmariyê**
**3.1.** Têkiliya Îqtîdarê û Mîmariyê....................................................................................67
**3.2.** Di Helbesta Cegerxwîn de Rengvedana Têkiliyên Îqtîdarî di Warê Mîmariyê de...69
**4. Di Helbesta Cegerxwîn de Têkiliya Îqtîdarê û Dînitiyê**
**4.1.** Têkiliya Dînitî û Îqtîdarê.........................................................................................81
**4.2.** Di Helbesta Cegerxwîn de Rengvedana Têkiliyên Îqtîdarî di Çerçoweya Têkiliya Îqtîdar û Dînitiyê de.........................................................................................................84
**5. Di Helbesta Cegerxwîn de Têkiliya Îqtîdarê û Raweya Fermanî**
**5.1.** Têkiliya Îqtîdarê û Raweya Fermanî.......................................................................91
**5.2.** Di Helbesta Cegerxwîn de Rengvedana Têkiliyên Îqtîdarî di Çerçoweya Raweya Fermanî de.........................................................................................................92
**ENCAM**...........................................................................................................................96
**ÇAVKANÎ**.........................................................................................................................98 

**PÊŞGOTIN**

Mebest ji vê xebatê, nirxandin û şîrovekirina têkiliyên îqtîdarî ne ku rengvedana xwe dane helbesta wî û aliyekî xurt a helbesta Cegerxwîn pêk anîne. Çawa ku li gorî nêrîna Foucault jî têkiliyên îqtîdarî li her derê hene û ji her derê dizên, di helbesta Cegerxwîn de jî têkiliyên îqtîdarî ji gelek aliyan ve rengvedana xwe daye helbesta wî û di gelek cihan de xuya dibin. Di tezê de, ji bo şîrovekirin û nîqaşkirina hêma, têgeh û têkiliyên îqtîdarî yên di helbesta Cegerxwîn de, rêbazeke xwîner-navendî hatiye bikaranîn ku rêbaza xwîner-navendî, ji ravekirin û şîroveyên sûbjektîv pêk tê. Lewre ji ber xwezaya şîroveyê bixwe jî, sûbjektîfî bêçare ye. Ji ber ku her xwendinek li gor xwendevan û sûbjektîvîteya wî bi wateyên cuda bi encam dibe.

Ev tez ji pêşgotin, destpêk, du beş û encamê pêk tê. Di destpêkê de, pêşî bi kurtî behsa jînenîgarî û berhemên Cegerxwîn hatiye kirin, li ser çend xebatên sereke ku li ser Cegerxwîn hatiye kirin agahî hatiye dayîn, piştre jî li ser rêbaz û têgehên sereke yên ku di tezê de derbasbûne agahî hatine dayîn.

Di beşa yekem, *reddiyeya îqtîdarê* de, weke têkiliyeke îqtîdarî, piştî ku bi kurtahî behsa rengvedana reddiyeya îqtîdarê û sedemên wê hatiye kirin, bi mînakên ji helbesta Cegerxwîn, hem redkirina Cegerxwîn ya îqtîdarê û hem jî xwestina avakirina îqtîdareke din, bi rengvedanên helbesta wî, hatine şîrovekirin. Lewre hem li dijî îqtîdarên arîstokrat û teokratîk şer kiriye, hem jî li şûna wan îqtîdaran, îqtîdara ku dil kiriye pêk were, rengvedana xwe bi awayekî xurt daye helbesta wî.

Di beşa duyem de li ser rengvedanên têkiliyên îqtîdarî de nirxandin hatine kirin ku ji pênc binbeşan pêk tê. Di binbeşa yekem, *edebiyata neteweyî û îqtîdarê* de, bi kurtahî çerçoweyek ji bo têkiliya di navbera edebiyata neteweyî û edebiyatê de hatiye danîn. Piştre jî weke beşeke ji têkiliyên îqtîdarî yên helbesta Cegerxwîn, ji rengvedana wê ya helbestê mînak hatine dayîn.

Di binbeşa duyem, *zanîn û îqtîdar*ê de piştî ku bi kurtahî li ser têkiliya têgeha zanîn û îqtîdarê çerçoweyek hatiye danîn, bi mentixa ku "*îqtîdar li ser zanînê ava dibe"* şîrove hatine kirin" gelek têkilî hatine tespîtkirin û ji rengvedanên vê yekê ya helbestê mînak hatine dayîn. 

Di binbeşa sêyem, *mîmarî û îqtîdarê* de, piştî ku bi kurtahî li ser têkiliya îqtîdar û mîmariyê girîzgahek hatiye kirin û mentiqa wê têkiliyê hatiye diyarkirin, di helbesta Cegerxwîn de, rengvedanên têkiliyên îqtîdarî yên di warê mîmariyê de hatine tesbîtkirin û taybetiyên mîmariyê di pêwendiya têkiliyên îqtîdarî de hatine şîrovekirin.
Di binbeşa çarem, *dînitî û îqtîdarê* de piştî ku bi kurtahî têkiliya dînitî û îqtîdarê hatiye îzahkirin ku têgeha dînitiyê di pêwendiya têkiliyeke îqtîdarî de hatiye qebûlkirin, dînitî weke stratejiyeke ku ji hêla mûqtedîran ve ji bo jiqewetxistin, berterefkirin û biçûkxistina mixalifan tê bikaranîn hatiye dîtin û şîrovekirin û ji rengvedanên wê yên helbestê mînak hatine dayîn.
Di binbeşa pêncem, *raweya fermanî û îqtîdarê* de piştî ku bi kurtahî çerçoweya têkiliya raweya fermanî û îqtîdarê hatiye danîn, sentaksa ku di helbesta Cegerxwîn de hatiye bikaranîn, "raweya fermanî" weke rengvedana têkiliyên îqtîdarî hatiye dîtin û ji helbesta Cegerxwîn mînakên rengvedanên vê yekê hatine dayîn.
Weke dawî dixwazim spasiyên xwe ji bo şêwirmendê tezê serokê Beşa Ziman û Wêjeya Kurdî Doç. Alk. Dr. Abdurrahman Adak re bikim ku di amadekirina tezê de piştgirî da min. Ji bo ku tez xwendin û kêmasiyên wê jimin re vegotin ji Prof. Dr. Ahmet Tarî, Doç. Alk. Dr. Tahîrhan Aydin, nivîskar Îrfan Amîda re spas dikim. Dîsa spasdar im ku di afirandina derfeta amadekirina vê teza bi kurdî de, di serî de rêvebirê Enstîtuya Zimanên Zindî yên Tirkiyeyê Prof. Dr. Kadrî Yildirim, Serokê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî Doç. Alk. Dr. Hayrûllah Acar ku gelekî keda wan çê bû û gaveke dîrokî avêtin.
Her wiha ji bo mazûbanî û dilgermiya Şewket Sindî ku ez li Zaxoyê kirim mêvan û derfeta ku li Zanîngeha Zaxo û Zanîngeha Dihokê lêkolînan bikim pêk anî, gelekî minetdar û spasdar im. Ji bo alîkarî û pêşniyazkirina çavkaniyan jî spasdar im ji bo Ahmed Kurdî, Sîdar Yîgît, Serhat Saz û hevjîna min Aslîxan.
Mêrdîn
2013

**KURTEBÊJE**
**alk. :** alîkar
**amd. :** amadekar
**b.d. :** bêyî dîrok
**bnr. :** binêre
**ç. :** çap
**h.b. :** heman berhem
**j. :** jimare
**r. :** rûpel
**vgz. :** veguhêzer
**hwd. :** her wekî din
**wer. :** wergêr

1

**DESTPÊK**

**1.Bi Kurtî Jînenîgarî û Berhemên Cegerxwîn**

Cegerxwîn ku bi navê xwe yê eslî Şêxmûs Hesen e, yek ji xîmên helbesta kurdî ku di dîroka edebiyata kurdan de xwedî cihekî taybet e. Ew di serê sedsala bîstan de hatiye dinyayê. Ew diyar dike ku di pênaseya wî ya fermî de zayîn, sala 1900î hatiye nivîsîn, lê dibe ku ev dîrok ne rast be[1]. Lê ji îfadeyên wî yên din teqez der dikeve ku ew di sala 1903yan de hatiye dinyayê. Di helbesta xwe ya bi navê "Birhên xwe meşkîne"[2] de dibêje: "*Jîna me di heftê û şeşan ez çi bibêjim*" û dîrok jî "26.9.1979" avêtiye bin wê. Her wiha helbesta bi navê "Bi Kurtî Jîna Min" jî dîroka 1903yan piştrast dike ku dibeje: "*Sala hezar û nehsed û sê ez hatim dinyayê*"[3]. Ji van herdu helbestan diyar dibe ku ew dîroka zayîna xwe weke 1903yan qebûl dike. Cihê jidayikbûna wî jî li gorî ku di jinenîgariya xwe de dibêje nediyar e; ew dibe ku ew li Hesarê (gundek e li ser qezeya Kercewsê ye) jî û li Qesra Qelendera (gundekî mezin e li beriya Mêrdînê) jî hatibe dinyayê.[4]

1 Cegerxwîn, *Jînenîgariya Min*, Weşanên Apec, Stockholm, 1995, r. 24
2 Cegerxwîn, *Aşitî,* Stenbol, Weşanên Avesta 2003, r. 114
3 Cegerxwîn, *Agir û Pirûsk,* Weşanên Avesta, Stenbol, 2003, r. 278
4 Cegerxwîn, *Jînenîgariya Min*, r. 24
5 Cegerxwîn, bnr. *Jînenîgariya Min*

Cegerxwîn di berhema xwe ya "Jînenîgariya min"[5] de behsa gelek bûyer û serpêhatiyên di jiyana wî de qewimîne dike. Li gor ku di jînenîgariya xwe de, jiyana xwe vedibêje; piştî zaroktiya wî ya di nava feqîrî û perîşaniyê de, dema li Amûdê (1918) bavê wî û piştî bav, bi salekê diya wî dimire hîn bêtir perişan dibe. Piştî ku bavê wî dimire geh li cem birayê xwe geh jî li cem xwişka xwe dimîne, şivantî û rêncberiyê dike. Jixwe ji yandzdeh xwişk û birayan hew birayek û xwişkek dimîne. Bi qasî du sala di rêhesin de dişuxule di 1920an de ji bo xwendinê berê xwe dide deşta Diyarbekirê. Di 1924an de ji Şewqî Begê Erxenî hijmendiya Kurdperweriyê hîn dibe û bi gotina wî, hişyar dibe. Jixwe piştî serhildana Şêx Seîd bi çavê xwe dibîne bê çi tê serê kurdan ev dibe şikestin û herwiha dînamîkek ji bo helbest û berhemdariya Cegerxwîn. Di sala 1928an de dibe Seyda û dizewice. Heta serê salên sihî meletiyê dike dawî dev jê ber dide, tê li Amûdê bi cî dibe û piştî devjêberdana meletiyê dibe mûxalîfê şêx û mela û axayan. Ji ber ku li gora wî sedema rewşa feqîrî, nezanî û xizaniya kurdan ew in. Li Amûdê di 1937an de ew û çend hevalên xwe bi navê *Nadiya Ciwankurd* komeleyekê ava dikin. Ev komele piştî demekê ji hêla Frensewiyan ve tê girtin. Cegerxwîn 1946an 2

de tev li rêxistina Xoybûnê dibe. Di 1946an heta 1957an bi komunîstan re dixebite. Piştî ku ji komunîstan vediqete, ev û hevalên xwe rêxistina bi navê "Azadî"yê saz dikin. Di sala 1958an de tev li Partiya Demokratê Kurdî dibin. 1959an de rêxistin wî dişîne Iraqê, Zanîngeha Bexdayê da ku dersên Kurdî bide, ji ber Kurdan hinek mafên xwe bi dest xistine. Lê piştî navbera ereb û kurdan xera bû, di 1962an de wî dersînor dikin. Piştî vegera Sûrî, di sala 1969an de dîsa vedigere Iraqê û tev li şoreşê dibe. Lê piştî salekê vedigere û di 1973an de ji ber zextan diçe Lubnanê heta sala1975an. Di 1979an diçe Swêdê û di 22'yê Cotmeha 1984an diçe rehmetê. Niha gora wî li Qamişlo di hewşa mala wî de ye.
Cegerxwîn her çiqas ne hew helbestvan e û di warê ziman, çîrok, çand û dîrokê de jî xwedî berhem û paşxaneyeke xurt be û di van waran de xwedî berhem be jî nasnameya wî ya ku ew kiriye Cegerxwîn helbestên wî ne. Helbestên wî ji bo sedan stran û selîqeyan bûne kaniyeke bêdawî, ji bo stranbêjên kurd bûye gencîneya sereke. Li ser hejmara berhemên Cegerxwîn hîn tiştekî zelal tune ye. Li gora kurê wî Keyo Hassan[6] zêdetirî sî berhemên wî hîn nehatine çapkirin. Lê li gor lêkolîna Drs Yusuf Kaynak[7] ku di pirtûka xwe de destnîşan kiriye zêdeyî bîst berhemên neçapkirî hene. Di dawiya berhema Cegerxwîn, "Jînenîgariya Min"[8] de xebatên çapkirî, bi vî rengî ne:

6 http://www.zaphaber.com/cegerxwin-eserleri-basilmadi-7508h.htm, (06.012.2012)
7 Drs Kaynak, Yusuf, Jînenîgariya Cegerxwîn û Berhemên Wî , Weşanên Do, Îstanbul, 2010 r. 159
8 Cegerxwîn, *Jînenîgariya Min*, r. 414

1. Dîwana Yekem, Prîsk û Pêtî, 1945, Şam, helbest
2. Cîn û Gulperî, 1948, Şam, çîrok
3. Dîwana Diwem, 1954, Şam, helbest
4. Reşoyê Darî, 1956, Şam, çîrok
5. Gotinên Pêşiyan, 1957, lêkolîn
6. Awa û destûra Zimanê Kurdî, 1961, Bexda, rêziman
7. Ferheng, Beşa Yekem, 1962, Bexda
8. Ferheng, Beşa Diwem, 1962, Bexda
9. Dîwana Siyem, Kî me Ez, 1973, Beyrûd
10. Salar û Medya, 1973, Beyrûd
11. Dîwana Çara, Ronak, Weşanên Roja Nû, 1980, Stockholm
12. Dîwana Pênca, Zend-Avista, Weşanên Roja Nû, 1981, Stockholm
13. Dîwana Şeşa, Şefeq, Weşanên Roja Nû, 1982, Stockholm

14. Dîwana Hefta, Hêvî, Weşanên Roja Nû, 1983, Stockholm
15. Dîwana Heşta, Aşitî, Weşanên Roja Nû, 1985, Stockholm
16. Tarîxa Kurdistan, Cild 1, Weşanên Roja Nû, 1985, Stockholm
17. Tarîxa Kurdistan, Cild 1, Weşanên Roja Nû, 1987, Stockholm
18. Folklora Kurdî, Weşanên Roja Nû, 1987, Stockholm
19. Jînenîgariya Min, Weşanên Apec, 1995, Stockholm
20. Nivîsarek li ser dîbaca Ehmedê Xanî, Weşanên Apec, 1995, Stockholm

Di vê lîstê de berhemeke kêm heye ku ew jî "Şerefnama Menzûm" e û çapa wê ya yekem li Beyrûdê, di 1997an çê bûye.
Cegerxwîn çawa ku ji jînenigariya wî jî diyar dibe, di demekê û erdnîgariyêkê de jiyaye ku tê de gelek serûbinbûnên civakî û şikestinên dîrokî pêk hatine ku Şerê Cihanê yê Yekemîn, Şoreşa Oktobirê ya li Rûsyayê, avabûna netewe-dewleta Tirkî, serhildana Şêx Seîd, dagirkirina Frensayê ya Sûrî, perçebûna erdnîgariya kurdan, Şerê Duyemîn ê Cihanê, avabûn û hilweşîna Komara Kurdistanê li Îranê, Şoreşa 58'an li Iraqê ji wan serûbinbûn û şikestinan yên sereke ne. Van bûyeran tesîr li wî kirine, şikestin pêk anîne û ji bo krîstalîzekirina êşên wî bûne dînamîkên xurt. Ew li pêvajoya avabûna netewe-dewletan rast hatiye ku kurd ji vê yekê bêpar mane û hewldanên wan şikest xwarine. Entelîjansiya kurdan a wê demê jî ketiye nava liv û tevgeran ku saziyên siyasî, çandî pêk anîne û kovar, pirtûk hwd. çap kirine. Cegerxwîn jî di nava van saziyan de çi aktîf çi ne aktîf cih girtiye ku di avabûna paşxaneya teorîk ya helbesta wî de cihekî girîng digirin. Cegerxwîn li ser bingeheke civakî, polîtîk helbest nivîsandine ku helbestên wî ji edebiyata klasîk ya kurdan hem bi awayekî rûxsarî hem jî bi awayekî naverokî veqetîneke xurt e.
Her çiqas ew ji çanda medreseyan hatibe jî ku medrese pirek e di têkiliya wî û kevneşopê de bi formasyoneke nûjen nivîsandiye û ew, veqetînek e ji vê çandê û hem bi awayekî rûxsarî hem jî bi awayekî naverokî, wî berê xwe daye nûjeniyê. Lewre ew ji edebiyata tesawûfa klasîk ya kurdî şikestineke epîstemolojîk e çima ku ew sekuler e.
Nirxandin û şîrovekirina têkiliyên îqtîdarî yên di helbesta Cegerxwîn de di heman demê de nirxandin û şîrovekirina helbasta Cegerxwîn e. Lewre mijarên helbesta wî çi bin jî, çi yên welatparêzî çi yên evînî û çi yên civakî û felsefî di hemûyan de hêma, şop, têgeh û metaforên ku bi awayekî îqtîdar û têkiliyên îqtîdarî refere dikin, dikare bê dîtin. 4

Eger mirov peyvên weke text, tac, dar, seray, birc, dewlet, serwer, pêşeng, şêr, şivan, bindest, serdest, dewlemend, qata jor, qata jêr, serdar, rêber hwd. ji helbesta Cegerxwîn derxe wê wateyên piranî helbestên wî xerab bibin. Lewre Mîhaîl Bakhtîn ji bo *peyvê*, "*ne hew ji bo binavkirina tiştan in, di heman demê de tevgera li hember tiştan jî dihundurînin*."[9] digot. Di vê çerçoweyê de dema lê bê nêrîn dikare bê gotin ku di peyvên ku helbesta Cegerxwîn pêk tînin de tevgereke ku herdem aliyên îqtidarî ango têkiliyên îqtidarî pêk tînin peyda dibin.

9 Tery Eagleton, *Edebiyat Kuramı, Giriş.* wer. Tuncay Birkan, Ayrıntı Yayınları, İstanbul, 2011, r. 133

10 Ordîxanê Celîl, *Cegerxwîn'in Yaşamı ve Şiir Anlayışı*, wer. Edip Polat, Evrensel Basım Yayın, İstanbul, 2004

11 Ordîxanê Celîl, *Şî'r û Şaristanî Cegerxwîn*, wer. Îzedîn Mistefa Resûl, Spîrêz Press &Publîsher, Dihok, 2009

12 Yusuf Kaynak, *Jînenîgariya Cegerxwîn û Berhemên Wî,* Weşanên Do, İstanbul, 2010

### 1.2. Xebatên Sereke yên di Derbarê Cegerxwîn de

Xebatên ku li ser Cegerxwîn hatine kirin, dema gotar û nivîsên kovar û rojnameyan bê hesabkirin, dikare bê gotin ku sedan in. Lê mebest li vir, xebatên ku weke pirtûkeke, tezekê hatine amadekirin ango çapkirin. Dema bi vî çavî bê nêrin çend xebatên sereke yên di derbarê Cegerxwîn de, li gel mijara naveroka wan, bi kurtî bi vî awayî ne:

Ordîxanê Celîl, li ser Cegerxwîn pirtûkek nivîsiye ku navê wê yê orjînal "Poêzîya Cegerxwîne Bajarvaniyê" ye û di 1966an de li Erîvanê bi herfên Kîrîlî çap bûye. Wergera wê ya Tirkî jî ji aliyê Edîp Polat ve bi navê "Cegerxwîn'ın Yaşamı ve Şiir Anlayışı" [10] hatiye kirin û di 2004an de hatiye çapkirin. Ew pirtûk li ser jînenîgarî, berhem û feraseta wî ya helbestê sekiniye. Her wiha heman xebat bi navê "Şî'r û Şaristanî Cegerxwîn" [11] li Dihokê ji aliyê weşanên Spîrêz ve bi Soranî ku wergera wê Îzedîn Mistefa Resul kiriye, di 2009an de çap bûye.

Yusuf Kaynak, di xebata xwe ya bi navê "*Jînenîgariya Cegerxwîn û Berhemên wî*"[12] de ku li Holandayê, teza qedandina lîsansê ye, çawa ku ji navê wê jî diyar e, li ser jînenîgarî û naveroka berhemên wî xebitiye.

Newzad Ebdula Bamernî, di berhema xwe ya bi navê "*Aydyolojya di Hozanên Cegerxwînî da*"[13] ku di eslê xwe de teza masterê ye, li ser têkiliya wêje, îdeolojî û rengvedana wê ya helbesta Cegerxwîn sekiniye. 5

13 Newzad Ebdûla Bamernî, *Aydyolojya Di Hozanên Cegerxwînî Da,* Spîrêz Press & Publisher, Dihok, 2007
14 Perwîn Re'ûf Hadî Doskî, *Hizra Navneteweyî û Rengvedana Wê Di Hozana Nû Ya Kurdî da (Cegerxwîn, Goran û Qedrîcan wek nimûne*), Spîrêz Press & Publîsher, Dihok, 2011
15 Davut Özalp, *Jînenîgarî, Têkoşîn û Berhemdariya Cegerxwîn*, edîtor Mehdî Tanrıkulu, Weşanên M, İstenbol
16 Ömer Faruk Yekdeş, *Nazım Hikmet ve Cegerxwin de Aşk Şiirinin İdeolojisi*, Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi, Bilkent Üniversitesi Türk Edebiyatı Bölümü, Ankara, 2008
17 Tzvetan Todorov, *Poetikaya Giriş,* wer. Kaya Şahin, Metis Yayınları, İstanbul, 2008, r. 11
18 Eagleton, Edebiyat Kuramı, r. 26,27

Perwîn Reûf Hadî Doskî di berhema xwe ya bi navê "*Hizra Navneteweyî û Rengvedana wê di Hozanên Nû ya Kurdî da (Cegerxwîn, Goran û Qedrîcan wek Nimûne"*[14] de li gel Goran û Qedrîcan, li ser rengvedana fikra navneteweyî ya helbesta Cegerxwîn sekiniye.
Di berhema "*Jînenîgarî, Têkoşîn û Berhemdariya Cegerxwîn*"[15] de ku Davut Ozalp edîtoriya wê kiriye, cih daye deh gotarên cuda ku deh nivîskarên cuda tê de cih girtine û gotar bêtir li ser ziman, naverok û hêmayên helbestên wî ne.
Ömer Faruk Yekdeş, di xebata xwe ya masterê ya bi navê "*Nazım Hikmet ve Cegerxwin de Aşk Şiirinin İdeolojisi*"[16] de li ser feraseta evîna di helbestên Cegerxwîn de, analîzên xurt kirine. Yekdeş di vê berhema çapnebûyî de ku li Zanîngeha Bîlkentê hatiye pêşkêşkirin, feraseta evînî ya Nazim Hîkmet û Cegerxwîn ku evîneke îdeolojîk e, rûber kiriye û bi hûrgulî sekiniye.

**1.3. Rêbaza Tezê, Têgeh û Keresteyên ku di Tezê de Hatine Bikaranîn**

Di tezê de, ji bo şîrovekirin û nîqaşkirina hêma, têgeh û têkiliyên îqtîdarî yên di helbesta Cegerxwîn de, bi rêbazeke xwîner-navendî ku ji ravekirin û şîroveyên psîkolojîk û sosyolojîk pêk tê hatiye bikaranîn. Lewre ji ber xwezaya şîroveyê bixwe jî, sûbjektîvî bêçare ye. Ji ber ku her xwendinek li gor xwendevan û sûbjektîvîteya wî bi wateyên cuda bi encam dibe. Lewre di vê xalê de em pişta xwe didin Tzvetan Todorov: *"Her berhem, ji aliyê xwendevanê xwe ve ji nû ve tê nivîsîn; her xwendevan bi şêwaza şîrovekirineke ku ji çanda wî tê, ji dîroka wî tê yanî ji vegotineke dûrî berhemê tê ku ew bixwe ji vê yekê rasterast ne berpirsiyar e, berhemê dixwîne."*[17] Dîsa di çerçoweyeke xwîner-navendî de Tery Eagleton wiha dibêje: "Hemû berhemên edebî, ji aliyên civakên ku wan dixwînin ve, ne bi zanebûn be jî dîsa tên nivîsîn, hetta xwendina berhemekê ku di heman demê de ne nivîsîn be tune ye."[18] Ji aliyê watedarkirin û têgihiştina berhemê jî têkiliya xwendevan û berhemê Eagleton vê 6

raveyê dike: "*Xwendevanên cuda di pêkanîna cuda ya berhemê de azad in û şîroveyeke rast ku potansiyela semantîk ya berhemê xelas bike tune ye.*"[19]

19 H.b. r. 93

20 Sevan Nişanyan, *Sözlerin Soyağacı, Çağdaş Türkçenin Etimolojik Sözlüğü,* Adam Yayınları, İstanbul, 2007, r. 214

21 Ahmet Cevizci, *Felsefe Sözlüğü*, Paradigma, İstanbul, 2000, r. 494

22 Amd. İsamail Parlatır, Nevzat Güzaydın, Hamza Zülfikar, Belgin Tezcan Aksu, Seyfullah Türkmen, Yaşar Yılmaz, Türk Dil Kurumu, *Türkçe Sözlük*, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara, 1998, c. 1, r. 1063

23 Michel Foucault, *"*İktidar ve Bilgi", *İktidarın Gözü,* wer. Işık Ergüden, Ayrıntı Yayınları, İstanbul, 2007, r. 175-6

Têgeha "îqtîdar"ê ku ji sedsala heştan û vir ve di Erebî de tê bikaranîn û ji mesdera "q-d-r"ê tê û wateya "biqudretbûn, têrhebûna qewetê"[20]dide. Weke têgeheke felsefî jî sê wateyên "îqtîdarê" hatine nîşandan: 1. Bi awayekî giştî, kirina çalakiyê, hêz an jî behremendiya xwezayî ya kirina tiştinan. 2. Hêza dadî, siyasî an jî exlaqî ku îmkana tesîrlêkirin an jî kirina çalakiyê dide. 3 Hêza siyasî dadî û fîîlî ku destê rêvebirên dewletê de ye." [21] Her çiqas di erebî de tê wateya "biqudretbûn"ê jî di tirkî de hinek wateyên wê yên din jî hene:1. Hêza kirina karekî, erk, qudret. 2. Têrîkirin û behremendiya kirina karekî. 3. Bidestxistina rêvebiriya dewletê û şiyana bikaranîna vê hêza dewletê; sazî û kesên ku vê hêzê bi kar tînin." [22]

Di tezê de têgehên "îqtîdar" û "têkiliyên îqtîdarî" di wateyeke berfireh de hatine bikaranîn bingeha xwe ji fikrên Mîchel Foucault stendine. Foucault di çerçoweyeke berfireh de vê têgehê bi kar tîne û gelek cure têkilî û rengvedana têkiliyên mirovan bi têgeha "îqtîdar"ê ve pêwendîdar dike û van têkiliyan di nava pêwendiyeke (kontekst) îqtîdarî de rave dike:

"Têkiliyên îqtîdarî di navbera jin û mêrekî de, di navbera yê nezan û zana, di navbera dê, bav û zarokan de û di malbatê de hene. Di civakê de bi hezaran têkiliyên îqtîdarî û weke encam bi hezaran têkiliyên hêzdarî û ji ber van jî şerên mîkro, bi gotineke din tevgerên mîkro hene. Her çiqas birêvebirin û teşwîqkirina van têkiliyên îqtîdarî yên mîkro ku ji aliyê îqtîdara dewletî ya mezin ve tê kirin rast be jî, tersê vê yekê, divê bê gotin ku ji bo îqtîdara dewletê an sinifekê, eger di bingehê de ev têkiliyên mîkro yên îqtîdarî hebin, ev îqtîdar dikare pêk bê. Li dora her şexsekî desteya têkiliyên îqtîdarî yên ku wî bi dê û bavê wî, bi karsazê wî, bi mamosteyê wî yên zana, yên fikra tiştekî dixe serê wî- ve girê dide tune be, mimkûn e ku îqtîdara dewletî pêk bê…"[23] 7

Yanî tiştê Foucault dibêje ew e ku; her çiqas îqtîdarên makro hebin jî divê bê dîtin ku bi hezaran îqtîdarê mîkro hene ku vê îqtîdara makro pêk tîne û encama vê jî bi hezaran têkiliyên îqtîdarî ne. Lewre îqtîdara ku Foucault difikire ji gelek noqteyan hildibere û navendeke wê ya sabît tune: "Îqtîdar li her derê hazir û nazir e: Lê ev ne ji ber ku her tiştî di binê banê xwe yê yekgirtî û têkneçûyî de kom dike û dehewîne wisa ye, di her kêlîkê de, di her noqteyê de, ya rastir ji ber ku di navbera nuqteyekê û her nuqteyê de hildibere, wisa ye. Îqtîdar di her derê de ye; ne ji ber ku her tiştî dixe hundirê xwe, ji ber ku ji her derê dizê, li her derê ye."24

24 Michel Foucault, *Cinselliğin Tarihi*, wer. Hülya Uğur Tanrıöver, Ayrıntı Yayınları, cilt 1, İstanbul, 2010, r. 72

25 Foucault, "Hapishane Üzerine Söyleşi: Kitap ve Yöntemi", *İktidarın Gözü,* r. 23

Dîsa Foucault li ser îqtîdarê ku bê çawa di ser û mejiyê mirovan de ava dibe de wiha dibêje: "*…dema ez li mekanîzmaya îqtîdarê difikirim, li şiklên bûnewariyên biçûk ên îqtîdarî difikirim ku îqtîdar digihêje heta tov û bedena şexsan û ava dibe di hal û tevgerên wan de, di vegotinên wan de, di hînbûnên wan de û di jiyana rojane ya wan de"25*

Di gera şopên hêma, têgeh û metaforên îqtîdarî de çavkaniyên yekemîn her heşt dîwanên Cegerxwîn in ku di 2003yan de ji hêla weşanxaneya Avesta çap bûbû hatine bikaranîn. Ev xebat bi heşt dîwanên Cegerxwîn ên helbestê sînorkirî ye ku du dîwanên Cegerxwîn ên din hene ku nezm in lê ne di nav helbestan de ne.

Di vê tezê de weke rêbaz, bi her mijarê ve girêdayî hinek mînakên têkildarê wê mijarê hatine dayîn. Lê mînak ji hemû helbestên têkildarî wê mijarê nehatine dayîn û weke lîste nehatiye pêşkêşkirin. Ji ber ku Cegerxwîn di heşt dîwanên xwe de 775 helbest nivîsîne û carinan li ser mijareke ku di tezê de hatiye nirxandin, bi dehan helbest peyda dibin. Di neqilkirinên ku ji helbestan hatine kirin de, midaxele li nivîs û rastnivîsa wan nehatiye kirin û weke xwe hatine hiştin. 8

**BEŞA YEKEM**

# DI HELBESTA CEGERXWÎN DE ÎQTÎDAR Û REDDIYEYA ÎQTÎDARÊ

## 1.1. Di Helbesta Cegerxwîn de Rengvedana Reddiyeya Îqtîdarê

Reddiyeya îqtîdarê ango bêîtaatiya li hember îqtîdarê yek ji dînamîkên sereke yê destpêka helbesta Cegerxwîn e. Ev bêîtaatî hem weke veqetîneke ji çanda klasîk hem jî sedema peydabûna hêmanên hûmanîstîk ên naveroka helbestê, dikare bê şîrovekirin. Lewre wî îqtîdara teokratîk, arîstokratîk, feodal û dagirker red kiriye û li hember van îqtîdaran bêîtaatî kiriye. Belkî tiştê ku ew kiriye "însan" û hunermend û rewşenbîr jî ev yek bixwe ye. Di heman çerçoweyê de, dikare bê gotin ku helbesta Cegerxwîn, bi bêîtaatiya îqtîdarên dora wî dorpêç kirine dest pê dike. Li gorî Erîh Fromm jî tarîxa însanetiyê bi bêîtaatiyê ango bi redkirinê dest pê kiriye:

"Li gorî tarîxa Îbranî û Yûnanan, rênîşana tarîxa mirovatiyê çalakiya bêîtaatiyê ye. Adem û Hewa, ligel ku li bihuştê weke perçeyeke biaheng yê wê xwezayê jî bûn, zora wê xwezayê nebiribûn. Weke bûyîna cenîna di malzaroka dê de di nava xwezayê de bûn. Mirov bûn lê hîn ne "mirov" bûn. Hemû ev pergal bi bêîtaatiya li hember rêbazekê guherî. Bi qutkirina têkiliya navbera "dinya" û "dê" û jêkirina navikê ve, ji ahenga berî mirovatiyê mirov peyda bû. Bi vî awayî gava yekem ji bo serxwebûn û azadiyê hat avêtin. Bêîtaatiyê Adem û Hewa azad kir. Dema çavê xwe vekirin hem ji bo hev biyanî bûn hem jî dinyaya derveyîn biyanî û dijminane bû. Bêîtaatiyê hem têkiliya ewilîn ya navbera wan û dinyayê qut kir hem jî ew kirin şexs. Gunehê yekem Adem xera nekir bilakîs ew azad kir. Ev, destpêka mirovahiyê bû."[26]

[26] Erich Fromm, "Psikolojik ve Ahlaki Bir Sorun Olarak İtaatsizlik", *İtaatsizlik Üzerine Denemeler,* Mert Yayıncılık, wer. Ayşe Sayın, İstanbul, b.d. r. 7

Di helbesta Cegerxwîn de çend cure navendên îqtîdarî hene ku reddiyeya wan hatiye kirin, hatine rexnekirin û êrîş li wan hatine kirin. Pirbûna reddiyeyên Cegerxwîn belkî ji ber wê be ku ew bixwe jî hatiye redkirin. Dibe ku yek ji sedemên xurtbûn û serdestbûna têkiliyên îqtîdarî yên di helbestên wî de jî ev be. Ev yek weke 9

dînamîka rewşenbîriya wî jî dikare bê dîtin; redbûyîn bûye sedema rewşenbîriyê.[27] Li ser têkiliya îqtîdar û berxwedanê ku di vê mijarê de vekêşana navbera îqtîdarê û têkiliyên îqtîdarî li ser ava dibe, Mîchel Foucault jî wiha dibêje:

[27] Theodor W. Adorno, *Minima Moralia*, wer. Orhan Koçak, Ahmet Doğukan, Metis Yayınları, İstanbul, 1998, r. 171

[28] Foucault, "İktidar ve Bilgi", *İktidarın Gözü,* r. 177

[29] Marx, Engels, *Felsefe Metinleri,* Karl Marx, F. Engels, *Felsefe Metinleri,* amd. Muzaffer Erdost, wer. Kenan Somer û ên din, Sol Yayınları, Ankara, 2009, r. 61

[30] H.b. r. 69

"Têkiliyên îqtîdarî bi awayekî zerûrî rê li ber berxwedanê vedike, di her kêlîkê de banga berxwedanê dike, îmkana berxwedanê pêk tîne û ji ber ku îmkana berxwedanê heye û berxwedan bi rastî jî pêk tê, dike ku, îqtîdara serdestiyê bixwaze bi qeweteke xurtir, berxwedan çiqas xurt be ewqas bi konetiyeke xurtir li ser nigan bimîne"[28]

Weke ku Foucault gotiye, cihê ku îqtîdar lê hebe elbet wê berxwedan jî hebe ku ev weke têkiliyeke îqtîdarî reddiyeya îqtîdarê bi xwe re tîne. Yek ji sedemên ku tesîr li reddiyeyên wî kirine jî, fikrên Marksîst in ku ev fikir di xwezaya xwe de rolekê dide aktorên civakê yên ku xwedî xisûsiyetên rewşenbîrî ango fikrî ne. Jixwe Marks dibêje, "*Fîlozofan hew dinya bi şiklên guhertî şîrove kirin, mesele guhertina wê ye.*"[29] Cegerxwîn, her çiqasî ji Marksîstekî teorîk bêtir Marksîstekî milîtanî û pratîk be û îfadekirina wî ya vê yekê, ne bi têgehên vê teoriyê, lê bêtir bi gotinên sloganîk be jî, şopên refleksên reddiyeya ji ber Marksîzmê di helbesta wî de pir dikare bê dîtin. Jixwe "Guhertina dinyê" ku Marks ji bo komûnîstekî weke peywir dibîne, fikra reddiyeya îqtîdarê jî dihundurîne. Ji vê gotina Marks jî aşîkar e ku ev peyv weke mantiqeke xurt di Marksîzmê de mewcûd e: "*... di rastiyê de û di pratîkê de ji bo materyalîst ango komûnîstekî mesele, dagerandina dinyê ya ji bingehê, êrîşa pratîk ya rewşa heyî û guhertina wê ye.*"[30]

Di helbesta Cegerxwîn de reddiyeya îqtîdarê û di heman demê de xwestina avakirina îqtîdareke din ku ew îqtîdara din, îqtîdareke kurd e û azadî bingeha wê pêk tîne, babeta sereke ye. Yanî ji alîkî de dixwaze îqtîdarekê têk bibe û ji aliyê din de dixwaze îqtîdarekê ava bike ku ew îqtîdar wê wî û "welatê wî" azad bike. Ji ber ku herdu aliyê vê yekê jî îqtîdar in têkiliyên îqtîdarî zêde ne di helbestên wî de. Lewre hem 10

banga berxwedana reddiyeya îqtîdarekê dike hem jî banga avakirina îqtîdarekê dike ku berxwedan encama redkirina têkiliyên îqtîdarî yê bi vî rengî ne. Ev têkiliyên îqtîdarê û berxwedanê, vekêşaneke xurt pêk tînin di helbesta Cegerxwîn de.

Çawa ku li jor ji Fromm hat neqilkirin, destpêka tarîxa mirovatiye ew bêîqtîdarî ye ku mirov kiriye mirov ango kiriye "xwe", di helbesta Cegerxwîn de jî şopa şerê wê "xwebûn"ê dikare bê dîtin. Hem reddiyeya wî hem jî bêîqtîdariya wî, lêgerîna wê "xwe"yê ye. Ew "xwebûn" çawa ku weke bûnewariyeke egzîstansiyal e, di heman demê de "kurdbûn"ê jî refere dike:

**"**Hebûm seraser, divê hebim ez
Madem hebim ez, çima nebim ez?"[31]

[31] Cegerxwîn, "Madem Hebûm Ez Divê Hebim Ez", *Sewra Azadî,* Weşanên Avesta, Stenbol, 2003, r. 108
[32] Cegerxwîn, "Ez Mirovim", *Hêvî*, Weşanên Avesta, Stenbol, 2003, r. 31

Bi rastî mirov dibêje qey evaya ne ji aliyê Cegerxwîn lê ji aliyê Jean Paul Sartre ve hatiye nivîsîn. Cegerxwîn di vê helbestê de, li ser pirsa hebûnê disekine û dibêje ku piştî ku em hene û em dijîn, çima em nikarin xwe bijîn û nikarin bibin xwe. Elbet ew "xwebûn" di dewra ku tevgera neteweyî hemû refleks û tevgerên Cegerxwîn diyar kirine de, "xwebûn"eke kolektîf e û ew jî wê bi welatperweriyê mimkun be, refere dike. Di vê noqteyê de em bi rehetî dikarin bibêjin ku helbesta Cegerxwîn, qêrîneke xurt ya azadiyê, şervan û êrîşkarê pergalên teng û zordariyê ye. Di Cegerxwîn de êrîşa şêx, mela û axa, ji ber xweavakirin, ji biyanîbûnê xwe azadkirin û xwejiyînê ye. Reddiye û bêîtaatî li ser vê zemînê pêk tê. Di dehan helbestên wî de êrîşa axa, mele û şêxan heye ku ev êrîş bi armanca jiyîna bûneweriya mirovan e ku ew jî wê bi welatperweriyê mimkun be. "*Berî her tiştî kurd im*"[32] teqabulî vê yekê dike:

"Sofiyat im bîrewer
Emrîkî me divêm şer 11

Asyewî me bi tevger
Berî her tiştî kurd im
...
Vîyetnama Gernas im
Hindî me bê kiras im
Ez birçî me pêxwas im
Berî her tiştî kurd im"

Li vir dixwaze bibêje ku her çiqas hinekî Hindî, hinekî Asyewî, hinekî Efrîkî jî bim beriya vana hemûyan bûneweriyeke min heye û ev bûnewerî "xwebûna" min yanî kurdbûna min e, ji lew beriya her tiştî ez kurd im. Ji ber ku pergalên ku wî tune dihesibînin û xwebûna wî ya kolektîf û "xwebûn" ango kurdbûna wî qebûl nakin, helbesta Cegerxwîn dema qala kurdbûnê dike di heman demê de behsa wê "xwebûn"a kolektîf jî dike. Ev yek jî bixwe ji reddiyeya pergalên wî qebûl nake dizê. Jixwe dema ku pirsa "Kî me ez"[33] dike bi awayekî resen cewaba wî "Kurd im ez" e.

[33] Cegerxwîn, "Kî me Ez", *Kî me Ez,* Weşanên Avesta, Stenbol, 2003, r. 13

[34] Marx, *Felsefe Metinleri*, r. 79

### 1.2.1. Di Helbesta Cegerxwîn de Rengvedana Reddiyeya Îqtîdara Arîstokratîk

Cegerxwîn, di helbesta xwe de li hember arîstokratîk der dikeve ew jî, ji axa, beg û dewlemendan pêk tê. Wî bi awayekî xurt êrîşî wan kiriye û ev yek bûye mijara gelek helbestên wî. Cegerxwîn ku helbestvanekî şoreşger e û banga şoreşê dike, êrîşa wî ya li hember axa, beg û dewlemendan elbet karektereke çînî jî dihundurîne. Ev yek peyva Karl Marks tîne bîra mirov ku digot, "*her şerê şoreşger, kîjan sinif berî wê îqtîdar be, berê xwe dide wê."*[34] Ji ber ku îqtîdara beriya Cegerxwîn, di nav kurdan de, bi awayekî xurt ji sinifa arîstokratên ku bi axê ve girêdayî bûn pêk dihat, Cegerxwîn elbet wê êrîş li wan bikira. Bingeha êrîşkirina wî ji ber sûcdariya wan bû ku xizmet ji dagirkeran re 12

dikirin, îqtîdareke kurd ava nedikirin û nedihiştin ku kurd bi rengê xwe îqtîdarekê ava bikin. Axa, beg û dewlemendan nedihiştin kurd hişyar bibin, şirîkê dagirkerên kurdan bûn. Loma ew jî bi qasî dijminan dijmin bûn û dibûn hedefa êrîşa helbesta Cegerxwîn ku vê êrîşê yek ji rengê bingehîn yê helbesta wî pêk tanî.

Belkî sedem ew bû ku ji ber xwezaya xwe, arîstokratên bi axê ve girêdayî, îqtîdar li ku be ango kî be, xwe nêzîkî wir an wî dikin û angaje dibin. Loma jî Cegerxwîn her çiqas carinan hêvî dikir ku ew jî li hember îqtîdara dagirkeran der kevin û bi dijminan re şer bikin, lê vê yekê gengaz xuya nedikir. Ji ber ku fikirîna herêmî û avakirina îqtîdarên eşîrî dibû sedem ku fikrên neteweperwerî di arîstokrat û serokeşîrên kurdan de peyda nebin û di wê rêvebiriya biçûk ya eşîrî de refleksên millî nikarîbû nîşan bidana. Abbas Valî têkiliya arîstokratan ku xwedî pragmatîzmeke xurt bûn û îqtîdarê ku di pratîka Komara Kurdistanê de qewimî bû wiha rave dike:

"Axatiya eşîrî, bi awayekî dîrokî bi oportunîzmê xwedî bûbû; li gorî berê ba, hereketkirin şêwaza bingehîn ya siyasî bû. Têkiliyên mervantî ku bingeha siyaseta eşîrî bû, têkiliyên hevgirêdanê yên kevn û şêwaza fikirîna herêmî, navê wê li ser, bi pêvajo û pratîkên nasnameyên nûjen yên siyasî, netewe û gel re nikarîbû bijiya." [35]

35 Abbas Vali, *Kürdistan Cumhuriyeti, İran'da Kürt Kimliğinin Gelişimi*, wer. Zeri İnanç, Avesta, İstanbul, 2010, r. 155

36 Cegerxwîn, "Divê Em Bibin Yek", *Agir û Pirûsk*, r.29

37 Cegerxwîn, "Kurdistan ne Kolistan e", *Sewra Azadî*, Weşanên Avesta, Stenbol, 2003, r. 45

*"Beg û axan bi deh gundan, digotin her em in xûnkar."*[36] Yanî "deh gund"î têra wan dikir ku xwe weke "xûnkar" ango hukumdar bibînin û firehiya dinya wan an ji bi gotineke din sînorên dinyaya wan, ne jî asoya neteweyekî, lê ji "deh gundan" pêk dihat. Elbet sedemên sosyolojîk ên vê yekê hene ku peydanebûna fikra neteweyî, çixêzandineke sînorên li ser bingeha eşîrî bi xwe re tanî. Sînorên welatê ku Cegerxwîn weke netewe-dewletê difikirî, ji hemû kurdên ku xwedî nasnameyeke kolektîfbûn pêk dihat û li hember sînorên ku ji gelek îqtîdarên arîstokrat û herêmî pêk dihat reddiyeyek bû. "*Ev welatê Kurd e ji lew Kurdistan e / Neko axistan e ne jî begistan e*"[37] reddiyeya "axistan" û "begistan"ê ye ku îqtîdarên arîstokrat temsil dikin. Li şûna wan jî "Kurdistan" divê hebe ku ew jî coxrafya û îqtîdara kurdan temsîl dike ku teqabulî wê nasnameya kolektîf û homojen tê û ji paşxaneyeke neteweyî dizê. 13

Di helbesta Cegerxwîn de sûcdarkirina arîstokratan ji bingeheke bi vî rengî tê. Ji ber ku Cegerxwîn difikire ku sedema neavabûna îqtîdarê, rêvebir bixwe ne ku ev rêvebir, di vê sîstema feodal de xwedî îqtîdar û xurt û karbidest in û ew jî ji serokeşîr, axa û began pêk tên. "*Ji paşa û beg û girdan yek ne bû hişyar / Ji bo serbestiya kurdan, ji wan qet yek ne bû xemxwar*"[38] rengvedana vê yekê ye. Balkêş e ku di helbesta Cegerxwîn de ji dijminahî û êrîşa serdestên makro ku dagirkerên welatê wî ne bêtir, dijminahiya axa û began hatiye kirin ku îqtîdareke arîstokrat pêk tînin.

[38] Cegerxwîn, "Divê Em Bibin Yek", *Agir û Pirûsk,* r. 29

[39] Cegerxwîn, "Bibin Markîsî", *Zend-Avista*, Weşanên Avesta, Stenbol, 2003, r. 121

[40] Cegerxwîn, "Zira Kerê Lota Devê", *Şefaq*, Weşanên Avesta, Stenbol, 2003, r. 71

[41] Cegerxwîn, "Dijminê Millet", *Sewra Azadî,* r. 24

Aliyekî êrîşên Cegerxwîn ku li beg, axa û dewlemendan hatiye kirin jî ji ber karektera çînî ye ku ev jî bûye sedema pirsa Cegerxwîn: "*Çiman ew li jor û çira em li jêr*".[39] Di vê pirsê de têkiliya "joritî" û "jêritî"yê hatiye redkirin ku ev têkilî bixwe têkiliyeke îqtîdarî ye. "*Bere bimre qat-qatî*"[40] îfadekirina vê yekê bixwe ye. Elbet ev ji ber fikrên wî yên Marksîstî ye ku di gelek helbestên bi vî rengî de refaqatê dikin.

Di helbesta "Dijminê Millet"[41] de "dewlemend", "şêx", "beg" û "axa" bi dijminahiya millet hatine sûcdarkirin ku ew xizmetê ji dijminê "me" re dikin û ji bo dijmin baş in lê ji bo "xwe" nebaş in. Lewre ew "talanker", "mêrkuj", "xwînxwerê" milletê xwe ne:

"Dijminê millet û ji dijmin re hûn pak in
Yeke çê li dinê ji xwe re hûn nakin
Rojê bi hezaran dewlemend û şêx û beg û axa
Dengê dora pirê dibhîzin û diçin û dey nakin
…
Diz û hîlebaz tev polperest û pêxwas
Talanker û mêrkuj û xwînxwer û seffak in
…
Ji bo sêwiyê milletê xwe çikûs û destgirtî
Û ji zariwê dijminê milletê xwe pir çak in" 14

Di helbesta “Begê Dijmin”[42] de beg weke “bekçî” hatiye diyarkirin ku peywira “bekçî” li ser navê “dijmin”an ango îqtîdara dijminan parastin e. Bi hevaltiya “dijmin”an ew dibe dijimin bixwe û weke dijmin “bê soz, bext û ewle” ye:

[42] Cegerxwîn, “Begê Dijmin”, Sewra Azadî, r. 31
[43] Cegerxwîn, “Dinya Bêserî”, *Agir û Pirûsk*, r. 24
[44] Cegerxwîn, “Milletê Reben”, *Sewra Azadî*, r. 32

“Xwedêkî bêje, beg çî ye?
Ji dijminan re bekçî ye
…
Hevalê dijmin, dijmin e
Bê soz û bext û ewle ye”

Di helbesta “Dinya Bêserî”[43] de “egîtbûn” û “rêberî” sifetên axa û began in ku di konteksteke neyînî de hatine bikaranîn. Axa û beg ji ber ku “jidil” dijminahiya kurdan dikin egît in û rêbertiya wan jî “rêbertiya xerabiyê” ye:

“Begler û axa egît in, dijminên kurd in ji dil,
Rêber in bo kuştin û talan û ceng û berberî”

Di helbesta “Milletê Reben”[44] de hatiye diyarkirin ji bo avakirina dewletê û xelaskirina welat, divê “paşa”, “beg”, “axa” û “muxtar” û “sermeyedar” bêne kuştin. Lewre kuştina wan têkçûna îqtîdara wan e:

“Paşa û begler axa û muxtar
Malê te dixun bi zor û bi dar 15

…
Şopa me bi xwîn, dilê me pir xurt
Tev bêne kuştin ev sermayedar
…
Dewlet û welat hemî bighên me
Dijmin bikujin weke gurê har"

Di helbesta "Ta Kengî Karker û Cotkarê Bega Bin"[45] de weke gelek helbestên din "beg" û "axa" rêncberên dijmin in. Karker û cotkar jî rêncberên rêncberan in ku îqtîdarek li ser îqtîdarekê ava bûye. "Dijmin" îqtîdara dagirker, axa û beg jî îqtîdara arîstokrat in ku li ser karker û cotkaran ava bûne. Loma jî li cem wî mantiqek wisa heye ku eger îqtîdara arîstokrat hilweşe, wê îqtîdara dagirker jî hilweşe. Elbet karektereke çînî di ev reng helbestan de heye ku ev jî ji paşxaneyeke Marksîst dizê; wê karker û cotkar bi das û çakûtan rabin û şerê proleter bikin û sinifên mûqtedîr têk bibin:

[45] Cegerxwîn, "Ta Kengî Karker û Cotkarê Bega Bin", *Sewra Azadî,* r. 51

"Ev rengê biratî me nevê ger timî wa bin
Hevsar me girêdayî bi kurtanê kera bin
Ew begler û axa û emê jar û geda bin
Ew rencberê dijmin û emê rencberê wa bin
Ey karker û cotkar bes e dem hatiye rabin
Ta kengî emê kole û riswa û ebîd bin
Ta kengî emê hestiyê her lingê sega bin" 16

Di helbesta “Hevsar bi Destê Dijmin e”[46] de, ku têkiliya axayan û îqtîdarên serdest ango “dijmin” ji navê wê jî diyar e, axa weke mifte û simsar hatiye dîtin. Axa mifte ye lewre “dijmin” wan weke mifte bi kar tînin û welatê Cegerxwîn dagir dikin. Simsariyê dikin lewre ew simsariya welat e û ew welat difiroşin “dijminan”:

[46] Cegerxwîn, “Hefsar bi Destê Dijmin e”, *Sewra Azadî,* r. 56

“Sed sal e axa zorker e ferman bi dest darê wî ye
Millet wekî lokê mezin her dem di bin barê wî ye
Cî cî kirin berdane hev talan û kuştin, roj û şev
Destê xwe de destê neyar casûs û hemyarê wî ye
…
Dijmin dixwazî me bikî, kole di bin destê xwe kî
Axayê hov û rênezan her mifte simsarê wî ye”

Di hinek helbestan de hêvî ji beg û axayan tê kirin ku ev li van helbestan nake û rengê stendina îqtîdarê tê guhertin; eger beg û gel (ku gel jî weke “êl” hatiye binavkirin) bibin yek dikarin îqtîdara “dijmin”an hilweşînin ango welat rizgar bikin. Balkêş e ku “êl” û “beg” weke “dara bê reg” hatine dîtin ku beg daxistiye dereceya êl û ev yek tunehesibandina îqtîdara beg e. Lewre eger di ser êl û beg re qewet hebe beg jî weke qewet ango îqtîdar nikare bê hesibandin:

“Beg bê êl nabê, êl nabê bê beg,
Pezê bê şivan, xwedî dibe seg. 17

Erê beg bê êl, bindest dimînî,
Qeraşê bê-av wek hacî legleg.
Lê êl û beg tev, eger bibin yek,
Yek dest û yek dil gogê dibin şeg
Bes e Cegerxwîn kurdên te yekser;
Çi êl û çi beg wek dara bê reg”[47]

[47] Cegerxwîn, “El Yaman Beg Yaman”, *Agir û Pirûsk,* r. 34

[48] Cegerxwîn, “Ji Mezinên Kurdan re”, *Sewra Azadî,* r. 173, 174

Di helbesta “Ji Mezinên Kurdan re”[48] de jî hêvîkirin ji beg, axa, paşa, şah, keyzade û mîran hatiye kirin ku weke “çare” hatine dîtin:

“Civata belengazê Kurdê reben,
Ji bo we gelek ew sipasan dikin.
Çiko hûn beg û şah û keyzade ne
Ji derdê kurdî re çare ne.
…
Nehin kes wekî me bi hawar û ah,
Çi paşa û axa çi mîr û çi şah.” 18

Ev yek, têgeha *neteweperweriya feodal*[49] ku Amîr Hasanpour bi kar anîbû tîne bîra mirov. Cegerxwîn di feraseta xwe de hem tevgereke neteweyî û modern ku li dijberê arîstokrasî û feodalîzmê ye tesewur dike hem jî ji beg û axa û eşîran hêviyê dike. Ev yek weke neteweperweriya feodal dikare bê binavkirin. Dikare bê gotin ku şerkirinên lokal ên axayan jî, ji ber ku ne bi fikreke millî li hember îqtîdarê şer dikirin lê wan dixwest îqtîdarek herêmî pêk bianiyana, ew jî weke neteweperweriya feodal, bê binavkirin.

49 Amir Hassanpour, *Kürdistan'da Milliyetçilik ve Dil 1918-1985,* wer. İbrahim Bingöl, Cemil Gündoğan Weşanên Avesta, İstanbul, 2005, r. 130

50 Eagleton, *Edebiyat Kuramı*, r.37

51 Cegerxwîn "Kî me Ez", *Kî me Ez*. r. 19

### 1.2.2. Di Helbesta Cegerxwîn de Rengvedana Reddiyeya Îqtîdara Teokratîk

Di helbesta Cegerxwîn de weke sîstemekê, mijara dîn û temsîldarên dîn ku şêx, mele, sofî û derwêş in, yek ji wan waran e ku tê de têkiliyên îqtîdarî rû dane û rengvedana wê li gelek helbestên wî çê bûye. Piştî ku fikrên neteweperwerî di Cegerxwîn de peyda bûne û dest bi xebatê kiriye ku ev xebat di heman demê de weke hemû tevgerên neteweyî, ji bo kurdan xebata avakirina nasnameyeke kolektîf e, şêx, mele û derwêşan bi beşdarnebûna têkoşînê sûcdar dike. Ev beşdarnebûn jî ji bo wî, beşdarnebûna avakirina îqtîdareke kurd e. Loma jî wî di gelek helbestan de êrîşî îqtîdara wan kiriye û ew bi xizmeta dijmin re sûcdar kirine.

Ev êrîş gelek caran di gelek helbestan de bi awayê êrîşa sembol û hêmayên vê îqtîdara teokratîk pêk tê. Ji ber ku "*Weke hemû îdeolojiyan, dîn jî ne bi riya têgehên vekirî û fêrkerên formûlekirî, bi hêma, sembol, elimîn, rîtûel û mîtolojiyan dixebite*."[50] "Tizbî", "xişt", "şaşik", "erbane" hinek ji van sembolan in ku helbestên Cegerxwîn de, gelek caran êrîşa dînî bi riya wan pêk hatiye. "*Bûne olperest / Bi tizbî û xişt / Ta dijmin şikand / Li me ser û pişt*"[51] yek ji van mînakan e ku êrîş bi riya sembolên weke "tizbî" û "xişt"ê hatiye kirin. Ji van rêzikan jî xuya ye Cegerxwîn sedama "şikandina piştê" olperestî ango dîndariyê dibîne.

Ji bo Cegerxwîn pîvana gelek tiştan ji ber ku welatparêzî ye, welatparêzî navendeke bingehîn ji bo wî pêk tîne. Di helbesteke xwe de ji bo "welat" wiha dibêje: 

"*Zanim ko qelen gelek giran e / Hindik ev e, xwîn û dîn û can e*."[52] Yanî di ber welat de çawa ku kuştin şertek e, bi awayekî îronîk ku nedîndarî ango sekulerbûn û ateîzma wî îfade dike, wendakirina "dîn" jî şertek e.

[52] Cegerxwîn, "Ji Ehmede Namî re", *Agir û Pirûsk*, r. 153

[53] Edward Said, *Entelektüel,* wer. Tuncay Birkan, Ayrıntı Yayınları, İstanbul, 2011, r. 22

[54] Cegerxwîn, "Derwêş Xwe Nadî Pêş", *Ronak*, Weşanên Avesta, Stenbol, 2003, r. 109

Cegerxwîn di helbestên xwe de hêviyan jî ji melayan dike û belkî ev yek ji ber temasa meleyan a bi zanînê re be. Ev jî sinifandina rewşenbîran ya Antonîo Gramscî tîne bîra mirov ku rewşenbîr dikirin du beş; rewşenbîrên kevneşoper ku ji mamoste, keşe û rêvebiran pêk tê û rewşenbîrên organîk ku pisporên aborî, teknîsyenên sinaîyê û hwd. pêk tên.[53] Yanî dikare bê gotin ku mele ango şêx bi awayekî xwezayî rewşenbîrên kevneşoper in û Cegerxwîn ji ber wê taybetiya wan, hêviyan ji wan dike. Di helbesta "Derwêş Xwe Nadî Pêş"[54] de piştî ku ewqas bi gotinên giran êrîşî derwêş û şêx dike, di çarîna dawî de diyar dike ku eger ew doza welat bikin êdî ew wan bi hevaltî dikare qebûl bike. Ji vê yekê dikare bê famkirin ku eger şêx, mela û derwêş di ber welat de şer bikin û bi gotineke din neteweperwer bin, tu problema wî bi wan re tune ye:

"Ew diz e, yan derwêş e ew
Rengê mirîşk û mêş e ew
Derd û bela û êş e ew
Serpoşê cejna kerneval
Pîsî bi navê şêx dikî
Şêx jî bi ser de rêx dikî
Wek rêx û şêx û mêx dikî
Bê cibe û şerwal û şal 20

Erbane bavê wer bixwîn!
Jehre we xiste ol û dîn
Heta ceger min bûye xwîn
Welat bixwazin, em heval"

Helwesta sekulerbûna Cegerxwîn çawa ku ji mînakên jor jî diyar e, aliyekî wî yê din jî heye ku ev alî bêbawerî ye û di gelek helbestan de rengvedana vê yekê jî heye: "*Xwedê nîn e*" û "*bawer neke çu peyxemberan*". [55] dikare vê yekê piştrast bike.

[55] Cegerxwîn, "Ola Min", *Zend-Avista,* r. 139

[56] Cegerxwîn, "Çibkim bi Rojî û Nimêj", *Ronak,* r. 99

Di têkiliya "kole" û "efendî" de ku têkiliyeke îqtîdarî temsîl dike, ji ber ku Cegerxwîn rola dîn weke avakirina statuya koletiyê dibîne, rexnekirin û li hemberderketin û gelek caran êrîşa şêx, mele û derwêşan rengekî sereke ya helbestan e. Di helbesta "Çibkim bi Rojî û Nimêj"[56] de dide zanîn ku yên em kirine "*kolê neyar*" mela ne û bindestiya "*me*" ji ber wan e. "Koletî" û "bindestî" ku bêîqtîdarî ne di vê helbestê de bûye sedema êrîşa dîn û weke temsîldarên dîn jî meleyan.

"Tazî me, birçî me, mela
Çibkim bi rojî û nîmêj
Kom bûn li min derd û bela
Çibkim ji vê rîşa dirêj
Te ez kirim kolê neyar
Te ez ji banî birme xwar
Bindestê dijmin mest û jar
Derman çi ye ka wer, bibêj?" 21

Di helbesta "Ji Tirsa Zana Xwedê Birine Ezmana"[57] de "dîn" ji bo dijminan, me dixe xew, ku "xew" jî weke şertê domandina îqtîdara dijmin ya li ser bindestan dikare bê nirxandin:

[57] H.b, "Ji Tirsa Zana Xwedê Birine Ezmana", r. 115

[58] Marx, *Felsefe Metinleri*, r. 27

[59] Cegerxwîn, "Kî me Ez", *Kî me Ez,* r.19

[60] H.b. "Mela Rabe", r.52

"Çi nimêj û rojî ne
Çi sîwak û tizbî ne
Hemî çîrok û derew
Mej dijmin re dixin xew"

Di helbesta jor de ku "xew" rewşa pasîfbûnê ye û ev pasîfbûn ji bo îqtîdara serdestan li ser piyan bimîne şertek e, di heman konteksê de ye ku Marks jê re gotibû "efyon". Cegerxwîn ku xwe weke Marksîst dibîne xuya ye vê fikra Marks dipejirîne:

"Xemgîniya dînî, ji alîkî de îfadekirina xemgîniya rastîn e û ji alîkî din jî li hember xemgîniya rastîn protesto ye. Dîn newaya dilşewat ya mirovê bindest, germahiya dinyaya bêwicdan, ruhê şertên civakî ye ku ruh diqewirîne. Dîn, efyona gel e."[58]

Yanî dikare bê gotin ku li gorî Cegerxwîn "nimêj, rojî, tizbî, sîwak" amûrên vê xewa ku weke efyonê ye û mirovan pûç û bêhiş dike û asteng e ji bo bidestxistina îqtîdarê. Bikaranîna "xewa dîlî"[59] jî ku "xew" û "hêsîrbûn" bi hev re hatine bikaranîn têkiliya "xew" û "hêsîrbûnê" ango bêîqtîdariyê rave dike.

Di helbesta "Mela Rabe"[60] de jî ji mela tê xwestin ku ji vê xewê rabin ango bi gotineke din dest ji vê "efyon"ê berdin. Ji ber ku Cegerxwîn difikire ku "dîn" weke "efyon"ê ye û mele xistine xew, ji bo ku meleyan qebûl bike divê mela ji vê xewê şiyar 22

bibin û bi "dijmin" re şer bikin. Di çarîna yekem û duyem de gazin ji ber xewê û şiyarnebûnê hatiye kirin û di çarîna dawî de hatiye diyarkirin ku eger ew bi dijmin re şer û cengê bike, êdî ew nû dibe seyda û wê demê ew dikare bê qebûlkirin:

"Xwenda û zanayê welêt
Ta key di xew da bî, mela?
Hawîr dixan ar û pêt
Ma rast e tim wa bî, mela?
Millet seranser maye jar
Kole û bindestê neyar
Her dem dikî qîr û hewar
Carek şiyar nabî, mela
…
Zû hîn bibe top û tiving
Li ser çiyan bi qîr û deng
Bi dijmin re bike tu ceng
Hê nû tu seyda bî, mela"

Di helbesta "Destê Te Maç Nakim"[61] de li hember îqtîdara şêx bi destmaçnekirinê bêîtaatî hatiye kirin û şêx bi kavilhiştina seray û medreseyan hatiye sûcdarkirin. Lê di rêzika dawî de hatiye gotin ku ew û şêx dikarin bibin bira jî lê bi şertê "kurd û kurdperestiyê":

61 Cegerxwîn, "Destê Te Maç Nakim", *Kî me Ez,* r. 129

“Şêxê min destên te îdî maçî nakim ez bes e
Kavil û wêran te hiştin ev sera û medrese
…
Ez zanim pir dirêj kir, min li te peyv û kelam
Ger tu kurd û kurdperest bî, em bira ne wesselam”

Di helbesta “Êlperestî Nexweşiyeke Dijwar e”[62] de jî mela weke “dijmin” û “rêncberê dijmin” hatiye nîşandan; mela rêncberiya dizan dikin ku ji bo wan li ber werz û rezan disekine. Di vir de aşîkar e ku diz, dagirker û talankerê welatê Cegerxwîn û werz û rez jî welatê wî bixwe ye ku li ser navê diza, nobedariya vî welatî, mela dikin û ne ji bo “me” lê ji bo dijmanan “baş” e:

[62] Cegerxwîn, “Êlperestî Nexweşiyeke Dijwar e”, *Hêvî,* r. 16

“Şeyx û mela neyar in
Li ser me tim siwar in
…
Tu rêncberê diza ye
Li ber werz û reza ye
…
Ji dijmin re tu rencber
Şiyar bibe xwelîser
…
Ji dijmin re tu baş î
Tim rêncber û qerraş î” 24

Yek ji sedemên êrîşa îqtîdara temsîldarên dîn, ku kiriye Cegerxwîn nifiran li wan bike, ew e ku wan ne bi zimanê xwe lê bi zimanê biyaniyan daketine û zimanê wan bi kar anîne. Lewre wan di avakirina nasnameya kolektîf a neteweyî ya kurdan de ku zimanê neteweyî hêmaneke sereke ye ji bo vê nasnameya kolektîf, peywira xwe neanîne cih û loma jî bûne hedefa êrîşa Cegerxwîn:
"Nifrînekê ji Yezdan dikim, tu bêje amîn;
Şêx û melayên kurdan belengaz û geda bin.
Lewra yekî ji wana qanûn bi zarê kurdî,
Ji bo me çênekir qet, ji ber vê em nezan in
Xwe pîr dikin di wed'e hem serf û nehw û mentiq;
Bê zar û xet û xwendin, li nav xelkê dewar in."[63]

[63] Cegerxwîn, "Dînê tête Zanîn", Agir û Pirûsk, r. 83
[64] H.b. "Derwêş", r. 79

Di helbesta "Derwêş"[64] de êrîşa îqtîdara dînî bi riya derwêş û sembolên wan "xişt" û "irban"ê hatiye kirin û derwêş bi "riya şaş" hatiye sûcdarkirin ku ev rê ne riya serxwebûnê ye. Serxwebûn ku bixwe îqtîdara welat temsîl dike, ji ber ku ne riya derwêşan e, riya wan "xwar û kêm" e:
"Ev rêça hûn tê de, rêçek xwar û kêm e,
Rêça serxwebûnê çi xweş rêç û şop e.
…
Ey derwêşê nezan dizê jîna kurdan,
Dermanê nezana tenê zanim çop e." 25

Di helbesta “Ev Ne Dîn e, Dînitî ye”[65] de şêx ew kes e ku mirovan dixapîne û di vê têkiliyê de şêx, “koremar”, “iblîs” û “neyar” e û mirovên nezan ku tên xapandin jî “koma dewar” û “koma kera” ne. Di vê helbestê de awayê xurtbûna îqtîdara şêx ku li ser gundiyan ava bûye hatiye nîşandan û loma jî êrîşa îqtîdara şêx hatiye kirin ku ew weke “neyar”, “koremar” û iblîs daye xuyakirin:

[65] Cegerxwîn, “Ev Ne Dîn e, Dînitî ye”, Sewra Azadî, r. 146

“Giham gundek li wî qîr û hewar e
Li hawir haxer û koma dewar e
Diçin tên germ e, havîn e bi himhim
Çi bêjim, ax ji vê koma kera re
Me dî şêxek bi şaş û cibbe derket
Wekî şahan ji bircê hate xware
…
Mi dî çav û birû tev de dilîzin
Me zanî ev ne şêx e koremar e
Di xapa de du sed ders dane iblîs
Gelek zana û jîr û pir şiyar e
Mi gote wan keran ma hûn nizanin
Ji bona we çiqasî neyar e 26

Zirîn û go: Werin ev dîn kufir bû
Ne bes şêx e belê qutbê çihar e
Cihan tev de li ber destê wî mûyek
Eger pifkî dibî tev tar û mar e."

Bi derketina Cegerxwîn ya li hember îqtîdara dînî ku êrîşî şêx, mele, derwêşan dike û wan bi xizmeta dijmin, sûcdar dike, bingeheke wî ya sekuler jî heye ku paşxaneyeke teorîk pêk tîne. Ew sekuler e lewre bi awayekî giştî li hember iqtidara dîni der dikeve "*ne camî ne jî dêr*" [66] ê naxwaze û jixwe li gorî wî mirovan "*Xwedê anîne meydan*"[67] û ji bo xapandina mirovan ew amûreke îqtîdarî ye. Dîsa di heman çerçoweyê de ew ferqiyê naxe navbera mele û keşeyan. Lewre ferqiyeke wan hebe ew jî di rengê şaşka serê wan de ye ku "*şaşa mela û keşe, yek spî yek reş e*".[68] Dîsa di helbestên xwe de vegotina "*Ne mizgeft û ne jî dêr, Ez pê nabim xwedî xêr*".[69] û "*Tu zanî ez Cegerxwîn im / Ne dost û dijminê dîn im*"[70] vê yekê piştrast dike.

[66] Cegerxwîn, "An Diraw An Derew", *Agir û Pirûsk,* r. 179
[67] Cegerxwîn, "Ji Xwedê Divên Em Frenga Didin", *Ronak,* r. 119
[68] Cegerxwîn, "Jin Hene Jinkok Hene", *Şefaq,* r. 109
[69] Cegerxwîn, "Ez Ji We Xeyidî Me", *Hêvî,* r. 29
[70] Cegerxwîn, "Cizîrî Rabe Meyzêne", *Şefaq,* r. 128 

**BEŞA DUYEM**

## DI HELBESTA CEGERXWÎN DE RENGVEDANÊN TÊKILIYÊN ÎQTÎDARÎ

### 1. Di Helbesta Cegerxwîn de Têkiliya Îqtîdarê û Edebiyata Neteweyî

#### 1.1. Têkiliya Îqtîdarê û Edebiyata Neteweyî

Edebiyata neteweyî û îqtîdar, du têgehên ku di pêvajoya tevgerên neteweyî de ji hev cuda nabin û bêyî hev nayên fikirîn. Ji ber ku netewe bixwe îqtîdarekê refere dike, edebiyata neteweyî jî bi vê netewebûnê ve girêdayî ye û bi heman rengî ye. Edebiyatvan, ji nav rewşenbîr û nivîskarên ku di pêvajoya avakirina netewe dewletan de cih girtine belkî yên herî girîng in. Ji ber ku netewe li ser nasnameyên kolektîf ava dibin û edebiyatvan bi berhem û vegotinên xwe dibin perçeyek ji vê pêvajoyê. Gregory Jusdanîs li ser têkiliya netewe û nirxên kolektîf wiha dibêje:

"Armanca dawiya dawî ya neteweperweriyê avakirin û xurtkirna dewleteke serbixwe ye. Lê pêwîstî bi tevneke nirx û hestan heye ku dewletê li ser lingan bihêle. Ji bo avakirina millet, ihtiyacî bi lihevrastkirina vegotinên kolektîf, homojenkirina ferqiyetên etnikî û li ser hemwelatiyan, dan qebûlkirina îdeolojiya cemaateke mûxayel, heye."[71]

[71] Gregory Jusdanis, *İmparatorluktan Ulus-Devlete, Gecikmiş Modernlik ve Estetik Kültür Milli Edebiyatın İcadı,* wer. Tuncay Birkan, Metis Yayınları, İstanbul, 1998, r. 53

[72] Benedict Anderson, *Hayali Cemaatler*, wer. İskender Savaşır, Metis Yayınları, İstanbul, 2011 r. 20

Binavkirina ku Benedîct Anderson ji bo netewe û pêvajoya avabûna wê dike jî li ser heman bingehê ye:

"Netewe civakeke siyasî ya xeyalkirî ye –bi şiklê ku hem îqtîdarê hem jî sînoran di xwe de dihewîne- cemaateke xeyalkirî ye. Hatiye xeyalkirin ji ber ku endamê kîjan neteweya biçûk be jî, wê endamên din nizane be, wê hev nas neke, di derheqê piraniyê wan de tiştek nebihîstibe lê dîsa jî di serê her yekî ji wan de, wê danheva xeyala wan bijî"[72]

Yanî ji bo ku cemaateke kolektîf weke netewe pêk were, îhtiyacî bi xeyalan heye ku ev xeyal divê xeyalên hevbeş bin û di serê endamên wî neteweyî de bi heman rengî 28

cih bigrin ku ev cemaata mûxayel bikaribe pêk were. Wê demê dikare bê gotin ku edebiyat regezek e zehf girîng ya wan xeyalan e ku neteweyê pêk tîne. Ji ber vê ye ku Gregory Yusdanîs dibêje, " Edebiyat saziya herî girîng e di avakirina hişmendiya millet de"[73]

[73] Jusdanîs, r. 68

[74] Ordîxanê Celîl, *Cegerxwîn'in Yaşam,* r. 11

[75] Abbas Vali, *Kürdistan Cumhuriyeti*, r. 171

* Gerçî Valî, ji bo rewşa Kurdan ya Îranê vêya dibêje lê ji bo perçeyê din jî ev rast xuya dike.

Têgeha "îqtîdarê" beramberî têgeha "dewlet"ê tê ku ew jî organîzasyona encama wan tevgerên kolektîfkirinê ne. Elbet divê ew tevger bi ser kevin ji bo pêkanîna wê îqtîdarê. Dema qala tevgera neteweyî ya kurdan bê kirin ji ber ku welatê kurdan coxrafyayeke perçebûyî ye û zimanê wan pirdiyalektî ye, hem meseleya tevgera neteweperweriyê hem jî bi vê ve girêdayî meseleya edebiyata neteweyî, ji ber ku di her herêm û civatekê de xisûsiyetên tarîxî yên cuda hene û bûyerên cuda qewimîne û îqtîdarên cuda avabûne, gelekî girîft û giran dibe. Cegerxwîn jî di hewldana pêvajoya avakirina nasnameyeke kolektîf û di nava kolajeke neteweyî de cih girtiye ku ev kolaj ji kesên weke Pîremêrd, Goran, Bêkes, Dildar, Osman Sebrî, Qedrîcan û Hejar pêk dihat.[74] Ji ber vê hewldana Cegerxwîn a gihîştina îqtîdarekê ye ku rengvedana têkiliyên îqtîdarî di helbesta wî de zehf peyda bûne.

Di avabûna edebiyata neteweyî ya kurdan de yek ji diyardeyên herî girîng perçebûna welatê wan e û netewe dewletên zordar ku nasnameya wan înkar kirin û bi pêvajoyên "êdinkirinan" kirin ku kurd jî bi hisên neteweperweriyê bihisin. Abbas Valî vê yekê wiha rave dike: *

"Îqtîdara serdest cudahiyên etnîk û zimanî ji xwe re kir hedef û bi çewisandina van cudahiyan, zemîna ku civaka kurdan ya çandî-zimanî bibe civakeke etnîk-zimanî hazir kir û bû sebeba vê dagerînê." [75]

Di vê dagerîna ku Valî behs dike de elbet roleke girîng edebiyatvanan lîztiye ku kesên weke Goran, Qedrîcan, Cegerxwîn û hwd. di vî warî de der ketine pêş. Loma jî evana bi riya edebiyatê xwestine ku kurd jî bibin xwedî îqtîdar ango azad bibin. Lewre 29

xwedî îqtîdarbûn û azadbûn ji bo wan dihat heman wateyê. Valî li ser wate û têkiliya îqtîdar û azadiya ji bo kurdan wê wiha dibêje:
"Ya ku lêgerîna azadiya kurdan dike, şertên îro ku tê de ne; înkar û çewisandina nasnameya wan e. Azadî ji vê dijberiyê dizê û her dem bi îqtîdarê hatiye xemilandin. Cihê ku îqtîdar lê nebe azadî jî nabe."[76]

76 H.b r. 184

77 Jusdanîs, "Milli Kültür Olarak Eleştiri", r. 26,27

Edebiyatvanên kurd ku mijar ew in û kolajeke neteweyî pêk tînin, hem li ber xwe dane ku bibin perçeyeke çandeke berxwedêr û hem jî ev yek bi fikr û hisên neteweperwer kirine ku ev yek weke hewldana avakirina nasnameyeke kolektîf dikare bê binavkirin. Dikare bê gotin ku bi qasî ku ev kar karekî edebî ye, jê bêtir siyasî ye jî. Ji ber ku di feraseta vê kolajê de, armanca nivîsînê ji hişyarkirina gel, dawetkirina gel ya şer li hember îqtîdarê û fikra avakirina dewleteke pêk tê. Ngugî jî ji bo rewşa Efrîqayê dibêje, li Efrîqayê nivîskar û siyasetmedar gelek caran heman kes e. Nivîskar pirê caran beşdarî tevgera siyasî dibin; li gorî wan çek, pênûs û kursî ji bo heman tiştî, ji bo azadkirina welatê wan e.[77] Ev yek xisûsiyata edebiyata berxwedêr e jî ku edebiyata kurdî ya nûjen, ji gelek aliyan ve bi vî rengî ye. Ji ber ku rengê siyaseta wan li ser berxwedanê ava bûye, edebiyata ku pêwend bûye jî ev reng stendiye. Lewre ji ber ku îqtîdaran ew tune hesibandine û xwestine wan û nasnameya wan tune bikin, berxwedan pêk hatiye û ev kiras li siyasetê û her wiha li edibiyatê jî bûye. Jusdanîs li ser vê têkiliya îqtîdar û rola edebiyata berxwedêr wiha dibêje:
"Edebiyata berxwedêr ku li Efrîqa, Emerîqaya Latînî û Rojhilata Navîn, di tevgerên rizgarkirina neteweyî yên rêxistinkirî de der ketiye hole, xema ku edebiyatê ji îdeojojiyê, teoriyê ji pratîkê bide alî naxwe. Barbara Harlow jî bi ser de dibêje ev metin, ji yên din cuda dibin ji ber ku ew beşdarî tevgera li hember zulmê 30

bûne. Helbestek, romanek hem perçeyeke ji vê tevgera li hember zulmê ne hem jî ew war in ku cihê meşandina tevgerê ne.”78

78 H.b, r. 28

79 Vali, Kürdistan Cumhuriyeti, r.16

Cegerxwîn di helbestên xwe de dijayetiya îqtîdaran kiriye. Sedemê berxwedêriya helbesta Cegerxwîn jî elbet ev îqtîdarên çewsîner in ku dikare bê gotin ku têkiliyên pêvajoya vekêşana (tewetur) berxwedanê û îqtîdarê, rengê helbesta wî diyar kiriye. Ji ber vê ye ku di feraseta edebiyatê de, ji xemên estetîk bêtir xemên siyasî xwariye.

**1.2. Di Helbesta Cegerxwîn de Rengvedana Têkiliyên Îqtîdarî di Çerçoweya Edebiyata Neteweyî de**

Cegerxwîn, ji ber xisûsiyetên dewra ku tê de jiyaye bûye şahidê gelek bûyerên civakî, exlaqî, aborî, siyasî ku şerê yekemîn yê cihanê, Şoreşa Oktobirê li Rûsyayê, serhildana Şêx Seîd, dagirkirina Frensayê ya Sûrî, Şerê Duyemîn ê Cihanê, avabûn û hilweşîna Komara Kurdistanê li Îranê, Şoreşa 58an li Iraqê ji bûyerên girîng in ku bi awayekî xurt tesîr li feraset û paşxaneya nivîsîna helbesta wî kirine û sînorên teorîk ên helbesta wî diyar kirine. Ji van bûyerên jor, hemûyan çi rasterast çi nerasterast tesîr li kurdan kirine û şikestin û serûbinbûnên civakî yên mezin pêk anîne. Ji ber ku Cegerxwîn jî ev şikestinên mezin di xwe de jiyane û helbesta wî ji vê atmosferê zaye; şer, têkîliyên îqtîdarî, bê statubûna kurdan, bêrîkirina dewrên bi aram, xwestina netewe-dewletê û avakirina nasnameyeke neteweyî hwd. tesireke xurt li helbesta wî kiriye û bi awayekî xurt hêma, fikr, têgeh û têkiliyên têkildarî “îqtîdarê” tê de peyda bûne. Bi kurtahî li hember wê zulma ku me li jor ji Jusdanîs neqil kir, der ketiye ku nasnameya wî ya helbestvaniyê di van şertên psîko-sosyolojîk de ava bûye.

Cegerxwîn ku xwe weke neteweperwer dibîne û “Neteweperwerî ne hew têkiliya etnîsîte û mafan bi hev re çê dike; têkiliya mafan bi îqtîdarê re jî çê dike.” 79 gelek helbestên wî bi vê mebest û tesîrê ne. Edebiyat li gor wî, divê li hember dijmin ango îqtîdara ku welatê wî zeft kiriye şer bike. Cegerxwîn “Hejar û Bêkes û Hacî û Xanî” ku 31

wan neteweperwer dibîne, ji bo xwînxwar û dizên ku nahêlin ew di welatê xwe de bibin xwedî îqtîdar “gorreke teng” dikolin:

“ Dirêjî te dibin destê sitemkar
Bi xwînxwarî dinoşin qehremanî
...
Li ber ava ye, roja xwînxwar û diz
Li me derbûye rojek bê nihanî
Ji wan re gorreke pir teng dikolin
Hejar û Bêkes û Hacî û Xanî”80

80 Cegerxwîn, “Dîwana Min Derdê Millet e”, *Sewra Azadî,* r. 13

81 Zilkîf Xweşnav, “Di Helbesta Kurdî de Destpêka Bizava Romantîzmê û Taybetmendiyên Romantîzma Hacî û Cegerxwîn” (gotara çapnebûyî)

Yanî edebiyat wê welatê Cegerxwîn ji “xwînxwar” û “diz”an azad bike ku di helbestan de “xwînxwar” dagirkerê welatê wî ne û diz jî alîkarê dijmin ango xwînxwaran e. Ev rola edebiyatê ku reflekseke tevgera romantîk e Zilkîf Xweşnav wiha rave dike:

“Wate romantîzma Kurdî bêtir bi rûyê xwe yê siyasî û civakî derket pêş û helbestvanên Kurd jî wek têkoşerên siyasî û civakî hunera xwe kirin xizmeta pêşketina gel û niştimanê xwe. Ji ber vê mebestê, helbestvanên romantîk ên Kurd têkoşîna xwe ji du aliyan ve bi rê ve birin. Ji aliyekî ve gelê Kurd bi tevahî li dijî dijminên derveyî han didan û dawa azadî û avakirina dewleta neteweyî dikirin ji aliyê din ve dijayetiya desthelatdarên civata Kurdî yên mîna şêx, axe û began dikirin û dixwestin di nav civata Kurdî de guhertinên bingehîn pêk bînin û berê gelê Kurd bidin cîhana nûjen a pêşketî.”81 

Cegerxwîn, di helbesta "Ho Şivano"[82] de xwe weke şivanekî ku divê li bilûrê xe û ew bilûr wê kurdan şiyar bike, dibîne. Şivan jixwe ji aliyê gelek kesan ve weke metaforeke îqtîdarî tê dîtin.[83] Wî xwe ji helbestvanekî bêtir weke rêberekî dîtiye ku karê wî hişyarkirina gel, vexwendina girseyan ji bo şer û hewldana bidestxistina îqtîdarekê ye. Loma jî dibêje: "*Wezîfey xom her teblîxî kurd e*",[84] "*Xêzên me nivîsîne bi xwe ayetê kurd in*",[85] "*Peyvên me nivîsîne ayetê kurd in*"[86] Di helbesteke din de jî "*Rêber im, peyxember im, ilham ji ezmanê welat*"[87] dibêje û peyxemberiya xwe ku jêzaya wê ezmanê welat e, îlan dike. Ji van gotinan diyar dibe ku di tevgerê millî de rola edebiyatvan çawa şikil digire. Fikra rabirdûyeke îdeal û têkûz ku ji îqtîdarên kurdan pêk dihat, ji bo avakirina "îro"yê hatine bikaranîn. Weke ku Octavio Paz dibêje "*Di civatên kevin de arketîpa demê model, ne niha û dahatû ye, rabirdû ye.*"[88] Ya Cegerxwîn jixwe tiştek di "niha"ya wî de tune bû, ji ber vê yekê mecbûr dima ku malzemeyên xwe ji rabirdûyeke ku her kes ji kêfa dimir derxista. Vê yekê jî dikir ku serî li îdealîzasyonan bide. Helbestên mişt ji dîdaktîzmeke siyasî, malzemeyên xwe jî li gorî wê hildibijart. "Di berhemên hunerî de em malzemeyan, fonksiyonê li ber çavan digirin û çê dikin"[89] digot Arîstoteles. Yê Cegerxwîn jî malzemeyên wî hêmanên ji kokên arkaîk pêk dihatin ku di xizmeta dîdaktîzmeke siyasî de bûn.

82 Cegerxwîn, "Ho Şivano", *Ronak*, r. 106, 107

83 Özgür Kasım Aydemir, *Hataî'nin Şiirlerinden Hareketle İktidar Çözümlemesi*, http://turkoloji.cu.edu.tr/DILBILIM/ozgur_kasim_aydemir_hatai_iktidar_cozumleme.pdf (Di 10 Sibatê 2012an de hatiye daxistin)

84 Cegerxwîn, "Wezîfey Xom", *Agir û Pirûsk*, r. 32

85 H.b. r. 51

86 Cegerxwîn, "Seyda û Pîr Stalîn", *Sewra Azadî*, r. 88

87 Cegerxwîn, "Sergerdan im Ez", *Hêvî*, r. 98

88 Octavio Paz, *Çamurdan Doğanlar*, wer. Kemal Atakay, Can Yayınları, İstanbul, 1996, r. 20

89 Jusdanis, "Sanatın Ortaya Çıkışı ve Modernleşme", *Gecikmiş Modernlik.* r. 136

90 Cegerxwîn, "Doz li Nik Şûr û Pera", *Agir û Pirûsk*, r. 61

Cegerxwîn, ji bo avakirina nasnameyeke kolektîf tev geriyaye û fikirîye ku bi vî awayî wê yekitî pêk were û îqtîdar ango, ji bo wî heman tişt e, azadî pêk were. Elbet ev fikrên wî ji ber wê çirav û lîtavên ku wê demê kurd tê de bûn şikil girtine. Ji bo ku nasnameyeke kolektîf bê avakirin jî pêdivî bi pêvajoya homojenkirinê hebû ku gotina "Ferqê lor û gor û bext çi ye, Em hemî kurd û zimanê me kurdmancî ye."[90] ji ber vê yekê ye. Yanî ji bo ku rewşa "yekitî" çê bibe divê "yekkirin" çê bibûya ku ev yekitî di heman demê de wê îqtîdar bi xwe re bianiya. Ev jî wê bi qêrînên pênûsa wî ku di encamê de wê kurd ji xew şiyar bibûna pêk bihata: 

“Ji xame re min gotî ey xame-tîj;
Li ser rûye kaxez bi qêrên û qîj.
Di fermanê rabe, tu çak û çeleng,
Li kurdan biqore bi hawar û deng.
Divê ko tu kurdan ji xew rakî zû;
Ji ba min, ji wan tu bikî arezû” [91]

91 Cegerxwîn, “Ji Xameya Min re”, *Agir û Pirûsk,* r. 70
92 H.b. “Divê Em Bibin Yek”, r. 29
93 Cegerxwîn, “Ser bi Zêrê”, *Kî me Ez,* r. 287
94 H.b. “Çûna Şamê”, r. 117
95 Elias Canetti, *Kitle ve İktidar,* wer. Gulşat Aygen, Ayrıntı Yayınları, İstanbul, 2010, r. 44

Jixwe “*edîb û şaîrên kurdan, bi biskên şêr mijûl mabûn*"[92] ku karê edebiyatvan divê avakirina vê yekitiya navborî bûya lê ev yekitî neanîbûn cih. Pênûsa wî weke ku li jor gotiye wê ji dêvla top û tangan bihata bikaranîn; lewre ya mûhîm ne xemên estetîk bûn, lê xemên neteweyî bûn ku li dawiya wê îqtîdarek wê hebûya. Lewre ew ji helbestvanekî bêtir şervanek bû û ew rist îtîrafa bêkêriya wî ya ebedî bûn: “*Cegerxwîn por spî bû bêkêr / Bi van ristan dixwazî xwe veşêrê*”.[93] Wî xwe weke “Seydayê kurdan”[94] didît. Loma jî divê kurd bikirina yek, ji bo wê jî tim diqêriya. Qêrîn ango slogan, sîleheke xurt bû ji bo wî. Ji gotinên şayik ku “pesnên biskê şêr” bûn bêtir pêdiviya wî bi sloganan hebû ku “slogan” (Sluagh + gaîrm)[95] qêrîna miriyan bû. Hem slogan bi kar tanîn hem jî bi zimanê gel dinivîsî ku ev yek hem veqetînek bû ji edebiyata klasîk hem jî weke ku Jusdanîs gotiye, taybetiyeke tevgerên neteweperwer bû:
“Navgîna avakirina hişmendiya millî ya herî xurt zimanê herêmî ye. Divê Entelîjansiya ji bo girseye şer bikin ji bo şoreşê, bi zimanekî ku ew karibin jê fam 34

bikin bang bikin. Miletên Ewrûpî piştî ku zimanên herêmî gihaştin asta zimanên klasîk, nexasim asta Latînî, der ketin holê.”96

96 Jusdanis, *Gecikmiş Modernlik,* r. 69

97 Cegerxwîn, “Ol û Daxwaza Min”, *Zend-Avista*, r.12

98 H.b. “Hîn Bike” *Zend Avista*. r. 63

Jixwe Cegerxwîn di helbesta xwe de dibêje ji bo hişyarkirina gel e ku ez bi zimanê herêmî ango şîweya xwe dinivîs im:

“Bi hûnan û rist in, bi şîwa min in
Ne min ew dizîne, ji mêwa min in
Ku çend sal e min ew kul û rence xwar
Dixwazim te rakim ji xew ey xewar”97

Di Cegerxwîn de mudaxeleya ziman ku fikra “paqijkirin”, “ji zimanê biyanî parastin” encama vê hişmendiyê ne ku Jusdanîs vêya bi hewcedariya hişmendiyeke “millî” ve girê dide da ku îqtîdareke millî li ser vî zîmanî ava bibe. Lewre li gorî Cegerxwîn ew ziman divê bê “paqijkirin” û ji zimanê biyaniyan bê parastin û bê bipêşxistin:

“Divê em ji nûve wî paqij bikin
Bi sal û demam em xwe lê gij bikin
Bi destûr û ristin wî bajone pêş
Ji wî dûr bikin em hemî derd û êş”98

Ev fikra mudaxeleya ziman ji paşxaneyeke wiha dizê ku du aliyê wê hene û ev herdu alî hev xwedî dikin. Yek ew e ku eger zimanê te ne xurt be tê zeîf bimîne û li ber îqtîdara “dijmin”an “weza û hejar” bibî: ”*Zimanê te çewt e zimanê te xwar / Li ber* 35

*dijminê xwe weza û hejar*"[99]. Ya duduyan jî ew e ku eger tu dewletê ango îqtîdarê ava bikî zimanê te "xweş" ango xurt dibe: "*Tu dewlet li darxe, ziman xweş dibî / Riwê dilrevayan bi wî geş dibî"*[100] Eagleton, "*Binhişî weke ziman saz bûye*." [101] dibêje. Belkî sedema vî zimanê Cegerxwîn ku mudaxeleyî ziman dike jî, ji ber wê binhişiya Cegerxwîn be ku ew binhişîn, bi tesîra "dijminan" şiklê xwe stendiye.

99 H.b. r. 61
100 H.b. r.63
101 Eagleton, Edebiyat Kuramı, r. 167
102 Cegerxwîn, "Fidakarê Welat im", *Şefaq*, r. 13
103 Cegerxwîn, "Hey Qehreman Milletê Kurd", *Sewra Azadî,* r.19
104 Cegerxwîn, "Di Qeyd û Bendan Ranazin", *Kî me Ez,* r. 30
105 H.b "Em Kurdê Çiyan e", r. 35
106 Cegerxwîn, "Ji Çeqel û Roviyan Natirsim", *Hêvî*, r. 40
107 Anderson, *Hayali Cemaatler*, r.13

Dema Cegerxwîn ji bo avakirina nasnameyeke kolektîf xebitiye ango helbest nivîsîne, tim ji kokên arkaîk îstîfade kiriye û ji bo "îro"ya xwe rabirdûyeke ku tê de mûqtedîr bûn, azadbûn, îqtîdar a wan bû ango a bav û kalên wî bûn, teheyûl kiriye. Vê yekê bi awayekî xurt rengvedana xwe daye helbesta wî. Ji bo avakirina meşrûiyeta "niha" ji tarîxê îstîfade kiriye. Pirsa "Li tarîxê binêrin ez çawa me"[102] ku bersiva wê îqtîdarên berê ne, ji wê bingehê tê.

Di rabirdûyê de çawa "bav"ê wî yê mûqtedîr dijiya ku xwediyê her tiştî bûn; birc, seray, tac, al, ol, text û gelek tiştên din, îro jî ew dijiya lê weke warîs ji van hemûyan bêpar mabû. Lewre ew, geh kurê "*Rustem û Guhderz û Silah*"[103] e geh kurê " *Selahidîn, Erdeşîr, Keykawis û Xesro*"[104] geh jî kurê "*Deysem û Şêrgo*"[105] ye. Di helbesta "*Ji Çeqel û Roviyan Natirsim*" de ew êdî ne kurê van mûqtedîran e ku vê tarîxa arkaîk pêk tîne, paşxaneyeke hîn xurtir peyda dike ku rasterast dibeje, "Kurê tarîx im".[106] Ev yek gotina Anderson tîne bîra mirov, "Li ser bav û kalên xwe, avakirina fantaziyan, taybetiyeke neteweperweriya 1820an e."[107]

Di avakirina nasnameyeke kolektif de Cegerxwîn tim kokên arkaîk bi kar tîne ku ev kok weke îqtîdarên berê yê kurdan yên "dema bextewariyê" tên pêşkêşkirin. Jusdanîs jî di avabûna netewe dewletan de balê dikişîne ser heman pêvajoyê:

"Dîrokeke hilbijartî, taybetiyeke bingehîn ya hemû dewletên nû ye, ji ber ku xwedîbûna rabirdûyekê, xwedîbûna mafê dahatûyekê bi xwe re dide qebûlkirin. 36

Entellektuelên bijarte divê ji milletê nû re payebilindiyeke bi şanaz ya kokên wan peyda bikin û weke mîtoseke millî vê kevneşopê bi cemaatê ve girê bidin."[108]

108 Gregory Jusdanîs, *İmparatorluktan Ulus Devlete, Gecikmiş Modernlik ve Estetik Kültür Milli Edebıyatın İcadı,* r. 51

109 Cegerxwîn, "Rewşa Welêt", *Sewra Azadî,* r. 207

110 Jusdanîs, r. 68

111 Anderson, *Hayali Cemaatler,* r. 163

112 J. Stalin, *Diyalektik ve Tarihsel Materyalizm*, wer. Mustafa Şentürk, Yorum Yayınları, İstanbul, 1993, r. 19

113 Karl Marx, F. Engels, *Felsefe Metinleri,* r. 241

114 Cegerxwîn, "Şox û Şeng", *Aşitî,* r. 159

Ji bo "îro"yê îstîfadekirina ji rabirdûyê elbet ji bo dahatûyekê ye ku dema Cegerxwîn qala vê dahatûyê dike, mirov dibêje ne qala welatekî azad, lê qala bihuştê dike. Di helbesta "Rewşa Welat"[109] de yar û ew di destê hev de ne, serxweşî û mestî heye, av diherikin her der dar û ber, bax û bustan in, lêv li ser lêvan in, tirs nemaye û hindik maye mirov ji kêfan bimrin û doza netewe dewleteke nûjen e ku aştî û aramî tê de heye. Ev yek bixwe jî çawa ku Cegerxwîn di gelek helbestan de xewnan dibîne, weke xewnekê ye. Weke ku Stathis Gourgourîs dibêje**, "***Millet beriya ku bi awayekî siyasî û coxrafî bibin yek, di xewnan de dibin yek*.[110] Belkî ji ber wê ye ku Cegerxwîn tim xewnan dibîne û xewnên xwe vedibêje ku her kes wan xewnan bibîne.

Di helbesta Cegwerxwîn de nivîsîna merşan jî bûyereke balkêş e ku bi dehan merş nivîsîne û her wiha merş rasterast hebûna îqtîdarekê refere dike, sembolîze dike, xurt dike. Xuya ye ku Cegerxwîn, di gotina merşan de yekitiya gelekî teheyûl kiriye û îqtîdara ku wê vê yekitiyê bi xwe re bîne fikiriye. "*Peyvên wê çiqas basît, newaya wê çiqas ji rêzê bila ji rêzê be, di xwendina merşan de pratîka hemandemî heye. Di demên wiha de mirovên qet hev nas nakin di heman newayê de heman ristê dixwînin."[111]* Merş gelek caran vexwendina şer û şoreşê dike ku wê bi avakirina îqtîdarê bi dawî bibe. Temasa Cegerxwîn ya bi Marksîzmê ve jî weke yek ji wan xalên ku şer û şoreşê xurt dike dikare bê dîtin. Lewre guhertina desthilatdariyê û avakirina îqtîdaran ne bi reforman hew dikarîbû bi şerê şoreşgeriyê pêk bihata.[112] Gotina F. Engels jî ji bo vê yekê paşxaneya teorîk pêk tîne: "*Mirov û xweza li gorî heman qanûnê ne. Qewet û azadî heman tişt in.*"[113]

Di têkiliya Cegerxwîn û Marksîzmê de her çiqas "Markîsî xweş dizanim, pîrê ola Markîs im"[114] dibêje û xwe di vî warî de weke "pîr" dibîne jî, ji termînolojiya ku bi 37

kar tîne dikare bê gotin ku Cegerxwîn ji Marksîstekî teorîk bêtir Marksîstekî pratîk e. Lewre tenê ew xetên bingehîn yên Marksîzmê dizane. Tiştê ku Valî ji bo bikaranîna xezîneya peyvan dibêje ji bo vê meseleyê jî wisa guncaw e: *"Vegotina neteweperwer ya heyama nûgihîştî, ji xeynî têgehên etîk-siyasî û bikaranîna hestewar ya teoriya mafên xwezayî, ji xezîneya peyvan ya têgehî bê par bû.*"[115]

115 Vali, Kürdistan Cumhuriyeti, r.123

116 Cegerxwîn, "Rencberê Bi Rûmet", *Kî me Ez,* r. 170-180

Çend têgehên weke "proleter", "karker", "cotkar" "borcewazî" ne tê de, di helbestên wî de mirov rast li termînolojiya Marksîzmê nayê. Bêtir di çerçoweyeke ku mentiqa Marksîzmê temsîl dike, şopên wê bi awayekî xurt dikare bê dîtin. Di gelek helbestan de ev yek hatiye dubarekirin ku "karker û cotkar", ku weke proleter tên binavkirin, radihêjin das û çakûçên xwe êrîşî dewlemend, sermiyandar ango borcewaziyê dikin û dewletê ji wan distînin û dewleta xwe ku wekhevî tê de serdest e, ava dikin.

Weke mînak di helbesta "Rencberê bi Rûmet"[116] de karkerên ku neheqî li wan bûne, evarî diçin sînemayê. Di sînemayê de filmekî bi navê "Sewra Oqtober" tê nîşandan. Piştî temaşekirina fîlm, yekitiya karkeran çê dibe û serî hildidin. Piştî serhildanê dewlet dikeve destê wan û karker dikevin welatekî weke "bihiştê":

"Bextê wan pir spî bû
Filim Sewra Oktober
Ew karkerên sînema
Hemî bûne wek agir.
…
Hemî karker bûne yek
Dest pê kirin sergêjî
Salar di nav wan de xweş
Tim gotinan dibêjî
…
Divê karker bibin yek
Da em bibin bi rûmet 38

Bi vê ristê bigorin
Em jî bibin dewlet
…
Geh bi dar û bi lêdan
Geh bi qîr û bi halan
Lê pir neçû, welat tev
Rejîm, kete destê wan”

Bi awayekî klasîk û basît ku bingeha teoriya Marksîzmê ye, karker dibin yek, serî hildidin û weke proleter di şerê li hember îqtîdarê de bi ser dikevin û dewletê ava dikin.

### 1.2.1. Evîna Welat û Îqtîdar

Cegerxwîn, gelek helbest nivîsîne ku evîn, evîndarî tê de heye lê ew evîn û evîndarî di hemû cihan de, ne di heman konteksê de ne û xwedî wateyên cuda ne. Qismek, ji evîna welat pêk tên ku di wan de û yara wî welat e û yareke polîtîk e û bi piranî di dîwanê wî yên ewil de peyda dibin, qismek jî evîna yara cinsî ye ku ev cure evîn, di hemû dîwanan de hene lê nexasim di dîwanên wî yên dawî de.

Di gelek helbestên wî yên ku welat yara siyasî ye de, yar weke alegoriya welat hatiye dayîn ku bedena yarê, coxrafyaya welat e û bi vî şiklî ew beden, bûye bedeneke polîtîk. Di helbestên wî de welat bi bedena jinekê hatiye şibandin, bi hezkirin û evîna yarekê hatiye temsîlkirin û pîrozî lê hatiye barkirin. Ev hemû jî bi refleksên siyasî ango ji bo bidestxistina îqtîdareke kurd hatine kirin ku êdî “yar” yareke polîtîk û bedena wê jî bedeneke polîtîk e.

Di helbestên weke “Destgirtiya Xortan”[117], “Ji Ehmed Namî re”[118], “Mêrane Rabin Xortên Kurdistan”[119], Nizanim Ez Nizanim”[120] û gelek helbestên din de yar, qîz ango jin alegoriya welat in; bedena yarê, bûkê ango qîzê weke temsîla coxrafyaya welat

117 Cegerxwîn, “Destgitiya Xortan”, *Agir û Pirûsk,* r. 16
118 H.b “Ji Ehmed Namî re”, r. 152
119 Cegerxwîn, “Mêrane Rabin Xortên Kurdistan”, *Sewra Azadî,* r. 16
120 Cegerxwîn, “Nizanim ez Nizanim”, *Kî me Ez,* r. 53 

e, rewşa wê jî rewşa welat e. Elbet alegorî tim ne bi beden û rewşa yarê ve girêdayî hatiye kirin. Di helbesta “Serxwebûna Mirîşkan”[121] de alegorî bi rewşa mirîşkan hatiye kirin ku ew jî alegoriya welat e. Ev alegoriya neteweyî gotina Fredrîc Jameson ya li ser welatên paşdemayî tîne bîra mirov:

[121] Cegerxwîn, “Serxwebûna Mirîşkan”, *Agir û Pirûsk,* r. 84

[122] Fredric Jameson, *Modernizmin İdeolojisi, Edebiyat Yazıları*, wer. Kemal Atakay, Tuncay Birkan, İstanbul, 2005, r. 372, 373

[123] Cegerxwîn. “Ev Çi Dîmûqratî ye?”, *Kî me ez,* r. 237

[124] H.b. “Rewşa Evînê”, *Kî me ez,* r. 283

[125] Cegerxwîn, “Kurdistan”, *Ronak,* r. 55

“Hemû metnên dinyaya sêyemîn, bi awayekî zerûrî alegorîk in, bi awayekî gelekî xweser alegorîk in, ev alegorî weke *alegoriyên neteweyî* divê bên xwendin... Metnên dinyaya sêyemîn, hetta yên ku bi dînamîkeke lîbîdînal ya xwerû ya warekî şexsî xuya dikin jî, aliyekî siyasî ku perçeyekî ji alegoriya neteweyî ye, bi awayekî zerûrî di xwe de dihewînin.” [122]

Ji bo metnên ku di nava kolaja neteweyî de dikarin bên nirxandin çiqas ev yek rast e ew mijareke din e, lê ji bo gelek helbestên Cegerxwîn ev yek bi rihetî dikare bê gotin. Cegerxwîn gelek helbest nivîsîne ku yar, qîz ango bûk alegariya welat û rewşa welat in. Avakirina îqtîdarekê li ser vê bedenê ango li ser welat heman tişt e.

Di helbestên weke “Ev Çi Dîmûqratî ye?”[123], “Rewşa Evînê”[124], “Kurdistan”[125] de mûkafat maç û derman e, ji vê bedena polîtîk. Ji sedemên ku di van alegoriyan de ku jin dibin alegoriya welat belkî yek jê ew be ku jin weke welat zeîf e û bêxwedî maye. Çawa di têkiliyeke patrîarkal de divê mêr ango zilam, xweditiyê li jinê bike, di şibandina jinê û welat de jî dibe ku heman mantiq hebe. Rubina Saigol têkiliya di navbera welat û bedena jinê wiha vedibêje:

“Vegotina netewe li ser laşê jinê ava dibe; Jin dibe sembol û nîşaneya bi hestewariyê mişt ya malê û netewe, kesayet û dinya manewî. Dayikniştiman (Maader-e watan), bi şehweta erotîk ya “dê” tê dorpêçkirin. Bi vî awayî welat, hem 40

bi awayekî romantîk û erotîk û hem jî bi peyvên ku aliyên wan ên têkildarî dêtiyê hene, tê temsîlkirin.”[126]

126 Ayşe Gül Altınay, “Millitarizasyon, Ulus ve Toplumsal Cinsiyet: Şiddetli Çatışma Alanları Olarak Kadın Bedenleri”, *Vatan Millet Kadınlar*, İletişim Yayıncılık, İstanbul, 2009, r. 232

Di helbesta “Şam Şekir e Welat Şêrîntir e” de weke gelek helbestên din rewşa bûkê rewşa welat e, teswîra bûkê alegoriya welat e. Welat di şibhetê bûkê de hatiye teswîrkirin ku rewşa welat dide zanîn. Di helbesta ku bi teşbîhên xurt, ji serî û aniyê dest pê dike û birhû, zilf, lêv, sîng û berjêr diçe ta ku digihêje “Geliyê Laleş” de bedena bûkê û coxrafyaya welat heman tişt in. Di vê helbestê de bi awayekî balkêş, organa cinsî ya jinê bi Geliyê Laleş hatiye şibandin û bi yekê qûtsiyet li vê bedena polîtîk hatiye barkirin, ji ber ku Geliyê Laleş qûtsiyeta wê heye û mekaneke îbadetê ye. Di rêzikên dawî de jî behsa zavayên biyanî yên ser sînga wê dike ku ev yek temsîla dagirkirina welat e; ne xwediyê bûkê li ser sînga wê ne, biyanî li ser sînga “bûka me” ne ango welatê me ne, di destê me de ye û em bûne biyaniyên welatê xwe, di destê biyaniyan de ye ku ev dagirkerên welatê me ne:

“Welatê min ti wî bûka cihan î
Hemî bax û bihuşt û mêrg û kanî
Şepal û şeng û şox û naz û gewr î
Gelek şêrîn û rind û pir ciwan î
Serî taca Silaheddînê kurd î
Enî roj e, di birca asîman î
Du birhên te kevanê Rustemê Zal
Du zulfên te ji tîrên qehremanî 41

Riwê te agirê Zerdeşt û Mezdik
Ji te hêstir şeraba Kamiran î
Du lêvên te kitêba Hacî Qadir
Zimanê te ji benda şêxê Xanî
Çena te gohê Cûd û Şax û Hebler
Qirik eywan û taqa kesrewanî
Di sînga te kitêba Zend Avista
Memik ferfûre tê de neqşên Manî
Du destên te tixûbên Tirk û Îran
Hero ceng e bi tîrên zerveşanî
Ji sînga te bi jêr de gelyê Laleş
Ziyaretgah e bo me her zemanî"
...
Herê bûkê pepûkê jar û mestê
Li ser sînga te zava man biyanî"[127]

[127] Cegerxwîn, "Şam Şekir e Welat Şêrîntir e", *Sewra Azadî,* r. 53, 55
[128] Cegerxwîn, "Dezgirtiya Xortan", *Agir û Pirûsk,* r. 16

Di helbesta "Dezgirtiya Xortan"[128] de jî welat, dîsa qîzek e û li xortê ku lê xwedîtiyê bike digere. Di vê helbestê de jî bedeneke polîtîk e bedena qîzê. Bang li xortan dike ku ji bo wê şer bikin da ku wê bi dest bixin. Lewre ji bo ku ew xortan qebûl bike, yanî beriya ku bibin mûqtedîr li ser bedena wê, divê ewilî li ser bedena welat xwedî îqtîdar bin, ji ber ku her du beden heman tişt in. Di rêzika dawî de jî, ji bo ku ew xortan qebûl bike şertê xwe dibêje; "tac û seray" ango îqtîdara welat: 42

“Xemlandî me seranser dezgirtiya xorta me;
Gerden sêvek sor û zer, li hêviya merda me
Qelen xwîn e ne gewher, Kurdistana kurda me.
Bê tang û top û leşker, îro we ez berdame
Kurdistana delal im; herkes tê min dixwazî;
Ez pir şox û şepal im, min deng daye bi nazî.
Ev bûn bîst û du sal in, li ser min cengebazî
Kurdo wer min bixwazî, belê bi serfirazî
...
Xorto! Eger tu rabî, wek başoke herî çûk;
Ne xurt û şehreza bî, nastênî ji min mûk
Ne wek şêr û gura bî, bûkê didî bi tûtûk
Ku bê tac û sera bî, tê çawan min bikî bûk”

Çawa ku weke perçeyeke ji bedena polîtîk in, di helbestan de memikên yarê, qîzê, ango bûkê hevalbendiyê bi teswîrên din re jî dikin. Weke ku di mînakên jor de jî derbas bûne, eger ew bedena yarê ku welat e, bê bidestxistin weke mûkafat ew perçeyên din jî ku memik jî di nav de, wê bê bidestxistin. Marilyn Yalom ji bo rewşeke weke vê yekê têgeha “memkên polîtîk” bi kar tîne û qala bikaranîna vê yekê ji aliyên îqtîdaran ve bi vî awayî dike:

“...memik, di sedsala 18an de bû ku bû xwedî wateyeke siyasî; ji wê tarîxê û vir de ji jinan hat xwestin ku memikên xwe ji bo fêdeya neteweyî û nav-neteweyî pêşkêş bikin...Di demên şer û şoreşê de hatin teşwîqkirin ku bi memikên xwe “leşkerên xort” destek bikin û memkên xwe vekin ku bibin sembola azadiyê. Ev hemû 43

polîtikayên li ser memikan ji aliyê tevneke ku ji hikûmet, saziyên aborî, dînî û tenduristiya girseyî ve pêk dihat, hat organîzekirin."129

129 Marliyn Yalom, "Politik Meme", *Memenin Tarihi*, wer. Ayşe Gün, Çitlenbik Yayınları, İstanbul, 2002, r. 144

130 Cegerxwîn, "Serxweş im", *Kî me Ez,* r. 292

131 Cegerxwîn, "Piropaganda", *Zend-Avista,* r. 49

Cegerxwîn, di helbesta "Serxweş im"130 de meya Ahmedê Xanî vedixwe ku ev mey welatparêzî ye û digihêje dozê ku ev doz, memkên sorê Exlatî ye ango memikên polîtîk in:

"Ji kûpê destê kolxozê
Perî rengê, şeker sozê
Me mey noşî, giham dozê
Du sêvên sorê Exlatî"

Ev memkên polîtîk ber bi dîwanên dawî de êdî dibin memkên erotîk in; yara ku li ser hatiye nivîsîn êdî yareke ne razber, bêtir şênber e û hetta di dîwana heştan de ku li Swêdê nivîsiye memik, memkên "keçikên xweşik" ên Swêdî ne. Ev guhertin di hinek helbestên din de jî aşîkar e. Weke mînak heta dîwana pêncan ku jin ji bo şer ango tevgera neteweperwer girîng e û hetta dikare bê gotin ku Cegerxwîn kastrasyonekê (xadimkirin) bi kar tîne û ber bi dîwanên dawî ve ev yek tê guhertin. Cegerxwîn, di helbesta "Piropoganda"131 de dibêje:

" Bere jin di vê rê hevalê we bin,
Ne ko dot û yar û delalê we bin"

Yanî ji bo şer in ew, ne ji bo hezkirinê ne, lewre têkiliya hestewar ne rast e di dema têkoşînê de û evîna pratîk wê rê li ber pratîka şoreşgeriyê bigire. Lê di helbesta 44

“Ez Gelek Tî me” 132 de şopên vê kastrasyon û îmtînayên cinsî qet xuya nabe; ew êdî dixwaze xurîniya xwe bi memkên keçkê bişikîne:

132 Cegerxwîn, “Ez Gelek Tî me”, *Aşitî,* r. 115

133 Ejder Okumuş, “Bedene Hükmetmenin Sosyolojisi”, Şarkıyat İlmi Araştırmalar Dergisi, j. 2, Kasım 2009, r. 5

134 Cegerxwîn, “Serpêhatiya Ciwan û Dewlet”, *Sewra Azadî,* r. 127

“Ji baxê paxil û sîngê
Eger sêvek bidî Seyda
Xurînî pê ku bişkînim
Diçim ser rê ku sêwî me”

Weke encam di mijara beden û îqtîdarê de dikare bê gotin ku beden, warek e ku şer û têkiliyên îqtîdarî rengvedana xwe didinê. Ji ber ku kontrolkirina bedenan têkildarî îqtîdarê ye û îqtîdarê refere dike. Bidestxistina yarê ango bedena yarê tê wateya avakirina îqtîdarekê li welat. Jixwe îqtîdar jî li ser mirovan ango li ser bedenan ava dibe ku Ejder Okumuş di gotareke xwe de vê têkiliyê wiha rave dike:

“Dîroka mirovahiyê, dikare bê gotin ku dîroka mudaxeleya pergalên civakî, îqtîdarên siyasî, îdeolojî û dînan e. Pergalên civakî, îqtîdarên siyasî, îdeolojî û dînan berê xwe dabe ruhekî, zihniyetekî jî dawiya dawî, xwestine û xebitîne ku kontrolekê li ser bedenên takekesî pêk bînin.”133

Di helbesta “Ciwan û Dewlet”ê134 de êdî yar ne welat e; îqtîdara welat bixwe ye ku navê wê, pileyeke bilindtir, gaveke pêştir e ku “Dewlet” e. Navê wê “Dewlet” e û navê diya wê jî “Rûmet” e ku xwestiye bibêje dewlet ango îqtîdar ji rûmetê ango xwedî rûmetbûnê tê û dizê. Yanî yê ku xwedî rûmet be dikare îqtîdarê/dewletê ava bike: 45

“Eger dixwazî tu min bikî yar
Hero dibim ez li ber te reşmar
Hingî ku Dêwê spî wisa sax
Navê min Dewlet zana û hişyar
Keça Şehînşah: Şahê Sitembar
Diya mi Rûmet bilind û serbestî”

Di helbestên evînî yên ne alegorîk û polîtîk de jî şopên têkiliyên xurt ên îqtîdarî dikarin bên dîtin. Di helbesta “Çavbelekê”[135] de pozîsyona wî ya li hember yarê bi “esîrî” hatiye binavkirin ku encax îqtîdarek dikare esîr bigire. Lê di heman helbestê de, ji wê bêtir “secdekirina ji bo yarê” îqtîdareke xurtir refere dike ku ev taybetiyeke Xwedayî ye. Yanî çawa mirovek li ber îqtîdara Xweda bêîqtîdar be, ew jî li hember îqtîdara yarê bêîqtîdar e:

[135] Cegerxwîn, “Çavbelek”, *Agir û Pirûsk,* r. 203

“Tu zanî ey hebîba çavbelek min dil hemî derd e,
Di benda zilfê reş-tûzî esîrê xo demek berde.
Li heyva çardehê îro, li ber pacê dinêrim ez,
Ji ser wechê xwe rake ey hebîba çavbelek perde.
Li min perde hilanî zû, di nav şewqê de wenda bûm,
Me sejde birye ber bejnê, miqedes kir li min erd e.”

Di gelek helbestên evînî de yar bi terminolojiyekê hatiye vegotin ku gelek ji wan terman, rengvedana têkiliyên hiyerarşîk yan têkiliyên îqtîdarî ne. Yar, bi peyvên mîna 46

"padîşah", "mîr" "serdar" hatiye wesfandin ku ev bikaranîn hizra patrîarkal refere dike. Di helbesta "Navê Xwedê Min Dî di Rû"[136] de yar "serdar" û "padîşah" û "Xweda" ye.

[136] Cegerxwîn, "Navê Xwedî Min Dî di Rû", *Hêvî,* r. 177

[137] Cegerxwîn, "Dîlberên Cengê", *Agir û Pirûsk,* r. 208

"Rûdêm ji cama mermerî
Gava ku hate ber derî
Min xweş bi çavan lê nerî
Padîşeh û serdar e keç
...
Çawa ku hate hindirû
Navê Xwedê min dî di rû
Hildane jor herdû birû
Zana û pir hişyar e keç
...
Îro di dil da bû Xweda
Min awirek tûj jê veda
Ew jî sivik hat ber me da
Rû sorgula bê xare keç"

Di helbesta "Dîlberên Cengê"[137] de ji serî heya binî, bi pîroziyên teolojîk, peyvên leşkerî, mûqtedîrên siyasî, wesif û rewşa "dîlber" ê hatiye vegotin ku ev helbest mînakeke xurt e ji bo têkiliyên îqtîdarî. Dema mirov li termên Stalîn, Dîgol, Hîtler, leşker, tang û top û hwd. dinêrî, heçku helbest ne li ser wesfên dîlberê ne, xebereke di babeta şerê duyem yê cihanê de ye:

"Awirên keç leşkerê sor tîpê zilfan tang û top,
Aniya keç xetê ceng e, lê Stalîn daniye. 47

Leşkerê fikr û xeyalan ceyşê heştê Îngilîz,
Ber bi roma tim êrîş e, şerker û pir xazî ye.
Dil Digol e nabî carek ew ji doza xwe vebî,
Ta di Parîs de nemînî yek ji xortê nazî ye.
Rengê Kayşek pir inad e bostekî nadî ji Çin,
Ez perîşan kurd û dîl im, min ji te pir hêvî ye.
Can û dil bîr û hişim wan sond bi hev re xwarine,
Doz û daxwaz kuştina vî hukmê dîktatorî ye.
Rengê Hîtler wa te milkê dil ji min kir îhtîlal,
Wa Cegerxwîn çenteyê xwe wî bi desta girtî ye"

Di helbesta "Carek Were Ba Min"[138] de mekana yarê seray e ku seray bixwe sembola îqtîdarê ye û ev bixwe têkiliyeke îqtîdarî dihundurîne:

[138] Cegerxwîn, "Carek Were Ba Min", *Kî me Ez,* r. 210

[139] H.b. "Dil Ji Min Bir", r. 233

"Dev û lêvên şekerî bes bike inwanê xwezî
Çi dibî ko ji serayê carekê bê bi dizî?"

Di helbesta "Dil Ji Min Bir"[139] de yar wî dibe "birca serayê" ku mekana yarê ye û yar weke "keyxweda" yanî *xwediya serayê* hatiye wesfandin:

"Keyxwedayê şarezayê
Ez birim birca serayê 

Min nema destê xwe dayê
Dil ji min bir ahî dil”

Di hin helbestan de jî rolên ku “jin” digirin an jî ji bo wê minasib tên dîtin têkiliyeke îqtîdarî di xwe de dihewînin ku jin, li hember îqtîdara mêr ango zilaman ne di rewşeke baş de ne û xisûsiyetên îqtîdarî di nav wan de hene.

Têkiliyeke îqtîdarî ya din jî têkiliya “liserrazan” û “libinrazan”ê ye ku di hin helbestan de ev têkilî gelekî eşkere ye. Di helbesta “Mêrane Rabin Xortên Kurdistan” ê[140] de ji devê qîzê ku qîz weke alegoriya welat e, “li ser min razin” hatiye gotin. Têkiliya ku di hezkirinê de weke “liserrazan” û “libinrazan”ê cereyan dike, têkiliya Adem û Lîlît tîne bîra mirov. Li gorî Talmûda Îbraniya jina ewil a berî Hawa Lîlît e.[141] Lîlît ji ber ku di têkiliya hezkirinê de wekhevî ango “libinrazan” red kiriye dev ji Adem berdaye. Ayşe Sevîm vê yekê wiha rave dike:

140 Cegerxwîn, “Mêrane Rabin Xortên Kurdistan”, *Sewra Azadî,* r. 18

141 Muazzez İlmiye Çığ, Kur’an, İncil ve Tevrat’ın Sümerdeki Kökeni, İstanbul, Kaynak Yayınları. 2005, r. 38

142 Ayşe Sevim, Feminizm, İnsan Yayınları, İstanbul, 2005, r. 22

“Ji ber ku weke Adem Lîlîth jî ji axê hatibû xuluqandin, di têkilya hezkirinê de wekheviyeke teqez dixwaze û li hember Adem der dikeve. Dema ku xwestekê xwe nade qebûlkirin jî dest ji Adem berdide û dest pê dike bi şeytanan re dijî. Piştî ku Lîlîth melayketê ku ji aliyê Xwedê ve, ji bo îknakirina wê hatibû şandin diqewirîne, Xwedê Havva çê dike ku ji bo zilaman, sembola îtaatê ye.” 142

Di helbesta Cegerxwîn de jî “qîz”, “libinrazanê” qebûl dike ku jixwe “liserrazan” tê wateya avakirina îqtîdara ser bedena wê. Avakirina îqtîdara ser bedena wê jî di heman demê de zeftkirina welat e û avakirina îqtîdara welat e:

“Eger bi xurtî hûn min bixwazin
Li we bipêçim zendên bi bazin
Dilxwoş û bê xem *li ser mi razin*” 49

Di helbesta “Cihan û Cegerxwîn”[143] de jî rewşeke weke ya jor, ku “liserbûn” û “libinbûnê” refere dike heye ku dîsa teqabulî heman têkiliya îqtîdarî ya jor dike. Di helbestê de piştî ku li ser sînga qîzê siwar dibe, ji aliyê qîzê ve teslimiyet pêk tê û “çîz” dibe û qîz îqtîdara li ser sînga xwe qebûl dike. Balkêş e ku “felek” organa cinsî ya zilam e û “zevî” jî organa cinsî ya jinê ye ku hatiye diyarkirin “felek” li jor e û “zevî” jî li bin e.

143 Cegerxwîn, “Cihan û Cegerxwîn”, *Agir û Pirûsk,* r. 109

144 Altınay, “Feminizm, Miliyetçilik, Millitarizasyon”, *Vatan Millet Kadınlar,* r. 203

145 Cegerxwîn, “Keça Kurd”, *Agir û Pirûsk,* r. 136

“Siwar be, li ser singê bes tu bilîz,
Ko dêwê spî me, li ber te me çîz.
Bi lav-lav û dilek, keçik hate min,
Felek ma li jor û zevî ma li bin.”

Di helbestên Cegerxwîn de rola ku ji bo jinê hatiye layiqdîtin jî di çerçoweyeke refleksên patrîarkal de ye ku sînorên tevgerên jinê bi “hundur” hatiye sînorkirin û warê azadiya jinê, bi vê têkiliya îqtîdarî hatiye diyarkirin. Lewre roleke wê ya pasîf heye û warê jinê ne “derve” lê hundur e. Bi vî awayî jî ji alîkî de serbestî jê re hatiye xwestin ji alîkî din jî ev serbestî bi “hundur” ve hatiye sînorkirin. Li gorî Cynthia Enloe “Ji bo ku geşedana neteweperweriyê bê famkirin ne bes e ku li meydana siyasetê an jî kursiya meclîsê bê nêrîn. Nêrîna li metbex û jûra razanê jî bi qasî wan girîng e.”[144] Helbesta “Keça Kurd”[145] nimûneyeke baş e ku keça kurd “rencbera hundur” e:

“Ey keçê rabe bixwîne da serbest her bijî,
Zû ji xew tû ser hilîne bes bimîne bê mejî
Rencbera hundir ti wî tim rind û jîr û zane be,
Bo te bêtir her divêtin xwendewarî, paqijî.” 50

Di helbesta "Şêrîn"[146] de jî jin weke "seydayê hundur" hatiye diyarkirin ku dîsa rola ji bo jinê hatiye diyarkirin bi sînorên "hundur" hatiye xêzkirin. Ew "seydayên hundur" in lewre "hundur" sînorên îqtîdara wan, bi gotineke din sînorên bêîqtîdariya wan e. Jixwe weke "seydayên hundur" ku di hukmê wan de ye, hew "paqijî" heye: "*Paqijî karê me ye seydayê hundir her em in / Dayika Guhderz û Ristem Kurd perest in dilxem in*"

146 H.b "Şêrîn", r. 137

147 Cegerxwîn, "Jin Hene Jinkok Hene", *Şefaq,* r. 116

148 H.b r 102

149 H.b r. 104

150 Murat Çemrek, "Bilginin Küreselleşmesi: Bilgi Toplumunda Siyaset" http://www.sde.org.tr/tr/haberler/563/bilginin-kuresellesmesi-bilgi-toplumunda-siyaset.aspx (wergirtina ji înternetê 13 Nîsanê 2011)

151 Foucault "Hapishane Üzerine Söyleşi: Kitap ve Yöntemi", *İktidarın Gözü,* r. 36

Ev têkiliya îqtîdarî ku weke rengvedana îqtîdara zilaman ya li ser jinan jî dikare bê dîtin bi îfadeyên negatîf ku ji bo jinan hatiye gotin, tê destekirin. Lewre gotinên weke "li cem jinan nîne bext"[147], "jin qels in"[148], "mêr çiyakî paqij jin li ser bûne mij"[149] encama vê têkiliya îqtîdarî ya îqtîdara patrîarkal e di çerçoweya edebiyata neteweyî de.

## 2. Di Helbesta Cegerxwîn de Têkiliya Îqtîdarê û Zanînê

### 2.1. Têkiliya Îqtîdarê Zanînê.

Têkiliya zanînê ya bi îqtîdarê re, babetek e ku gelek nirxandin, şîrove û analîz li ser hatine kirin. Ji ber ku îqtîdar li ser zanînê ava dibe û weke ku Francîs Bacon gotiye, "Zanîn bixwe qewet e" [150] ango îqtîdar e, gelek kesê bi îqtîdarê re serê xwe êşandine û di vî warî de gelek nivîsar ango berhem nivîsîne. Lewre zanîn bixwe îqtîdarê refere dike û ji bo avakirina îqtîdarê û her wiha domandina îqtîdarê zanîn diyardeyeke sereke ye.

Li gorî Mîchel Foucault jî, *bêyî zanînê ne mimkun e ku îqtîdar bê domandin, ne mimkun e ku zanîn, îqtîdarê ava neke*"[151]. Foucault têkiliya *hilberîna heqîqetê û îqtîdarê* ku di heman demê de ev têkiliya zanîn û îqtîdarê ye wiha rave dike:

"Heqîqet tê hilberandin. Ev hilberîn ji îqtîdar û mekanîzmayên îqtîdarê ne cuda ye; ji ber ku bi xêra mekanîzmayên îqtîdarê ev hilberînên heqîqetê pêk tên û rê li ber wan vedibe û hem jî di van hilberînên îqtîdarî de tesîrên ku me bi îqtîdarê ve girê 51

dide û dike yek hene. Tiştê min eleqedar dike ew e ku têkiliya heqîqat/îqtîdar û zanîn/îqtîdar e."152

152 Foucault, "İktidar ve Bilgi", *İktidarın Gözü,* r. 173

153 Çemrek, h.b.

154 Cegerxwîn, "Ne Bedbîn im", *Aşitî*, r. 196

Murat Çemrek di gotara xwe de li ser mijara zanîn û îqtîdarê û têkiliya wê ya bi jiyana civakî û siyasî wiha dibêje:

"Zanîn û qewet ewqasî ketine nav hev ku; dema qala yekê tê kirin a din jî bi awayeke sergirtî dikeve navê. Zanîn ji ber ku pêkbûna îqtîdarê gengaz dike bi qasî ku têkiliyeke siyasî hewce dike ewqas jî tevneke civakî hewce ye. Ji ber vê ye ku avantaja yên xwedî zanînekê ji yên ne xwedî zanînekê, bi qasî gotina "Ma yên zana û nezan qet dibin weke hev" bi bersiv e."153

**2.2. Di Helbesta Cegerxwîn de Rengvedana Têkiliyên Îqtîdarî di Warê Zanînê de**

Di helbesta Cegerxwîn de ji bo avakirina îqtîdara ku dixwaze bê avakirin, yek ji hêmanên bingehîn "zanîn" e ku di gelek helbestan de yek ji şertê avakirina îqtîdarê ye. Zanîn di helbestê de carinan bi peyva "xwendin"ê carinan bi "dibistan"ê û carinan bi "hişyarbûn"ê û "jixewrabûnê" carinan jî bi peyvên "xame, qelem"ê hatiye îfadekirin ku pevyên sereke yên bi dehan helbestan e. Carinan jî "zanîn" bixwe hatiye bikaranîn ku hemû di konteksteke îqtîdarî de ne û têkiliyên îqtîdarî dihundurînin.

Yanî ji bo kurd bibin xwedî îqtîdar divê bixwînin, zana bibin û hişyar bibin û ji xew rabin. Lewre ew di xew de ne û loma jî bê îqtîdar in. Ji ber vê ye ku Cegerxwîn cehd dike, da ku zanîn pêk bê û kurd bibin xwedî îqtîdar. Elbet ev îqtîdar netewe dewletek e ku ji bo vê yekê jî diviyabû endamên vî neteweyî neteweya xwe zanîbûya û sedema banga hişyarkirina Cegerxwîn ku hişyarbûn, zanabûn rengvedana vê ferasetê bûn "zanîn" jî, zanîna miletperwerî ango neteweperwerî bû. Qey ji ber vê yekê ye ku ew "Xwendevana Zanîngeha Amed" nade bi "Xwendevana Zangeha Sorbon"ê.154 Jixwe li gorî Cegerxwîn edebiyatê, divê ji bo şiyarkirinê yan jî bi gotineke din ji bo peydakirina 52

zanînê hewl bidaya. Îqtîdarek eger zanîn hebe dikare pêk bê ku zanînê weke dermanê avakirina vê îqtîdarê dibîne û gotina wî ya bi şiklê "*Xwendin û zanîn dermanê me ye.*"155 rengvedana vê yekê ye.

155 Cegerxwîn, "Hey Felek", Agir û Pirûsk, r. 121

156 Cegerxwîn, *Jînenîgarıya Min*, r. 225, 227

157 Cegerxwîn, "Serpêhatiya Ciwan û Dewlet", *Sewra Azadî,* r. 127

158 H.b. "Derwêş", r. 79

159 Cegerxwîn, "Seyda û Pîr Stalîn" Sewra Azadî, r. 87

Cegerxwîn ne hew di helbestan de xwendin û xwendegehan girîng dibîne, di jiyana xwe de jî pratîka vê yekê kiriye û di Nadiya Ciwankurd de ku di sala 1938'an de ders dane û xwendin nîşanî xortan daye.156

Belkî tu gotin mîna ku di helbesta xwe de gotiye têkiliya zanîn û îqtîdarê karekterîze nake: "*Navê mi dewlet zana û hişyar*"157 Di vê gotinê de herdu sifetên dewletê jî zanîn bixwe ne ku dewlet li ser ava dibe. Mîna ku mirov bibêje, "navê min dewlet e paşnavê min zana ye" hatine bikaranîn ku ew herdu qet ji hev qut nabin û bêyî hev nabin. "Hişyarî" jî weke ku di helbestê de jî hatiye bikaranîn di gelek helbestan de di wateya "zanabûn" ango "ji nezaniyê xelasbûn"ê de hatiye bikaranîn. Cegerxwîn di helbesteke xwe de têkiliya "em" û "dijmin" ku têkiliya serdestî û bindestiyê ye, bi xwedîbûna "zanîn"ê vedibêje.

"Cobarên zanînê tev gihane dijmin
Ê me yek cihok e ew jî yek dilop e" 158

Di vê malika jor de sedema bindestî ango bêîqtîdariyê weke ji zanînê bêparbûn dikare bê famkirin. Yanî "dijmin" ji ber ku xwedî "zanîn" e, xwedî îqtîdar e û ji me xurtir e. Em jî ji zanînê bêpar in lewre em qasî cihokekê û ji wê jî hew bi qasî dilopekê xwediyê zanînê ne û sedema bindestiya me jî ev yek e. Ev helbest peyva Foucault a jor tîne bîra mirov ku "zanîn" çawa bi îqtîdarê biencam dibe. Ev tê wê wateyê ku yê mûqtedîr be, çi dijmin çi ne dijmin, di heman demê de xwediyê zanînê ye jî. Qey ji ber wê ye ku Cegerxwîn, ji bo Stalîn jî gotiye, "*Seydayê zana, pîr Stalîn*".159 Stalîn hem 53

“seyda” ye hem “zana” ye hem jî “pîr” e ku hemû wesfên di derheqê zanînê de ne. Di gelek helbestan de dijmin hem “*zana û jîr*”[160] e kurd jî berovajî vê yekê nezan in.

[160] Cegerxwîn, “Hizam Zennar”, *Ronak,* r. 83

Di gelek helbestên Cegerxwîn de, xwendin, xwende, xwendegeh derbas dibin ku ev têgeh rasterast zanînê refere dike û zanîn jî îqtîdarê refere dike û zanîn ji bo bidestxistina îqtîdarê şert e. Di helbesta “Xwendegeh”ê de ku li ser girîngiya xwendegehê û têkiliya “zanîn”ê, bi “xwendin”, “mezinbûn”, “rutbe” û “dewlemendiyê” ye û dema qala xwe dike xwe weke çêliyê baz ku baz bixwe sembola îqtîdarê ye, xwendegehê jî weke hêlînê xwe dibîne. Ew hêlîn jî ji rêzika dawî xuya ye ji avahiyên din bilindtir e. Ev yek jî îqtîdarek e ku tecessum li mîmariyê kiriye:

“Xwendegah ez çê dizanim
Kaniya jîna min î
Çêliyê bazê çeleng im
Lê tu hêlîna min î
Ez biçûk im çê dizanim
Bê te kes nabî mezin
Wa li nik min pir şêrîn î
Rengê dayîna min î
Xwendin û zanîn û rutbe
Tev ji dîdara te ne
Ger çi ax û av û berdî
Qesreşêrîna min î 54

Serbilindî, dewlemendî gewher û neqşên te ne
Ger li gundî wer bilindî, Ameda dîna min î"
Cegerxwîn di helbesta xwe ya bi navê "Xwendin"ê[161] de têkiliya "xwendin"ê, bi "tac", "şewket"(mezinbûn), "dewlet", "dîn" û "dewlemendî"yê re bi awayekî daye ku evana ne bi xêra xwendinê ne, lê "xwendin" bixwe ne. Piştî wê jî hatiye diyarkirin ku yê nexwendî rêncber in ku bindest ango weke bêîqtîdar dikarin bên binavkirin yên xwende jî "serkar" û "rêber" in û weke kesên mûqtedîr dikarin bên famkirin. Her wiha cihê "serkar" û "serweran" jî "xan" û "seray" e ku ev mekan bixwe sembolên îqtîdarê ne:
[161] Cegerxwîn, "Xwendin", *Sewra Azadî,* r. 191
"Ev tac û şewket xwendin e
Ev dîn û dewlet xwendin e
Ev serbilindî xwendin e
Ev dewlemendî xwendin e"
Herçî nexwendî rencber e,
Ê ko bixwînî rêber e,
Her dem di nêv xan û sera,
Serkar e ew ya serwer e."
Di helbesteke din de jî *Şêx* tê dawetkirin ku li xwendegehê bixwîne. Hatiye diyarkirin ku bi xwendina li xwendegehê wê bibe "zana û rêber û ser û mîr û şeh. Yanî yê ku li xwendegehê dibe zana û rêber dibe ser û mîr û şeh ku ev hemû mûqtedîrbûn in û îqtîdarê refere dikin: 

“Şêxêm tu keremke were ev xwendegeh e
Ne bi toz û bi qerêj û paqij û bê sipeh e
Ev der û banê bilind bûne di nav bax û rezan
Tev ji bo ilm û edeb bûne sera û keleh e
Ew kesê bêt û bixwênî li vî bustanê ciwan
Dê bibî rêber û zana û ser û mîr û şeh e.” 162

162 H.b. “Şêxêm Ev Xwendegeh e”, r. 150

Di helbesteke din de jî piştî ku banga “jixewrabûn”ê hatiye kirin ku xew û koletî di heman kontekstê de hatine bikaranîn û rewşên bêîqtîdariyê ne, hatiye diyarkirin ku bi xwendinê dikarin ji bin destan der kevin ango bibin xwedî îqtîdar. “Xurtbûn” û “zanabûn” bi hev re hatine bikaranîn ku ew jî wesfên “dijmin” yanî desthilatdaran in:

“Mela banga sibê didî, dibê; ji xew rabin bes e
Ev bû hezar sal kole ne ta key di xew da bin bes e
Li ser we tim zor û setem, pingav û gol û ça û çem
Li ser we bûn sar û seqem, lê win şiyar nabin bese
...
Heta nebin xwenda û jîr
Bê rêber û bê destegîr
Bê dewlet û gêş û wezîr
Bindestê tirka bin bes e 56

Ev dijminê zana û xurt
Xwînxwar û devlok har û sirt
Her dem bi fort û pesn û zirt
Li ser me axa bin, bes e.” 163

163 Cegerxwîn, “Banga Sibê”, *Kî me Ez?,* r. 23

Cegerxwîn di helbesteke xwe de li ser naveroka xwendinê jî me agahdar dike û dixwaze ku “siyaset û tarîx û tore û rist” bên xwendin. Lewre ew dê bi xwendinê rêçika xwe bibînin û bibin wezîr, bervedêriya***** miletê xwe bikin û xurtemêr û zor û setemê ku îqtîdara dijmin e ji ser me rakin. Xwendina siyasetê bixwe jî jixwe weke hunera birêvebirina îqtîdarê dikare bê famkirin:

“Tu rêzan be carek siyaset bixwîn
Bi vê xwendinê rêçika xwe bibîn
Bide pêşiya me wekî pehlewan
Bi zanîn me derbas bike, xwendevan
Eger bûyî carek tu rêzan û jîr
Ji bo me dibî rojekê xweş wezîr
...
Ji bo me li her der bibe bervedêr
Di şeran de bibe xurtemêr 57

Siyaset û tarîx û tore û rist
Bixwîne bi hev re ciwan û dirist
Bibe jîr û zana di her çax û dem
Ji ser me rake çi zor û çi setem”

Cegerxwîn çawa ku zanînê ji bo serkeftin û bidestxistina îqtîdarê dibîne, rola zanînê jî dispêre pênûsê. Lewre pênûs navgîneke ji bo peydakirina zanînê. Di helbesteke xwe ku bangî pênûsa xwe dike de rola ku daye pênûsê ango zanînê wiha vedibêje:

Ji xameyê re gotî ey xame-tîj;
Li ser rûyê kaxez bi qêrîn û qîj.
Di fermanê rabe, tu çak û çeleng,
Li Kurdan biqore bi hawar û deng.
Divê ko tu kurdan ji xew rakî zû;
Ji ba min, ji wan tu bikî arezû.
...
Buhayê te erzan e, sê çar fireng,
Tu çêtir ji top û ji tang û tiving
... 58

Di xan û sera de tu şêrîn dibî;
Li sînga ciwanan tu şêrîn dibî." 164

164 Cegerxwîn, "Ji Xameya Min re", Agir û Pirûsk, r. 70,72
165 Cegerxwîn, "Dewlemendê Bê Şeref", *Sewra Azadî,* r. 185
166 Foucault, *"*Normun Toplumsal Yayılımı", *İktidarın Gözü,* r. 78

Di helbesta jor de hatiye diyarkirin ku ew xameya ku rola wê şiyarkirina milet e, ji top û tang û tifingan bi tesîrtir e û di dawiya helbestê de jî mekana vê xameyê ku wê tê de bêtir şêrîn bibe weke "xan û sera" hatiye diyarkirin ku "xan û sera" bixwe sembolên îqtîdarê ne. Yanî eger zanîn bikeve xan û serayan hêza îqtîdara wan xan û serayan dê zêdetir bibe.

Cegerxwîn di helbesteke xwe ku pereyên dewlemendan bi bêrûmetî sûcdar dike de, diyar dike ku eger ew pere ji bo zanînê bên xerckirin, dewlemend bi wan pereyan xwendegeh û nexweşxaneyan çê bikin, dewlemend ji vê bêşerefbûnê û bêrûmetiyê xelas dibin. Lewre girîngiya xwendinê ango zanînê hatiye kirpandin:

"Ev pere bê rûmet in, lê bûn bihayê destê kar
Destê cotkar û xebata zend û bendê karkera
Mekteba pê çê bikin, yan nexweşxanê mezin,
Yan kitêba çap bikin, "ehlen we sehlen" ser sera" 165

Di vê helbestê de *mekteb, nexweşxane û kitêb* her yek bi awayekî zanînê dinimînin û îfade dikin. Mekteb û kitêb jixwe rasterast zanînê refere dikin, nexweşxane jî elbet *navendeke hilberîna zanîna tibî û mekanîzmaya kontrolê ye ji bo îqtîdaran*.166

Di gelek helbestên Cegerxwîn de zanînê, teknîka askerî ya ku di xizmeta şerê li dijî îqtîdaran de ye dîsa bi xwendinê tê bidestxistin. "*Her kes bi xwendin bûn xwedanê* 

*tang û top*”[167] îfadeya vê yekê ye ku bi xêra xwendin û zanînê teknîka çêkirina amûrên şer pêk tê. Heman tişt ku zanîn di xizmeta teknîka şer de ye, çawa ku di gelek helbestan de heye di “ Fala Qereçiyê”[168] de jî heye. Di vê helbestê de top û balafir bi xwendin û avakirina dibistanan wê pêk bê û her wiha xwendevan bixwe jî weke amûrekê hatiye bikaranîn ku karê wî li pêşiya leşker xwendina merşan e:

167 Cegerxwîn, “Xewa Birçiyan Nayê”, Agir û Pirûsk r. 23
168 H.b. “Fala Qereçiyê”, r. 77
169 H.b. “Em Guhderz in”, r. 113
* Bervedêr: Parêzer, mûhamî

“ Ji bo kurd û Kurdistan;
Ava bikin dibistan.
Da bixwînin keç û kur;
Çêkin top û balafir.
Xwendewarên qenc û baş,
Li pêş leşker bikin marş.”

Heman tişt di helbesta “Em Guhderz in”[169] de jî heye ku vê carê bi xwendinê wê “otmatîk, mîtralyoz, top, tifing û balafir bên çêkirin:

“Xwendegeha em jî çêkin da bixwînin,
Herçî kurd in hûr û gir.
Da em çêkin otmatîk û mîtralyoz û,
Top û tiving, balafir.” 60

Di helbesta “Fîziya û Kareba”[170] de zanîna fîzya hem di pêwendiyeke şer de ye ku wê pê “sarûx”(fûze) û tang bên çêkirin, hem jî wê bibe “felat û pêşketina welat” ku herdu jî îqtîdara ku wê ava bibe refere dikin:
[170] Cegerxwîn, “Fîziya û Kareba”, *Zend-Avista*, r. 134
[171] Vali, *Kürdistan Cumhuriyeti*, r.113
[172] Cegerxwîn, “Şorişgerî”, *Ronak* r. 42
“Tu fîzya bixwîne hevalê çeleng
Xwe karke bi hev re ku em herne ceng
...
Bi xurtî digel dijminan şer bikin
Bi pijqîn û atom, bi tang û bi gêş
...
Bike hatina me bibî çarde qat
Hebûnek bi zanîn felata welat”
Di gelek helbestan de jî hêza zanînê û hêza zorê bi hev re refeqatê dikin da ku serkeftin pêk bê û îqtîdarek bê lidarxistin an jî zora dijmin here. Ev zor, hêzek leşkerî refere dikir ku ji bo avakirin û berdewamkirina îqtîdarekê di civateke weke ya kurdan de tiştekî heyatî bû. Abbas Valî ji bo rewşweke bi vî rengî ya Komara Kurdistanê girîngiya hêza leşkerî wiha rave dikir: “*Di van şertên ku têkiliyên hilberîneriya kapîtalîst tê de tunebûn, mekanîzmaya herî xurt ku dikir ku rayedarên Komarê hukum bikin û berdewam bikin hêza askerî bû.”*[171]
Hêza zorê carinan bi peyva şer û leşker, carinan bi xençer, carinan şûr û carinan jî bi top û tifengê û hinek peyvên din hatiye nimandin. Weke ku di helbesta xwe de jî gotiye, “şerkirin” tê wateya “hebûn û mirin”[172] e. Di helbestên Cegerxwîn de ev peyvên ku hêza leşkerî ango zorê û şer temsîl dikin û yên ku zanînê temsîl dikin di gelek 61

helbestan de bi hev re hatine bikaranîn. Bikaranîna têgeha "*biratiya şûr û qelemê*"[173] jî ji ber vê ferasetê ye ku di gelek helbestan bi peyvên cuda be jî heman tişt hatiye gotin. Li ser têkiliya zanîn û şer ango zorê gotina Deham Evdil Fetah vê ferasetê baş îfade dike: "*Armanca ku bi serê pênûsê neyêt pelandin, tu caran ew nakeve ber nîşana tivingê*. "[174]

173 Cegerxwîn, "Şêx û Axa û Beg Tu Car Nabin Yek", *Sewra Azadî*. r. 47

174 Deham Evdil Fetah, *Nêrîneke Rexneyî Li Helbestên Kurdî*, Dar ElKatîb El-erebî, Şam, 1992, r. 5

175 H.b. "Sitem Dimrî bi Hukmê Dem", r. 60

176 Cegerxwîn, "Welatperestî", *Ronak,* r. 70

177 Cegerxwîn, "Serxwebûn", *Zend Avista,* r. 25.

178 Cegerxwîn, "Dibistan", *Agir û Pirûsk,* r. 140

179 Cegerxwîn, "Naçin Şerê Qore", *Sewra Azadî,* r. 77

Elbet ev feraset, ji ber şertên sosyolojîk ku li jor Valî qal kiribû zaye. Dikare bê gotin ku gotina "*Heq bi zorê tê stendin*" ku di nav gel de tê gotin, paşxaneyekê pêk tîne ji bo vê ferasetê. Jixwe Cegerxwîn di helbestê de eşkere dibêje, "*Xwe rapêçe ji bo cengê bi zor heqê xwe bistîne."*[175] Her wiha dikare bê gotin ku di bikaranîna gotina "*Cenga azadî*"[176] de jî wateya, azadî bi cengê pêk tê, heye.

Cegerxwîn di helbesteke din de jî zanîn, zor û hunerê, ji bo avakirina îqtîdarekê şert dibîne ku dibêje: "*Dikarî bi zanîn û zor û hiner / Tu rista xwe deynî li her şûn û der*" [177]. Cegerxwîn, di helbesta xwe ya bi navê "Dibistan" [178]ê de xebata ku ji welat bê kirin bi du awayan dibîne; yek şûr yek jî qelem e ku yek zorê û yek jî zanînê temsîl dikin:

"Xebat bikin roj û şev Şûr û qelem digel hev.
Xortino herin dibistan, Bijî bijî Kurdistan"

Di helbesteke din de jî *top* û *qelem* bûne cot ango bûne ferê hev û hevdu temam kirine:

Top û qelem bûn cot
Bûne yek keç û xort
Bê navlêdan, bê fort
Tevan qoreqor e" [179]

Di helbesteke din de “xencer” û “qelem” bi hev re hatine bikaranîn û ji mêr û jinan hatiye xwestin ku şer bikin. Ev şer ne hew şerekî fîzîkî ye ji ber destek wê bi “xencer”ê şerê fîzîkî bike, destê din jî bi “qelem”ê şerê zanînê bike:

“Êrîş e êrîş, cotar û karker
Destên hev bigrin, xwenda û rencber
Mêr û jinên kurd, tev bibne leşker
Qelem bi destek, destek bi xencer” 180

180 H.b. “Destê İsmet Şikandin”, r. 78

181 H.b. “Ax Tehtebeş”, r. 195

Di vê helbesta jor de ku ji bo şerê li dijî îqtîdarê destek bi xencer yek bi qelem e, di helbesteke din de cihê xwe ji “hukmê xam û xencerê” 181 re dihêle. Di vê helbestê de piştî ku soz hatiye dayîn welat wê “bi xurtî serbest” bibe, di rêzika dawî de “xurtî” û jîndarî bi hukmê “xam û xencer”ê wê pêk bê. “Hukmê xam û xencerê” jixwe rasterast tê wateya “îqtîdara zanîn û zorê”:

“Welat xeyrî te min navê, meger dinya ku kewser bî,
Bi xurtî dê tu serbest bî ji min îdî tu bawer bî
...
Tifû jîna di bin destan meger Qarûn û Haman bî,
Divê xurtî û jîndarî bi *hukmê xam û xencer* bî” 63

Di helbesta “Ol û Daxwaza Min”[182] de piştî ku xew û xewarî, nebûna zanînê refere dike, dinya weke “bûk”ê hatiye nîşandan û ji bo bidestxistin ango îqtîdar avakirinê jî qelenê dinyayê(cihan) weke “xurtî” û “zanîn” hatiye diyarkirin.

182 Cegerxwîn, “Ol û Daxwaza Min”, *Zend-Avista,* r. 12,13

Ku çend sal e min ew kul û rence xwar
Dixwazim te rakim ji xew ey xewar
Çep û rast û hawîr binêre cihan
Hemî kes şiyar bû ji xew nagihan
Tenê man di xew de wekî dêw û dîn
Ji derdê we seyda ceger bûye xwîn
...
Bi rist û bi tektîk û zanîn û jîr
Werin şer, bi hev re bim halan û qîr
Cihan rengê bûk e, çi şêrîn jin e
Bizanin qelen, xurtî û xwendin e”

Çawa ku tê dîtin, “Xurtî û xwendin” di helbestên jor de hev temam dikin. Di gelek helbestan de ku “xurtî” weke hêza zorê ango leşkerî dikare bê famkirin, xurtî hêza bingehîn e û ji bo ku zora dijminan bibin, serbest bibin, ji bindestiyê xelas bibin û îqtîdara xwe ava bikin, tekane qewet e. Welat hew bi zorê dikare bê stendin, lewre 64

“*Welat bi zorê bixin dest*”[183] rengvedan vê yekê ye. Di vê çerçoweyê de, ji ber têkiliya Cegerxwîn ya bi Marksîzmê re, di gelek helbestan de “*leşkerê sor”*[184], *“lehiya sor*” [185] ku artêşa Ûris in destekeke xurt pêk tînin.

183 Cegerxwîn, “Zor û Çavsoriya Dijmin”, *Ronak*, r. 47
184 Cegerxwîn, “Ey Kurd Çi Kesî Tu”, *Sewra Azadî,* r.68
185 Cegerxwîn, “Lehiya Sor”, *Kî me Ez*, r. 152
186 Althusser, *İdeoloji*, r. 168-169
187 Cegerxwîn, “Ey Kurd Çi Kesî Tu*”, Sewra Azadî,* r. 68
188 Cegerxwîn, “Leşkerî”, *Zend-Avista*, r. 43

Althusser, dema qala têkiliyên îqtîdarî dike ji bo îdeolojiya dewletê ango îqtîdaran cudahiyekê dixe nav saziyên weke leşkerî, polîs û hepisxaneyê ku wan weke *amûrên çewsîner* û saziyên weke xwendegeh, sendîqa û dêran ku wan jî weke *amûrên îdeolojîk* bi nav dike.[186] Di helbesta Cegerxwîn de dikare bê gotin ku amûrên çewsîner yên îqtîdarî di gelek helbestan de ji yên îdeolojîk bêtir hatiye bikaranîn. Lewre rola zorê ango hêza leşkerî jî gelekî cihekî xurt zeft kiriye. Di helbesta “Ey Kurd Çi Kesî Tu”[187] de azadî û serbestî di heman demê de tê wateya avakirina îqtîdarê, bi “*kotek û zor*”ê ye lewre “*Artêşa Sor*” li pişta Kurdan e:

“Ey kurd tu bizane ko cihan her dem û dor e
Serbestî û azadî bizan kotek û zor e
Zencîrê ji gerden bişikin zû were meydan
Îdî tu metirs pişt û bira leşkerê sor e”

Di helbesta “Leşkerî”[188] de ku helbesteke dirêj e, hewcedarî û girîngiya leşkeriyê dûdirêj hatiye diyarkirin. Tê xwestin ku divê li serê çiya mirov bibin leşker ku şer bikin û dijmin ji welat derxin. Siwarbûna li tangê payedarî ye. Tê bibîrxistin ku dema welat di destê kurdan de bû ango kurd îqtîdar bûn, welatê wan weke bihuştê bû. Leşkerî ewqas hatiye pesindan ku di dawiya helbestê de qûdsiyeteke îlahî lê hatiye barkirin û leşkerî weke nimêjê hatiye dîtin: 

“Bibe leşkerê kurd here ser çiya
Li ber dijminê xo tu bigre riya
Bi pêş de herin em bi top û tiveng
Bikin em bi xurtî bi dijmin re ceng
Tu bişkêne dijmin li bajar û gund
Ji nû ve dibin payedar û bilind
...
Li tangê siwar be bibe payedar
Bi xurtî tu erîş bike ser neyar
Ji qada xwe derxe bibe Erdeşêr
Li Zagrosê Kardo bibe xurtemêr
...
Bira leşkerî tim nimêja te ye
Çilo paş de mayin qirêja te ye”

Cegerxwîn di helbesteke din de ewqas bi hêza leşkerî ango hêza zorê û şer bawer e ku, ew li hember “leşkerê Xwedê” jî daweta şer dike û bi şerê leşkerî zora “leşkerê Xwedê” dibe û sitêran ji bin hukmê wî der dixe û welatê wî ji hev perçe dike:

“Eger rast e ew jî xwedî leşker e
Here jê re bêje tu rabe şer e? 66

Bi êrîş gihane welatê te hov
Dixwazin welatê te bigrin mirov
Ji destê te bigrin sitêran bi zor
Bi sarûx û atom xwe hildane jor
Bere ew jî rabî bi top û tiving
Berê xwe bidî me bi halan û ceng
...
Welatê wî bigrin ji hev perçekin
Hevalên wî bigrin tenê dey nekin”[189]

189 Cegerxwîn, “Olperestî”, *Zend –Avista,* r. 103

Di vê helbestê hêz û qûdreta Xwedê bi awayekî leşkerî hatiye fikirîn û Xwedê jî xwedî leşker hatiye tesewûrkirin ku ji vir jî tê famkirin bê çiqas fikra hêza leşkerî bi awayekî xurt di helbestê de peyda bûye. Yanî eger Xwedê xurt be miheqeq leşkeriyeke wî ya xurt jî heye û eger em zora leşkerê Xwedê bibin em ê welatê wî bi dest bixin û îqtîdara wî têk diçe. Ev yek belkî weke alegoriya welatê Cegerxwîn ku ji aliyê dagirkeran ve hatiye dagirkirin jî dikare bê famkirin. Lewre di helbestan de ev yek pir eşkere ye ku welatê Cegerxwîn hatiye dagirkirin û ew welat bi têkbirina leşkerê dijmin dikare bê bidestxistin û îqtîdarek hew dikare bi vî awayî bê sazkirin. 67

## 3. Di Helbesta Cegerxwîn de Têkiliya Îqtîdarê û Mîmariyê

### 3.1. Têkiliya Îqtîdarê û Mîmariyê

Hewcedariya îqtîdaran ya ji bo sembolan, di mîmariyê de jî xwe nîşan dide. Avahî ku weke sembolên îqtîdarê tên dîtin, û weke tecesuma wan îqtîdaran tê şîrovekirin. Di dîrokê de, ji kevin de îqtîdaran li gorî xisûsiyet ango îdeolojiya xwe, avahî lêkirine û şikil dane mîmariyê. Mîchel Ragon di vê babetê de wiha digot: "Ji Sumeran heta Braslîayê, ji Babîlê heta New Yorkê hemû îdeolojiyên dewletan di şibhetê tuxle û keviran de cîsmanî bûne."[190] Lewre mîmarî ji têkiliyên îqtîdarî azad, nikare bê fikirîn. Vê têkiliyê, Emrah Tuncer wiha rave dike:

190 Kürşat Bumin, *Demokrasi Arayışında Kent,* Çizgi Kitabevi, Konya, 2010, r. 131

191 Tuncer, Emrah: "İdeoloji-İktidar ve Mimarlık: Roma Örneği", http://www.sehirplanlama.org/index.php?option=com_kunena&func=view&catid=153&id=682&Itemid=36 (wergirtina ji înternetê 11 Adara 2012an)

192 Bumin, h.b. r. 32

"Îdeolojî, îdeolojiya sinifên ku îqtîdarê di destê xwe de digirin bi awayekî veşartî vediguhêzin kesayetan. Merasim, şahî û civîn di mekanên ku xwedî şopên îqtîdarê ne de, pêk tên.Yanî mekan ew sahne ye ku veguhestina îdeolojîk lê pêk tê. Navgînek e ku hebûna îqtîdarê vediguhêze millet, îqtîdarê meşrû û siruştî dike. Ji ber vê yekê em nikarin mîmariyê weke warekî ji pêvajoya hilberandinên serdest azad û bêtesîr, bifikirin. Mîmar hay jê hebe jî hay jê nebe jî, mekan warekî îdeolojk e."[191]

Di Romaya kevin de jî avahiyên ku çîna jor û çîna jêr tê de diman ne weke hev bûn û avahiyên van çînan li gorî sinifên wan karekterîze bûbûn:

"Sinifa *Patrîcî* di serayên têra xwe germ, bi himam û daşir û dora wê bi parkan dorpêçkirî de dijiyan, lê gelê jar û feqîr li taxên ku tîfo û kolera jê kêm nedibû de, di çend hezar avahiyan de ku her avahiyek 200 kes tê de diman û ku sê-çar qatî bûn, bêav, bêdaşir dijiyan."[192] 

Thomas More jî ji bo ku pergaleke adîlane pêk bê li giravekê 54 bajar teheyûl kiribû ku her 54 bajar jî mîna hev bûn û hemû malên niştecihan jî yekoyeko weke hev bûn.[193] Yanî ji bo ku cudahiyên ji ber têkiliyên îqtîdarî yê nav mirovan bên tunekirin divê cudahiya navbera avahî ango mîmariya wan jî bihata tunekirin. Stalîn di vê çerçoweyê de wê bigota: “Heqê gel jî ji bo *stûnan* heye”[194]

193 H.b. r. 53
194 H.b. r. 127
195 Foucault, *İktidarın Gözü*, r. 88
196 Canetti, *Kitle ve İktidar*, r. 61

Foucault, têkiliya çêkirina avahiyên mezin yên mîna seray û dêran û îqtîdarê ku ev avahiyên mezin sembolên îqtîdarê ne, wiha rave dike:

“Berê karê avakirinê bi taybetî ji bo nîşandana îqtîdarê, Xweda û nîşandina qewetê dihat bikaranîn. Seray û dêr avahiyên mezin bûn, mekanên parastinê jî divê li van bên zêdekirin; nîşana hêzê dihat kirin, îqtîdar dihat nîşandan, Xweda dihat nîşandan. Mîmarî demeke dirêj bi van hewcedariyan bi pêş ket.”[195]

Di şer û êrîşên li hember îqtîdaran pêk dihatin de gelek caran hedef, hilweşandina avahiyên ku sembol bûn ji bo îqtîdarê, yanî hilweşandina mîmariyekê. Di dema Şoreşa Frensewî de jî mirovan girtibû ser Bastîlleê ku yek ji sembolên îqtîdarê bû. Elîas Canettî vê yekê wiha vediguhêze:

“Bûyera girîng roja Bastîlle’ê bû. Wê rojê hemû bajar, xwe bi çek kir. Serhildan li hember edaleta Kral bû; ev edalet di avahiya ku êrîş lê dibû û dihat dagirkirin de cîsmanî bûbû. Mehkûm serbest hatin berdan, bi vî awayî ew jî dikarîbûn beşdarî girseyê bibin. Fermandar û alîkarên wî ku ji parastina Bastîlle’ê berpirsiyar bûn, bi dîrekên şewqên kolanê ve hatin bi dar vekirin. Bastîlle hat rûxandin, kevir li ser kevir nema.”[196]

Tiştê ku li jor rûxiyaye ne hew edaleta wî ango bêedaletiya wî, îqtîdara wî bixwe bû ku di şibhetê Bastîlleê de cismanî bûbû. Louis Althusser jî dema qala serhildana 69

gundiyan ya dema Frenseyê dike dibêje dirûşmeya wan ev bû: “*Ji holikan re aramî, şer li hember şatoyan*”. 197

197 Louis Althusser, *İdeoloji ve Devletin İdeolojik Aygıtları*, wer. Alp Tümertekin, İthaki Yayınları, İstanbul, 2003, r. 31

198 Cegerxwîn, “Begim Dev ji Qullebaziyan Berdin”, *Sewra Azadî,* r. 67

**3.2. Di Helbesta Cegerxwîn de Rengvedana Têkiliyên Îqtîdarî di Warê Mîmariyê de**

Di helbesta Cegerxwîn de bi çend awayan rengvedana têkiliyên îqtîdarî di warê mîmarê de çê bûne. Malên gundî, cotkar û feqîran ku ji îqtîdarê bê par in bi şiklekî; malên dewlemend, axa ango serdestan bi şiklekî din hatiye teswîrkirin û xwedî xisûsiyetên cuda yên mîmariyê ne. Malên gundiyan teng, kûr, bê pencere û nexweş û her wiha dorhêla wan jî bi ahengiyeke mîna malên wan gemar, toz û tirabêlk in. Teswîrên xanî û avahiyên gundî û kesên qata jêr û teswîrên xanî û avahiyên qata jor ne weke hev in. Yanî avahiyên axayan û yên şivan û gundiyan xwedî xisûsiyetên cuda ne. Newekheviya avahiyên wan gotina *“Xanî weke koxik, perîşan û reben, çarereşê kurd / Hûn hemû bêgane, xwedî xan û eywanê bilind in”* 198 baş krîstalîze dike.

Di helbesteke xwe de ku teswîrên mîmariya malên gundiyan dike ku xanî, hem bi dorhêla xwe hem jî bi jiyana wan ahengekê pêk tîne ku teng, kûr û weke kuna rovî ne û jiyana wan û rewşa wan jî li gorî vê yekê ne. Lewre weke mîmariya ku hatiye teswîrkirin, jiyana wan jî bê ser û ber e:

“Xanî ji kerpîç pir teng û nexweş
Reş û bê ronî ji dixanê reş
Hin pez û dewar di nav çavên wan
Kufletên wan pir, ne pênc û ne şeş
Wek kuna rovî govik û şikeft
Rindan ji derdan bûne wek heneş
… 70

Kûr in weke koz tev gemar û toz
Jê tê bîhna pîs tev av û dûlop
Tev mêş û kelmêş pêşî û dûpişk
Kolîna sehê reş hêlîna mîqrop
Li gora bîrê teqan û çirav
Her der weke hev ne rêç û ne şop
…
Hawirdora gund tev gerş û gemar
Sergîn û tepik gihane ber dev
Jin keçên wan li guhera pez
Pişkul û rîxan he ro didin hev
Ba û bablîsok toz û tirabêlk
Li wan didêrin bi roj û bi şev
…
Cotkar û karker tev bê ser û ber
Birçî û reben hemî palevan
Camerd û camêr hemî weke şêr
Her şev li cem wan rêwî û mêvan
Ne xema wa ye çiqas birçî bin
Çiqas tazî bin hemî dilovan”[199]

199 Cegerxwîn, “Halê Gundiyan”, *Sewra Azadî*, r. 171, 172

Teswîra xaniyê cotyaran û alav û amûrên ku bi van xaniyan ve ango bi vê mîmariyê û têkiliya îqtîdarî ve têkildar in, rewşa cotyaran bi me dide nîşan:

“Xanîkî kûr teng, li dor çar dîwar,
Li ser wî pûş û li bin beşt û dar.
Sifirne û şirik bi kunc û eywan,
Bi kulek û refik hem bi mêrdewan.
Her çar dîwarên wî ji ax û av,
Mal û sermiyan zar û zêç di nav.
Kulav û balîf û doşek û mitêl
Beroş û mersef, hem teşt û hem sêl
Hestîf û maşik, tifik, xaçirgan,
Ber û zembîl û bivir û dûstan
Kevçî û kefgî, derxwîn û berfmal,
Heçî werîs, werqîl û çengal
Xaş û hendek û çewal, tûr û têr
Şûjin û derzî, cawbir û hem kêr” 200

200 H.b. “Xaniyê Cotyara”, r.102 72

Di helbesteke din de ku teswîra xaniyê kalekî dike, xanî reş, yanî bê pencere ye û bi zindanê hatiye şibandin. Ev şibandina xaniyê wî ya zindanê, rewşekê tîne bîra mirov ku xanî zindan, kalo jî mîna hêsîrekî ye.
“ Xanîkî reş tê de rûniştiye kalekî rîşîn
Çav şil kezeb û dil birîn
…
Kalo bi kul û derd e, xanî lê bûye zindan
Ku kezeba kûr e, lê ne wek welatê şêrîn”
Dema Cegerxwîn, behsa xaniyê xwe dike, ji bo biçûkbûn û rewşa xaniyê xwe van teswîran bi kar tîne:
“Xanîkî min heye weke çala bêjen
Dirêj û panî çar gaz* heye bi gazê necar
Li alîkî kûz û mirîşk û nivîn û firax in;
Li aliyê dinê agir û serşok û zarok û çend dar” 201
201 Cegerxwîn, “Heke Mezin Ranabin Em ê Hûr Rabi”, *Agir û Pirûsk*, r. 67
* Gaz, pîvanek e, li dora 70-75 cm ye. bnr. Zana Farqînî, *Frehenga Kurdî-Tirkî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê, İstanbul, 2005, r. 661
Di helbesteke xwe de, qala hêza pereyan û hêzê wê ya li ser mekanê dike ku pere, weke navendeke îqtîdarî dikare bê dîtin:
“Xaniyê ku tu tê hebî weke bihuşt,
Ê nebî tê de wekî koxê ker e” 202 73

202 H.b. "Ax Pere", r. 181
203 Cegerxwîn, "Riya Rast û Dirist, *Agir û Pirûsk*, r. 44
204 Cegerxwîm, "Çîroka Zoro Axa", *Hêvî*, r. 60
205 Cegerxwîn, "Rêncberê bi Rûmet", *Kî me Ez*, r. 173

Di helbesta "Riya Rast û Dirist"[203] de teswîra xaniyê axê hatiye kirin ku xaniyê wî weke îqtîdara wî bilind û mezin e û her wiha weke şikefta sêder e ku şikefta sêder ew şikeft e ku ketin derketina wê ne diyar e ku ev yek parastina îqtîdara wan dike:

"Xaniyê axê mezin her dem di ser gund re bilind
Lîs û hêlîna diza ye wek şikefta sêder e"

Di helbesta "Zoro Axa"[204] de qesra Zoro axa de qesir sor e û dorhêla qesrê ne weke xaniyê gundiyan bi sergo û toz û gemar e, lê bi bax û bexçe ye:

"Berê xwe da *qesra sor*
Bax û bexçe hawîr dor"

Di helbesteke xwe de qala xaniyê yekî dewlemend dike ku xanî sê tebeqe ye. Di vê helbestê de ji dêvla peyva dewlemend "xwedyê qesra sê tebeq" hatiye bikaranîn û di navbera dewlemendî ango mûqtedîrbûnê û qesra sêtebeqe de hemaniyek çê kiriye:

"Em têr nan û dew naxun
Dixebitin roj û şev
Xwedyê qesra sê tebeq
Çawan zêran didin hev?" 205 74

Di hin helbestan de, xwedî seray û kelehbûn hatiye kirpandin û di wateya, “ew temsîla me” ango “îqtîdara me ne” de, hatine bikaranîn: Gotina *“Bê sera û bê kelat / Em çi ne kurdino.”* [206] rengvedana vê yekê ye. Her wiha di gotina “*Bi jor ve wek bira herin, ber bi birc û sera herin*.” [207] de nêzikbûna li birc û serayê weke nêzikbûna îqtîdarekê hatiye dîtin. Di helbestê de birc, keleh, seray, qesir û avahiyên bilind weke sembolên îqtîdarê hatine bikaranîn.

206 H.b. “Herne Wa”, r. 133

207 H.b. “Em ji Nû Berjor Diçin”, r. 138

208 Cegerxwîn, “Mirov im Ez Ne Hov im”, *Şefaq,* r.157

209 H.b. “De Bigrî Li Ser Tac û Sera”, r. 63

210 H.b. “Ji Bin Destan Tu Derkev”, r. 18

211 Cegerxwîn, “Destê Îsmet Şikandin”, Sewra Azadî, r. 79

Seray, belkî di nav avahiyên ku îqtîdarê temsîl dikin de ya herî xurt e. Jixwe, Cegerxwîn, di helbestekê de, dema pesnê xwe dide digel têgehên siyasî ku mezinbûn ango îqtîdara xwe beyan dike de “qesra bilind” ku di mîmariyê de metaforeke xurtbûn û îqtîdariyê ye, refaqatê dike: “ *Weke qesrek bilind im ez ne xan im / Bi şahî wer tu rûnê şah û xan im*”[208].

Di gotinên “*De bigirî û binale ey şarê Amed ey xwînxwar / De bigirî li ser li ser tac û sera û textê Merwan*” [209] de seray, bi *tac* û *text* re hatine bikaranîn ku tac û text sembolên îqtîdarê ne. Di gotina “*Wellahî pir ecêb e hon vî malî dikin kom / Bê tac û bê sera ne, ji bo dijmin didin hev*” [210] seray, dîsa bi tacê re hatiye bikaranîn û di heman konteksta îqtîdarî ye. Di helbesta “Destê Îsmet Şikandin de” [211] welatê Rûsan ku li gorî Cegerxwîn cihê azadî û serbestiyê ye bi birc û kelehê hatiye şibandin:

“Li bakurê me, *birca* dilşadî
*Kelha* serbestî, gerden azadî
Heq tê stendin, dijmin heq nadî
Bi kêr me nayên qîr û feryadî…”

Di hinek helbestan de jî bêrîkirina demên ku li gor Cegerxwîn, kurd di wan deman de xwedî îqtîdarbûn, bi bêrîkirina avahiyên mîna seray, birc û qonaxan hatiye 

vegotin. Di gotina “*Ey felek, ka ew sera û / Birc û qûnaxê di min?*” [212] de bêrikirina birc û qonaxan, hatiye wateya bêrikirina îqtîdara berê. Ev bêrikirina îqtîdarê ku bi riya mîmariyê tê kirin, di helbesta “Welat Welat”[213] de jî bi heman şiklî ye:

[212] Cegerxwîn, “Ey Felek”, *Şefaq,* r. 79
[213] Cegerxwîn, “Welat Welat”, *Aşitî,* r. 14
[214] Cegerxwîn, “Xwendewarî”, *Zend- Avista,* r. 72
[215] Cegerxwîn, *Jînenîgariya Min*, r. 82
216 H.b. r. 83
[217] Cegerxwîn, “Berê Reş”, *Zend Avista,* r. 148

“Ka ew welat, ka ew çiya?
Ka ew gul û mêr û giya?
Ka dengê wan berx miya?
Ka ew *sera, birc û kelat*?”

Lêkirin û çêkirina serayan jî di heman demê de tê wateya avakirina îqtîdara welat ku rengvedana vê yekê jî di helbestên Cegerxwîn de heye. Di gotina “*Li her cî serayên bilind lê bikin”* [214] daxwaza avakirina welat bi riya mîmariyê hatiye kirin. Îroniyeke xurt e ku di Cegerxwîn de lihemberderketina îqtîdarê ya cara ewil, bi redkirina xebata avakirina qesra “mala keyxwe” çê bûye. Gundiyên Cegerxwîn, di lêkirina qesra axê de xebitîne lê Cegerxwîn qebûl nekiriye ku di avakirina qesra axê de bixebite.[215] Ne bi awayekî teorîk be jî dizanîbû ku redkirina avakirina wê avahiyê ango wê mîmariyê, redkirina îqtîdarekê ye. Lewre qesir sembolên îqtîdarê yên sîstema feodal in. Cegerxwîn, gund diterikîne û ji bo xwendinê bi rê dikeve.[216] Îroniyeke din jî ew e ku piştî li hember derketina qesrê, Cegerxwîn ji bo xwendinê ji gund der dikeve. Ev derketina Cegerxwîn, rêwîtiya wî ya ber bi xwendinê ango zanînê ye ku zanîn bixwe jî di helbesta Cegerxwîn de gelekî têkildarî îqtîdarê ye û îqtîdarê refere dike.

Di helbesta “Berê Reş”[217] bang li yê hecî dike pereyên xwe li avakirina birc û qûnax û xanên bilind xerc bike lewre avakirina wan avakirina welêt e ku ew jî tê wateya avakirina îqtîdarekê. 

“Bi ya min bike, ka were ey hecî
Perê xwe tu xercke li vî war û cî
Bike *qesr û qûnax û xanên bilind*
Veke xwendegehan li bajar û gund”

Çawa ku avakirina van avahiyên weke sembolên îqtîdarê tê wateya avakirina îqtîdarê, carinan parastina van avahiyan jî dikare bê wateya parastina welatekî ango îqtîdara wî welatî:

“Tev birc û kelat
Tev bajar û gund
Tev zinar û lat
Ji destê dijmin:
Dijminê xwînxar
Xurt û koledar
Ji rom, ji fireng
Di rojên pir teng
Bi kuştin û ceng
Parast, parast
Parast min ev rojhilat” 218

218 Cegerxwîn, “Kî me Ez”, *Kî me Ez?,* r. 13

Di vê helbesta jor de parastina rojhilat ku rojhilat, welat e, bi parastina lat, zinar, bajar, gund û *birc û kelat*an çê bûye û parastina birc û kelatan hatiye wateya parastina welat jî. Di helbesteke din de jî şêx, bi xwedî derneketin ango neparastina seray û medreseyan hatiye sûcdarkirin ku seray, îqtîdarek siyasî; medrese jî îqtîdareke dînî 77

refere dikin: “*Şêxê min destê te maçî nakim ez bes e / Kavil û wêran te hiştin ev sera û medrese.*” Di helbesteke din de jî dîsa têkildarî têgeha parastinê û îqtîdarê, ji axa, beg û melaya gazinan dike ku li derveyî birc û xan û serayan ango îqtîdarê mane:

“Kurmanc hemî axa û beg û mela ne
Hîkmet ev e ku her dem ko belengaz û geda ne
…
Her yek bi hezar rengî dixwin vî miletê dîl
Lê ew bi xwe *der bircên belek, xan û sera ne*” [219]

[219] Cegerxwîn, “Ji Ber Derdê Ewan”, *Agir û Pirûsk,* r. 19

Çawa ku li jor neparastina van avahiyan, ne parastina welat ango îqtîdara welat e, jidestçûn û dagirkirina wan ya ji hêla “dijmin”an jî dagirkirina welat e. Di helbesta jêr de, birc, eywan, seray û xan li xwediyê xwe bûne zindan, ji ber dagirkirina welêt. Lewre ji ber ku welat hatiye dagirkirin ew jî ji dest çûne û lewre îqtîdara welat jî ji dest çûye:

“Sermest kirim ez wî dengê şewat
Li ber min reş bûn ev zinar û lat
Ev şar û ev gund, ev *birc û eywan*
Ev *sera û xan*, tev bûne zindan
Li me bû dojeh, ev bax û bûstan
Dijmin, dijmin …
Dijmin kete Kurdistan
… 78

Çend sal li ser hev ez mam dilbirîn
Can û ceger tev li min bûn bi xwîn
Gazî û hawar, qêrîn û nalîn
Ji dengê: -Nesrîn, Stêr û Şêrîn
Ker bûn bi carek tev *xan û eywan*
Dijmin, dijmin …
Dijmin kete Kurdistan
…
Ser pêl û rû reş, şikestî gerdan
Li wan bû girî, ew şadî û ken
*Sera û eywan*, li wan bûn zindan
Her bijî Irak, bijî Kurdistan" 220

220 Cegerxwîn, "Zencîr Ji Gerdenim Şikest", Kî me Ez, r. 91
221 H.b. "Ka Welat û Al û Ol", r. 57

Di gelek helbestan de hilweşîn an rûxîna îqtîdara welat, bi rûxîn û hilweşîna van avahiyên ku weke sembol hatine bikaranîn hatiye vegotin. Di helbesta "Ka Welat û Al û Ol"[221] de jî qala welatekî têkçûyî, îqtîdara xwe wenda kirî dike ku hilweşîna birc û eywanan perçeyek ji vê têkçûn ango bêîqtîdariyê ye:

"Ey felek kanî li kû man ew welat û al û ol
Çavbelek kanî li ku man bûne xanim tog û tol
…
Koç û koçer tev nemane, *birc û heywan* hilweşîn
Ax li zozanê rengîn, ka li ku ne kon û hol 79

…
Kanî Kerman, kanî Kerkûk, kanî Wan û Erzerûm
Ka Kelîs û ka Melatya, tev de bûne xak û xol”
Di helbesteke din de jî hilweşîna îqtîdara welatekî ku ew welat ê Cegerxwîn e, bi hilweşîna birc, eywan û serayan hatiye vegotin:
Firqeta wî mal û milkê dil bi talan tev revand,
Her wekî rad û birûskê ew li kê ket, rahejand,
Xanûman tev kirne wêran, leşkerê eşqê şikand,
Rengê Eskender li Dara dewleta min wergerand,
Kirne wêran birc û eywan ew sera û şaneşîn” 222
222 Cegerxwîn, “Şîna Şêx Kemal”, *Agir û Pirûsk,* r. 157
Çawa ku di mînakên jor de wêranbûn û ji destçûna avahiyên ku weke sembolên îqtîdarê dikarin bê dîtin, tê wateya jidestçûna îqtîdarê, carinan jî bidestxistina wan bidestxistina îqtîdarê ye. Di helbestekê de xaniyê dewlemend heft tebeqe ye ku bi destê karkeran hatiye lêkirin. Xuya ye, ev xanî alegoriya welat e, lewre banga yekitiyê tê kirin ku welat bê rizgarkirin. Cegerxwîn ji karkeran re dibêje eger hûn serî hildin ango şer bikin wê ev xanî bibe yê we:
“Xelas kirin ew xanî
Heftqatî bû avanî”
… 

Ev xaniyê wek sera
Ava kirin bi pera
…
Qesra çêkim, bê cî bim
Pera bênim, birçî bim
…
Karker ku dest hilênin
Ev xan ji war dimênin
…
Ey karkerên tev cihan
Sivik desatan bidin hev
…
Dijmin derxin ji welat
Lê bibarin ar û pêt
…
Ji bo bibî yek welat
Daxwaz ev e ji felat” 223

223 Cegerxwîn, “Ho Karker, Bibin Yek”, *Ronak,* r. 130

Mîmariyeke din bi awayekî veşartî heye ku Cegerxwîn bi her heşt dîwanan ava kiriye û ew mîmariya nivîsê bixwe ye û bi peyvan ava bûye. Dîwarên vê mîmariyê bi peyvên hişk û wateyên ferhengî yên peyvan ava bûne ku mîna keviran hişk û rast û lewre rasterast in. Dikare bê gotin ku Cegerxwîn bêyî ku haya wî jê hebe mîmariyeke bi vî rengî ava kiriye. Enîs Batûr, “Fikirîna metnê ya bêyî dîwar zor e: Weke avahiyan, 81

berhem jî bi dîwarên xwe li ser piyan disekinin û sekinîne."[224] dibêje. Cegerxwîn jî dîwarên ku helbesta wî li ser piyan bihêle, bi xerca neteweperweriyê lê kireye ku ew dîwar jê re bûne bend û ew parastiye. Lê belkî bi qasî ku ew parastiye ewqas jî fetisandiye. Ew fetisandin dîwarên mecazî yên Konstantinos Kavafîs tîne bîra me:

224 Enis Batur, "Duvar", *Kuram*, Kitap 7, Ocak 1995, r. 72

225 Konstantinos Kavafis, *Bütün Şiirleri, Duvarlar*, wer. Herkül Millas, Özdemir İnce, Varlık Yayınları İstanbul, 2005, r. 102

"Bê fikir, bê merhemet, bê fedî
Dîwarên bilind û gewre li dora min lê kirin
Û niha ji her hêviyî bê par mame
Ev qeder mejiyê min dikoje, ji serê der nayê
Lê ewqas tişt hebûn li derve ji bo kirinê
Min berî lêkirinê ferq nekir ev dîwar
Lê dengê hostê dîwaran ne dengekî din
Li derveyî dinyayê hiştim bêyî hayê min"[225]

**4. Di Helbesta Cegerxwîn de Têkiliya Îqtîdarê û Dînitiyê**

**4.1. Têkiliya Dînitî û Îqtîdarê**

Dînitî, yek ji wan hêmanan e ku di têkiliyên siyasî ango îqtîdarî de ji bo berterefkirina kes an fikrên mixalif, ji aliyê îqtîdaran ve ji bo bêstatukirin, jiqewetxistin, biçûkxistin û di dawiya van de ji bo bêtesîrkirinê hatiye bikaranîn. Di dîrokê de, ji bo kesên ku doza azadiyê kirine, li hember îqtîdaran şer kirine, ji xeynî pênaseya wan a mixalifbûnê, pênaseyeke din jî hevalbendiya wan kiriye ku ew jî, "dînitî" ye. 82

Foucault jî dema behsa têkiliya dînitî û îqtîdarê dike dibêje ku îqtîdar, ji alîkî de mixalifan bi dînitiyê sûcdar weke ji alikî din jî vî "sûcê sîyasî" dixe nav kategoriyên "sûcê adî".[226] Foucault di berhema xwe ya "Tarîxa Dînitiyê"[227] de jî ravekirina ku bê çawa dînitî ji aliyê îqtîdaran ve weke stratejiyekê hatiye bikaranîn dike.

[226] H.b. "XIX. Yüzyıl Adli Psikiyatrisinde "Tehlikeli Kişi" Nosyonun Evrimi", r. 201

[227] Michel Foucault, bnr. *Deliliğin Tarihi*, wer. Mehmet Ali Kılıçbay, İmge Kitabevi, Ankara, 1995

[228] Foucault, "Kapatılma, psikiyatri, hapishane", *İktidarın Gözü,* r. 118

***** Rûmî 1323, mîladî 1907 e. (Nota Ahmet Ramîz)

Di dîroka siyasî û fikrî ya dinyayê de bûyerên ku mixalif ji aliyê îqtîdaran ve weke "dîn" hatine binavkirin û bi mebesta berxwedanên li hember îqtîdaran bên pûçkirin, gelekî rû dane. Nexasim di îqtîdarên despotîk de yek ji stratejiyên bingehîn e ku mixalifên îqtîdarê bi dînitî tên sûcdarkirin û binavkirin. J.P. Faye jî di derheqê mînakeke ku li pêvajoya despotîzma Rûsyayê de hatiye jiyîn wiha dibêje:

"Piştî ku Krûşçev vekirina kampan teleb kir, di danezana xwe ya 1958an da, bi rastî jî hem ên ku mixalif bûn hem jî ên ku cuda difikirîn weke dîn qebûl dikir. Lê hîn di serdema Nîcolasê I. de bûyerek qewimîbû ku emareya vê pêvajoyê dabû: Dostê Pûşkîn Çaadaev, "dijminê şoreşan", "cendermeyê Ewrûpa", piştî ku çar rexneya wî xwendibû, ew di mala xwe de mehkûmî tedaviya psîkyatrîstekî kiribû."[228]

Bedîuzzeman (Seîdê Kurdî, 1960) jî yek ji wan kesan e ku di têkoşîna ji bo azadîxwaziya kurdan de ji aliyê îqtîdarê ve bi "dînitî"yê hatiye sûcdarkirin. Lewre sûcdarkirina bi dînitiyê di heman demê de xwestina bêîqtîdarkirinê ye. Bedîuzzeman li hember xwesteka vekirina ûnîversîteyekê ango xwesteka "zanîn"ê ku îqtîdar li ser zanînê ava dibe, ji aliyê îqtîdarê ve weke "dîn" hatibû binavkirin û ew avêtibûn timarxaneyê. Ji kesên ku ew ranedigirtin jî ev, sîleheke xurt bû. Kurdîzade Ahmet Ramîz jî ev rewş wiha tanî ziman:

"Sala 323*yan bû ku xebera mirovek ji yê xwedî zîrekiyeke atêşpareyî bi navê Seîdê Kurdî ku ji pişta çiyayên Kurdistanê yên berz, bilind û asê dihat û tevî van cil û bergên kurd û di bin şal û şapik de, di asoyê Stenbolê de, li dermedorê olan dabû û hin mirovên tebîetbimereq, her ku newaze maderzayî didîtin, ji sexitiya gencîneyên bêdawî yên cîderka afirandinê dihesidîn: piraniya wan xesîsên zexel û gelac, heyfa hisên xwe yên zelîlbûyî li gotineke biheqeret bar dikirin: Dîn e!"[229] 

229 Bedîuzzeman Seîdê Norsî, *Dîwana Herba Urfî, wer*. Merdan Newayî, Zehra Yayıncılık, İstanbul, 2009, r. 9
230 H.b. r. 14
231 Norsî, *Dîwana Herba Urfî*, r.25
232 Bumin, Kürşat, h.b. r. 68
233 Foucault, "Filozofun Cevapları", *İktidarın Gözü,* r. 68

Lê xuyaye ku vê mekanîzmaya îqtîdarî ew bi dînitîyê, bêîqtîdar nekiriye û dînitiya ku aresteyî wî kirine tesîr lê nekiriye û wî "dînitî" li hember îqtîdarê bi xweşhalî pêşwazî kiriye: *"Ev hikûmeta heydûd, di dema îstîbdadê de xisûmeta aqil dikir, vêga jî bi jiyanê re neyartî dike. Eger hikûmat wiha be, her bijî dînitî!..."*[230]

Di gotina "*her biji dînitî*" de zanîna berdêlekê heye ku ew jî "azadî" ye. Ji ber ku wî pênaseya dînitiyê, weke gelek kesên berxwedêr, weke berdêl dîtiye: "*…min aqilê xwe feda kir, hurriyeta xwe terk nekir…*" [231]

Dikare bê gotin ku cihê îqtîdar ango têkiliyên îqtîdarî lê hebin wê dînitîyeke bi vî rengî jî hebe. Li ser "komûnote"yan ku fikra "wekhevî" ango "wekhevkirin"a mirovan di wan de heye û ji xeyalên bi vî rengî yên mirovan zayine Robert Owen jî yek ji van utopîstan e ku digere û konferansan dide:

"Owen, di Tebaxa 1838an de, di yek ji konferansên xwe yên bêhejmar de xebera dinya nû dida. Di dawiya konferansê de plana komûnoteyê nîşanî wan dide. Ji salonê pirs: "Ka timarxane?" Bersiv: "Wê dînê me tune bin, wê her kes jîr û biaqil mezin bibe." Pirseke din: "Wê gur di şibhetê miyan de nekevin hundur?" Mr. Owen: " Gur wê tune bin." [232]

Di vê utopyaya jor de, Owen teheyûl dike ku wê "dîn" tune bin, ji ber ku wê mixalefet û îqtîdareke ku mirovan weke "dîn" bi nav bike tune be. Piştî komûna 1870yî ya Parîsê jî piraniya mixalifan, bi dînitiyê hatibûn sûcdarkirin.[233] 

## 4.2. Di Helbesta Cegerxwîn de Rengvedana Têkiliyên Îqtîdarî di Çerçoweya Têkiliya Îqtîdar û Dînitiyê de

Di helbesta Cegerxwîn de, ji hin aliyan de rengvedanên têgeha dînitiyê hene ku; sûcdarbûna bi dînitiyê û sûcdarkirina bi dînitê aliyê xurt yê vê yekê pêk tînin. Cegerxwîn di helbestên xwe de hem bi "dînitî"yê hatiye sûcdarkirin hem weke stratejiyekê wî yên hember xwe, sûcdar kiriye. Şopên herdu awayan jî di helbestê de hene lê bêtir ku wî sûcdarkirina bi dînitiyê weke stratejiyekî bi kar aniye, di helbestan de derbas dibe.

Di jînenîgariya xwe de Cegerxwîn behs dike ku dema rojekê li dikana Mele Hesen helbesta "Em Guhderz in" dixwîne, yek ji nav guhdaran tê cem wî axînekê dikşîne û dibêje: "Tiya, heyfa kurê bavan ku wilo dihn dibin!"[234] Lê, Cegerxwîn li ser wî difikire û dibêje:s

[234] Cegerxwîn, Jînenîgarî r.191

[235] H.b. r. 191

[236] Erasmus, Deliliğe Övgü, wer. Nusret Hızır, Kabalcı Yayınevi, İstanbul, 2000, r. 29

[237] Bediüzzeman Said Nursi, *İçtimai Dersler*, Zehra Yayıncılık, İstanbul, 2004, r. 153 http://www.nuralemi.com/sayfalar.php?id=36&mode=b&sayfaNo=153

"Nizanîbû ku dixwazim wî û ên weke wî ji vê rêçika xwar û çewt vegerênim ser rêka rast û ronî. Nizanî ko dixwazim wî û bi milyonan weke wî, ji bin darê zor û setemê derxim û ji pêlên xwîn, şer, berberî, dubendî, talan, şewatê; bi şewitandina laşê xwe, bi *dînitiya* xwe derxim."[235]

Ji vê mînakê jî xuyaye ku dînitî çawa Bedîuzzeman de, berdêla azadiya wî bû, di Cegerxwîn de jî berdêla azadkirina bi milyonan e, di şerê *zor û setemê* ango îqtîdarê de. Dikare bê gotin ku dînitî li jor xwediyê wateyeke pozîtîf e. Ev yek berhema Erasmûs ya navdar "Pesnê Dînitiyê" tîne bîrê ku di wir de jî xwedî wateyeke pozîtîf e. Lewre Erasmûs dînitiyê di wateya "şareza" de bi kar tîne.[236] Abdûllah Cewded (1932) jî konteksteke vê wateya pozîtîf de di helbesteke xwe de, "*Ronahiyeke xurt rêberê dînitiya min e /Armancek bendewarê dînitiya min e."*[237] (*Benim cünunuma rehber ziya-yı ulviyet / Benim cünunumu bekler azim bir niyet)* dibêje. 85

Cegerxwîn jî ji ber ku ne weke civaka ku tê de de ye, ne weke wan difikire, ne weke wan tev digere, ji ber nirxên serdest yên civakê, tim bi dînitîyê hatiye sûcdarkirin. Sûcdarbûna wî hem ji ber îqtîdarên lokal ku mela û şêx in û îqtîdara dînî temsîl dikin û hem jî axa û dewlemend in ku ji bingeheke arîstokrat tên. Ev navendên îqtîdarî tesîrê li gel jî dikin û bi vî awayî mejiyê gel jî ji aliyê van îqtîdaran ve tê şikilandin û ew jî dibin perçeyeke ji van sûcdarkirinan. Nûreddîn Zaza di bîranînên xwe de qala mesela dînitiya Cegerxwîn bi vî awayî dike ku bi me dide eşkerekirin ku îqtîdarên lokal yên teokratîk û arîstokratîk çawa xwestine wî bi dînitiyê sûcdar bikin:
"Gundiyên Kurd, dema didîtin ku ew qala pesindayîna rabirdû, dahatûya ronîdar (bi şertê yekitî û şerkirinê) ya gelê kurd dike û xwe li ber îroyê dixe, bi çavê dînê ku ji timarxaneyê reviyaye lê dinêrîn. Ma çend caran ez nebûm şahid ku serê xwe dihejandin û digotin, "Çi heyf û xerab e ku xortekî mîna vî dîn bûye. Ew ji bo Şêxên kevneperest û feodalan xetereyek bû ku divê ji holê bê rakirin."[238]

[238] Nureddin Zaza, *Bir Kürt Olarak Yaşamım*, Huddinge, Sweden, Mezopatamya Publishing, wer. Aytekin Karaçoban, 1994, r. 125,126

[239] Cegerxwin, "Sergerdan im Ez" *Hêvî*, r. 99

[240] Cegerxwîn, "Nexoş im", *Hêvî*, r. 15

Di şerê Cegerxwîn yê li dijî îqtîdarên de çi lokal (axa, dewlemend) çi makro (sîstema dîn, sîstema dagirker) de, Cegerxwîn bi van sûcdariyan re rû bi rû maye û bi helbesta xwe ku bersiv daye vê yekê û mecbûr maye ku di gelek helbestan de bibêje "ez ne dîn im" û ketiye pozîsyoneke xweparastinê. Gotinên *"Ez Ceger-xwîn im, ne dîn im, dîn riya ez tê de me / Markîsî me, kurdperest im, her di nav madê me ez"* [239] "nedînbûn"a xwe bi xwedî hişmendiyeke jixwebawer dibersivîne.
Di gelek helbestên Cegerxwîn de ku helbesta wî têkoşîn e li hember îqtîdaran, şopên bersivdayîna sûcdarkirina bi dînitiyê dikarin bên dîtin. Di helbesteke xwe de, li ser têkiliya ristên xwe ku, ew rist bixwe derb in li dagirker û îqtidaran, û dînitiyê wiha dibêje: *"Ne dîn im ko evan ristan dihonim / Cegerxwîn im ne serxwoş im: li hoş im"* [240] Yanî dixwaze bibêje ku ez li ser hişê xwe me û ez ne dîn im û haya min jê heye ku ji ber ristên min ji min re *dîn* tê gotin. Lewre ew zane ku sûcdarbûna wî ji ber wê ye ku ew li dijî îqtîdaran şer dike. Ev helbesta wî jî, vê yekê piştrast dike ku nexwestina îqtîdaran sûcdarkirina bi dînitiyê bi xwe re tîne: 

"Ez ne tirk im, ne ecem
Ne zor divêm ne setem
Ez ne dîn im û ne gêj im
Divêm gavan bavêjim" 241

241 Cegerxwîn, "Kurdo Serê Xwe Rake", *Aşitî,* r. 29
242 Cegerxwîn, "Ji Elî Ewnî re", *Agir û Pirûsk,* r. 159

Di helbesta jor de piştî ku dibêje ez îqtîdara *tirkan û eceman* naxwazim dîsa gotiye ku ew ne dîn e. Di helbesteke din de jî behsa, liserçiyabûnê dike û diyar dike ku ev yek ne dînitî ye. Lewre dikare bê gotin ku çiya, mekanên muqawemeta îqtîdaran e ji bo kurdan:

"Çendek ji wan me dîne gelek caran dibêjin,
Werin destê me bigrin, xwîna xwe tev birêjin,
Em tim li ser çiya ne, lê ne dîn û ne gêj in" 242

Taybetiyek di helbestên mîna yên jor de heye ku sûcdarbûna bi dînitiyê û şerkirina li hember îqtîdarê tê heman wateyê. Mirov dibêje qey ji bo ku şer li dijî îqtîdarê bê kirin divê mirov dîn be. Vê derûniyê xuya ye tesîr li Cegerxwîn kiriye. Gelek caran tiştekî zor dayê ku şerê xwe yê li hember îqtîdarê û nedînbûna xwe bi hev re bibêje. Yanî ji bo ku bibêje "Ez ne tirk im, ne ecem" jî dibêje ez ne dîn im.

Di helbesteke Cegerxwîn de ku di wê helbestê de têkiliya "zanîn"ê bi "dînitî"yê re hatiye danîn, bersivek heye ku heçku bersiva îqtîdarê ye ku wê îqtîdarê Cegerxwîn bi binavkirin û sûcdarkirina dînitiyê, xwestiye têkiliya wî û zanînê ji hev qut bike. Lewre Cegerxwîn weke bersivekê, pêşî gotiye ku zana ye piştre gotiye ku ne dîn e: 87

“ Ez hertiştî dizanim
Ez ne dîn û ne gêj im
Ez xêra we dixwazim
Ji hirçan re çi bêjim” 243

243 H.b. “Ji Hirçan re Çi Bêjim”, r. 34
244 Cegerxwîn, “Cejn û Sersal e”, *Hêvî*, r. 85
245 H.b. “Dilê Xem Tu Pir Meşkîne”, r. 129

Di helbesta “Cejn û Sersal e” 244 de bersivê dide “Felek”ê ku sûcdariya “dînitiyê bi sûcdariya “Gawirbûn”ê re hatiye bikaranîn:

Ey felek mala te nava bo çi sergerdan kirim
Rengê findê dil disojim, tev de pêt û agir im
Min digo: Belkî bibênim, lê te ez winda kirim
Rast e ez bê dost û yar im, lê ne dîn û gawir im
Lê çi bêjim ez ji wê re, dil daxwaza min nehat”

Cegerxwîn di helbesteke xwe ya din de sedema rewşa xwe ne “dînitî” lê weke “perîşanî” bi nav kiriye ku perîşanî encama bêîqtîdarbûnekê refere dike:

“Birîndar im, ceger-xwîn im
Perîşan im, neko dîn im
Me rê berdaye sergerdan
Li çola mam li nav mava” 245

Cegerxwîn jî ji bo îqtîdara ku ew bi dînitiyê sûcdar kiriye heman sîleh, “dînitî” bi kar aniye. Ev yek jî di helbesta wî de eşkere tê dîtin. Di van helbestan de Cegerxwîn xurt û hêzdar xuya dike lewre dikare “ên din” bi dînitiyê bi nav bike. Di helbesta xwe ya jêr de dijmin, bi nezanî, hovitî hatiye sûcdarkirin:

“Welat, binêr xwîna me xweş
Li ser te va rijî
Dijmin nezan hov û dîn
Bi gotina dev napijî” 246

246 Cegerxwîn, “Axînek”, *Aşitî,* r. 36

247 Cegerxwîn, “Guh Bidêr”, *Hêvî*, r. 11

Cegerxwîn di helbesta xwe de sûcdarkirinê ne ji bo dijminan tenê dike ji bo gel jî dike ku gel jî gelek caran Cegerxwîn weke dîn îlan kiribû. Di vê helbesta jêr de, sûcdariyê, bi riya nezanî, harî û dînitiyê dike:

“Nexwendî mane, har û dîn
Ma guh didin wijdan û dîn
Çûne stêran rast û çep
Kurd ta niha jî xwînmij e” 247

Dîsa Cegerxwîn di helbesteke xwe de, piştî ku îqtîdara edebî ya “Xanî” îlan dike wî jî dike “Cegerxwîn” û lewre ew jî bi qasî Xanî dibe xwedî îqtîdar, û mirovên nezan “dîn” îlan dike:

“Şehsiwarê meydana torevan î
Nêçirvanê zozanê ristevan î 89

Serdarê ristevan û pehlewan î
Rêberê Kurdistan Seydayê Xanî
Ji derdê vî milletê nezan û dîn
Ne tenê tu em tev bûne Cegerxwîn"[248]

248 Cegerxwîn, "Seydayê Xanî", *Aşitî,* r.25

249 Cegerxwîn, "Dînname", *Şefaq,* r. 139

Cegerxwîn di helbesta xwe ya ku navê wê jî gelek tiştan vedibeje "Dînname"[249]yê de, hem bi dînitiyê, sûcdarkirina mirovan heye û hem jî diyar dike ku sedemê dînbûna wî jî dînitiya wan mirovan e. Lewre di vê helbesta weke xulaseyekê xuya dike de, du awayên sûcdariyan jî peyda dibin:

"Hemî dîn û hejar û hov û ehmeq
Wekî Simsim çi simtûj û çi guhleq
…
Ne em tenha, hemî kes bêhiş û dîn
Ji ber wê ye ku ez bûme Cegerxwîn"

Her wiha dînitiyeke ji bilî van kontektsan jî heye ku ew jî li hember îqtîdara jinê ye û ew jî weke têkiliyeke îqtîdarî dikare bê dîtin. Di helbestên Cegerxwîn de, di têkiliya wî û yarê de pêwendiyên îqtîdarî rû didin ku li hember îqtîdara yarê ango qîzê "dîniti"yekê derdixîne holê. Di van helbestan de "dînitî" wateyeke bêîqtîdarî di xwe de dihewîne ku ev yek ji ber îqtîdara yarê ye. Ev îqtîdara wê jî bi piranî ji ber xweşikbûna 90

wê ye. Di gelek helbestan de dikare ev xisûsiyet bên dîtin: *"Canê bi ciwanî ceger im tev kir xwîn / Cegerxwîn ne dîn e, lê wê ez kirim dîn"* 250 yek ji van mînakan e.

250 Cegerxwîn, "Diyariya Yarê", *Aşitî* r. 103
251 Cegerxwîn, "Şeva Qedrê", *Agir û Pirûsk*, r. 217
252 Cegerxwîn, "Ketme Nêv Derya Evîn", *Aşitî*, r. 119

Di helbesteke xwe de ew, bi qasî Rustem xwedî îqtîdar e, lê xweşikbûna yarê wî bêîqtîdar dike, lewre dîn dike:

"Şeva qedrê li min rewşen dikir şewq û şemala keç,
Xanî dibû gulşen bi wê hisn û cemala keç
Berî dînê çi Rustem bûm, dînê dîn kirim dîlber,
Vejandim ez fîraqa keç, pijandim ez wisala keç" 251

Carinan lêvên yarê sebeba dînbûna wî ye:

"Lêvên şirîn ez dîn kirim
Bêhêz û tîn û jîn kirim
Sêv in li ser sîngê bilind
Li dûrî dest in wek girav" 252

Carinan jî yar ji ber dûrbûnê wî benc* dike û dîn dike:

"Evîna dil çi bêjim ez?
Ji te durî wekî benc e
Heye çil sal di nêva dil
Çikandin wê lep û pence 91

…
Tu zanî ko ceger xwîn e
Ne dîn e lê kirim dîn e
Ji wan lêvan şêrîn bîne
Şeraba: Sêv û etrunc e" 253

253 Cegerxwîn, "Ahî ji Destê Dûriyê", *Şefaq*, r. 144

* Benc, gihayek e ku tê xwarin, pûç û serxweş dike, Cegerxwîn di wateya "pûç" de bi kar aniye.

254 Ludwig Wittgenstein, *Tractatus Logico-Plisophicus*, wer. Oruç Aruoba. Yapı Kredi Yayınları, İstanbul, 1996

255 Todorov, *Poetikaya Giriş*, r. 12

256 Canetti, *Kitle ve İktidar*, r. 308

## 5. Di Helbesta Cegerxwîn de Têkiliya Îqtîdarê û Raweya Fermanî

### 5.1. Têkiliya Îqtîdarê û Raweya Fermanî

Nirxandin û şîrovekirinên metnan çawa ku li gorî gelek metod, perspektîf û teoriyan dikare bê kirin, bi heman rengî, bi riya rêziman analîza metnan e. Analîzên bi riya rêzimanê, ji wê paşxaneya teorîk tên ku gelek tişt ango jiyan olana xwe dide zimên. Ludwîg Wîttgensteîn jî di berhema xwe ya bêhempa de, analîzên felsefî bi riya rêzimanê kiribû û xwestibû sînorên felsefeyê bi riya rêzimanê diyar bike.[254] Tzvetan Todorov jî ji aliyê poetîkayê ve balê dikşîne ser sê aliyên metnan ku yek jê sentaks e ku ji "rawe", "dem", "dîtin" û "deng" pêk tê.[255]

Di têkiliya îqtîdar û fermanê de, yek ji kesên ku ew tişt aniye ziman Elîas Canettî ye. Canettî li ser "emir" ango "ferman"ê û têkiliya wê ya bi îqtîdarê re wiha dibêje:

"Îqtîdar, fermanan weke barana tîrên biefsûn dibarîne; yên ku dibin hedefa van fermanan, mecbûr in ku xwe teslîm bikin. Ferman wan birîndar dike, wan vedixwîne teslîmiyeta meqama îqtîdarê û rê nîşan dide."[256] 

Çawa ku li jor jî hatiye diyarkirin, têkiliya fermandayînê û îqtîdarê bi hev re hatiye dayîn, îqtîdar fermanan dide. Ew feman jî dikare bê gotin ku bi riya ziman mimkun dibe. Ji bo fermanan jî raweya fermanî pêwîst dibe. Di vê beşê de jî bi vê bingeha rêzimanî wê li şopên pêwendiyên îqtîdarî ku di forma raweya fermanî de ne, hin nirxandin bên kirin.

**5.2. Di Helbesta Cegerxwîn De Rengvedana Têkiliyên Îqtîdarî Di Warê Raweya Fermanî De**

Di helbesta Cegerxwîn de yek ji raweyên herî pir hatiye bikaranîn "raweya fermanî" ye. Ev rawe hem di sernavên helbestan de hem jî di hundurê helbestan de pir hatiye bikaranîn. Ferman ango emir ku îqtîdarê refere dike û xisûsiyeteke îqtîdarê ye bûye taybetiyeke helbesta wî. Ji ber ku ew helbestvanê pêvajoya xwesteka avakirina netewe- dewletê ye qey wî, ev mafê "emir" û ango "ferman"ê di xwe de diye û loma jî ev rawe pir bi kar aniye. Loma geh dibêje, "Mela rabe"[257] geh dibêje, "Kurdo serê xwe rake"[258] û geh jî dibêje " Bibe partîzanek bi rist û dirist"[259]

[257] Cegerxwîn, "Mela Rabe", *Kî me Ez,* r. 51.
[258] Cegerxwîn, "Roja Xwendevana", *Agir û Pirûsk* r. 122
[259] Cegerxwîn, "Partîzan", *Zend-Avista, r. 33*
[260] Foucault, *"*Kapatılma, psikiyatri, hapishane", *İktidarın Gözü,* r. 13
[261] Cegerxwîn, *"* Ji Kulan Bûme Cegerxwîn" *Agir û Pirûsk* r. 51
[262] Cegerxwîn, "Sergerdan im Ez", *Hêvî,* r. 98

Di Cegerxwin de belkî ji teslîmiyetê û brîndariyê ku Canettî li jor behs kiribû bêtir rênîşandayîn bêtir rast be lê dawiya dawî di helbesta Cegerxwîn de ew dengê mûqtedîr ku ji qewla Foucault *rola pêxemberî*[260] ku ji bo entellektuelan gotibû, dikare bê bihîstin. Jixwe Cegerxwîn jî tiştên vedibêje, weke ayetan dibîne: "*Xêzên me nivîsîne bi xwe ayetê kurd in, dê piştî me di civatan de bixwînin*" [261]. Di dîwana heftan de jî jixwe rasterast dibêje: "*Rêber im-peyxember im, îlham ji ezmanê welat"*[262]. Yanî pêxemberekî hêza xwe ne ji Xwedê lê ji welêt distîne. Qey ji ber vê ye ku tim ji bo xelasiya welêt fermanan dibarîne û cehdê dike.

Di helbesta Cegerxwîn de jî bikaranîna raweya fermanî ya zêde ji fikr û hewcedariyên pêkanîna îqtîdarekê, ne azad in. Lewre ew bikaranînên raweya fermanî yên zêde ji ber têkilî û hewcedariyên wê rojê ku hem ji ber rola helbestvan e hem jî ji ber pirbûna têkiliyên serdestî-bindestiyê ne ku di civakê de hakim in. Di nav kurdên 93

fermana wan rabûyî de ku Cegerxwîn di nav wan de dijiya bikaranîna raweya fermanî ya zêde jî îroniyeke balkêş pêk tîne.
Cegerxwîn di gelek helbestan de raweya fermanî bi kar aniye ku yek ji wan helbesta bi navê “Fala Qereçiyê”[263] ye. Di vê helbestê de ji devê jina qereçî ne weke helbestvanekî weke fermandarê leşkerî, fermanan dibarîne:

263 Cegerxwîn, “Fala Qereçiyê”, *Agir û Pirûsk,* r. 76, 77

“Bi yek can û dil û deng,
Digel dijmin *bikin* ceng
Tev de *bidin* soza xwe,
Zû *bixwaz in* doza xwe.
Weke mêra *bibin* yek;
Bi dest *bigrin* gurz û çek.
Li ser çiyan *bibazin*;
Doza xwe tim *bixwazin*
Ji Kermanê ta Ferat;
Mûsil *bigrin* ta Xelat.
Yek serdarê xurt û jîr,
Li cem *rûnên* çend wezîr. 94

Ji bo Kurd û Kurdistan,
Ava *bikin* dibistan."
Di helbesta "Marşa Xortên Dîmûqrat" de ku nivîsîna marşan bixwe jî tevgereke îqtîdarî ye û di hin pirtûkên xwe de beşek ji marşan veqetandiye, wiha dibêje:
"Bo bilindî *herne* pêş,
Xurt û rindî *herne* pêş
Şêrîn welat, *rabin* xebat
Tev serbilin*d, rabin*"[264]

[264] Cegerxwîn, "Marşa Xortên Dîmûqrat", *Kî me ez?,* r. 166

[265] Cegerxwîn, *"*Hawar Hewar", *Ronak,* r. 13

Di helbesta "Hawar Hewar" de raweya fermanî ji bo êrîşa dijmin hatiye bikaranîn:
"Hawar dikim
gund û eşîr
Bajarî û
Mîr û gizîr
Dijmin ne xur-
Te *herne wa*
*Êrîş bikin*
Sêncê ewa"265 95

Di helbesta “Azadîxwaz im”, de “*De rabe ser xwe, kurê min rabe!*” di dawiya her çarînê de weke neqeratekê bi giştî panzdeh caran hatiye gotin:
“Keç û kurên kurd hemî şiyar bin
Ji bo serbestî hemî li kar bin
Ji hev re dost bin, dijê neyar bin
De rabe ser xwe, kurê min rabe!”266
266 Cegerxwîn, Azadîxwaz im, *Şefaq* r. 31
267 Cegerxwîn, “Ey Karker û Cotkar Bibin Yek”, *Aşitî,* r. 31
Ey Karker û Cotkar Bibin Yek
“Bibin yek ha, bibin yek!
Em tev herin ser çiyan
Li her der û her ciyan
Êrîş bikin ser neyar
Weke şêrên birîndar
Ji welatê xwe derxin
Dem û tarîx bi çerx in”267 96

**ENCAM**

Cegerxwîn ku hem aktorekî edebî hem siyasî hem jî ji bo demekê dînî ye, weke krîza di takekesiya kurdekî rewşenbîr ê sedsala bîstan ku di vê coxrafyaya netewe-dewletan de bê hestiyê piştê, xwestiye li ser nigan bimîne, helbestên siyasî, evînî û felsefî nivîsîne. Helbesta Cegerxwîn ji edebiyata kurdî ya klasîk bi taybetî ya tesewifî şikestineke epîstemolojîk e û wî li ser bingeheke civakî û polîtîk helbest nivîsîne.

Mijara tezê ku lêgerîna şopên têkiliyên îqtîdarî yên di helbesta Cegerxwîn de ye, bi tespîtkirin û şîrovekirina tekiliyên îqtîdarî ku di hin waran de rengvedanên wê çê bûne, hatiye pêşkêşkirin. Di tezê de hatiye dîtin ku cûr be cûr têkiliyên îqtîdarî mohra xwe li helbesta Cegerxwîn xistine û weke encam dikare bê gotin ku bandoreke rengvedanên têkiliyên îqtîdarî li ser helbesta Cegerxwîn çê bûye ku ev yek bi mînakên ku vê yekê disediqînin hatiye destekkirin. Ji aliyê peydabûn û rengvedana têkiliyên îqtîdarî yên di helbesta Cegerxwîn de, çend encamên sereke ev in:

1. Dikare bê gotin ku ji ber kêmbûn û qelsbûna tevgerên siyasî yên wê demê yên kurdan, helbestên Cegerxwîn bi kêrî fonksiyoneke siyasî hatine û vê yekê jî kiriye ku têkiliyên îqtîdarî bêtir di helbestên wî de peyda bibin. Lewre çawa ku edebiyata neteweyî di pêvajoya netewebûnê de xwedî cihekî taybet e, helbesta Cegerxwîn jî di heman çerçoweyê de roleke girîng lîstiye.
2. Fikra neteweyî ku lokomotîfa nivîsîna helbesta Cegerxwîn e, dikare bê gotin ku di nav têkiliyên îqtîdarî de, ya herî xurt e ku rengvedana xwe daye helbesta wî. Lewre fikra neteweyî di heman demê de fikra avakirina dewletekê ango îqtîdarekê ye û gelek fikrên ku têkildarî îqtîdarê ne bi vê kontektsê ve girêdayî di helbesta wî de peyda bûne.
3. Di têkiliya Cegerxwîn û Marksîzmê de ku yek ji wan diyardeyan e ku tesîr li fikir û helwesta wî ya îqtîdarî kiriye, dikare bê gotin ku ji Marksîstekî teorîk bêtir Marksîstekî pratîk e û ji bilî çend têgehên weke “proleter”, “karker”, “cotkar” “borcewazî” di xezîneya wî ya peyvan de, têgehên ku termînolojiya Marksîst temsîl bikin nînin.
4. Ji bilî têkiliyên rasterast yên îqtîdarî gelek cure têkiliyên din ên nerasterast jî rengvedana xwe dane helbesta Cegerxwîn ku mîmarî, dînitî, zanîn û bikaranîna raweya 97

fermanî ji wan waran e ku îqtîdar nerasterast rengvedana xwe didênê û di helbesta Cegerxwîn de rengvedanên van waran jî gelekî tê de cih girtine.
5. Cegerxwîn gelek helbestên evînî nivîsîne ku helbestên evînî bêtir di derheqê evîna welat de ne û evîn, evîneke îdeolojîk ango siyasî ye û têkiliyên îqtîdarî yên xurt tê de peyda bûne. Lewre jî di helbestên evînî de têkiliyên îqtîdarî bi awayekî xurt peyda bûne ku ev evîna îdeolojîk di xizmeta avakirina îqtîdareke neteweyî de ye.
6. Weke têkiliyeke nerasterast ya îqtîdarî, rengvedana têkiliyên îqtîdarî di warê mîmariyê de jî bi awayekî xurt hatiye dîtin û şîrovekirin. Xaniyên gundî, rêncber, cotkar û feqîran ku weke kesên ji îqtîdarê bêpar hatine qebûlkirin, xwedî mîmariyeke cuda; xanî û avahiyên dewlemend, axa û began ku weke xwedî îqtîdar hatine qebûlkirin jî, xwedî mîmariyeke cuda ne.
7. Dînitî jî weke têkiliyeke îqtîdarî ya nerasterast di helbesta Cegerxwîn de cih girtiye û rengvedana wê çê bûye ku di helbesta Cegerxwîn weke stratejiyekê hatiye bikaranîn. Lewre hem Cegerxwîn ev stratejî bi kar aniye û sûcdarkiriye û hem jî hatiye sûcdarkirin û di gelek helbestan de bersiva vê yekê daye.
8. Tekiliya zanîn û îqtîdarê di helbesta Cegerxwîn de gelek cih girtiye ku ji bo “avakirina îqtîdarê”, “têkbirina dijmin”, “xurtbûn” û hwd. zanîn weke riyeke sereke hatiye dîtin. Lewre têgehên mîna “xwendegeh”, “xwende”, “xwendin”, “pênus”, “zana” û hwd. pir hatine bikaranîn û rengvedanên bi vî awayî yên zanînê mohra xwe li helbesta Cegerxwîn xistiye.
9. Di helbesta Cegerxwîn de yek warên ku tê de têkiliyên îqtîdarî hatine dîtin jî “Raweya Fermanî” ye ku di nav raweyên rêzimanî yên helbesta Cegerxwîn de yek ji wan e ku herî pir hatiye bikaranîn. Lewre bikaranînên weke “lêxin”, “bikujin”, “rabin”, “herne” di nava kontektseke bidestxistina îqtîdarê de hatine dîtin û şîrovekirin. 98

**ÇAVKANÎ**

Adorno, Theodor W.: *Minima Moralia,* wer. Orhan Koçak, Ahmet Doğukan, Metis Yayınları, İstanbul, 1998
Ahmedzade, Haşim: *Ulus ve Roman: Fars ve Kürt Anlatısal Söylemi Üzerine Bir Çalışma*, wer. Azad Zana Gündoğan, Pêrî Yayınları, İstanbul, 2004
Alan, Remezan: *Bendname,* Weşanên Avesta, *Stembol,* 2009
Althusser, Louis: *İdeoloji ve Devletin İdeolojik Aygıtları*, wer. Alp Tümertekin, İthaki Yayınları, İstanbul, 2003
Altınay, Ayşe Gül (amd): *Vatan Millet Kadınlar*, İletişim Yayıncılık, İstanbul, 2009
Anderson, Benedict: *Hayali Cemaatler*, wer. İskender Savaşır, Metis Yayınları, İstanbul, 2011
Bamernî, Newzad Ebdûla: *Aydyolojya Di Hozanên Cegerxwîn Da,* Spîrêz Press & Publisher, Dihok, 2007
Batur, Enis: *Kuram,* Kitap 7, Ocak 1995
Bedîuzzeman Seîdê Norsî: *Dîwana Herba Urfî,* wer. Merdan Newayî Zehra Yayıncılık, İstanbul, 2009
Bediüzzeman Said Nursi, *İçtimai Dersler*, Zehra Yayıncılık, İstanbul, 2004, r. 153
Bumin, Kürşat: *Demokrasi Arayışında Kent,* Çizgi Kitabevi, Konya, 2010
Canetti, Elias: *Kitle ve İktidar*, wer. Gulşat Aygen, Ayrıntı Yayınları, İstanbul, 2010
Cegerxwîn: *Agir û Pirûsk*, Weşanên Avesta, Stenbol, 2003
Cegerxwîn: *Aşitî*, Weşanên Avesta, Stenbol, 2003
Cegerxwîn: *Hêvî,* Weşanên Avesta, Stenbol, 2003
Cegerxwîn: *Jînenîgariya Min,*Weşanên Apec, Stockholm, 1995
Cegerxwîn: *Kî me Ez,* Weşanên Avesta, Stenbol, 2003 99

Cegerxwîn: *Ronak,* Weşanên Avesta, Stenbol, 2003
Cegerxwîn: *Sewra Azadî,* Weşanên Avesta, Stenbol, 2003
Cegerxwîn: *Şefaq,* Weşanên Avesta, Stenbol, 2003
Cegerxwîn: *Zend–Avista,* Weşanên Avesta, Stenbol, 2003
Cevizci, Ahmet: *Felsefe Sözlüğü*, Paradigma, İstanbul, 2000
Çemrek, Murat: *Bilginin Küreselleşmesi: Bilgi Toplumunda Siyaset*
http://www.sde.org.tr/tr/haberler/563/bilginin-kuresellesmesi-bilgi-toplumunda-siyaset.aspx
(wergirtina ji înternetê 13 Nîsanê 2011)
Doskî, Perwîn Re'ûf Hadî: *Hizra Navneteweyî û Rengvedana Wê Di Hozana Nû Ya Kurdî da (Cegerxwîn, Goran û Qedrîcan wek nimûne*), Spîrêz Press & Publîsher, Dihok, 2011
Eagleton, Tery: *Edebiyat Kuramı,Giriş,* wer. Tuncay Birkan, Ayrıntı Yayınları, İstanbul, 2011
Erasmus: Deliliğe Övgü, wer. Nusret Hızır, Kabalcı Yayınevi, İstanbul, 2000
Evdil Fetah, Deham: *Nêrîneke Rexneyî Li Helbestên Kurdî*, Dar ElKatîb El-erebî, Şam, 1992
Farqînî, Zana: *Ferhenga Kurdî-Tirkî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê, İstanbul, 2005
Foucault, Michel: *Cinselliğin Tarihi*, wer. Hülya Uğur Tanrıöver, Ayrıntı Yayınları İstanbul, 2010
Foucault, Michel: *Deliliğin Tarihi*, wer. Mehmet Ali Kılıçbay, İmge Kitabevi, Ankara, 1995
Foucault, Michel: *İktidarın Gözü,* wer. Işık Ergüden, Ayrıntı Yayınları, İstanbul, 2007 100

Fromm, Erich: *İtaatsizlik Üzerine Denemeler Psikolojik ve Ahlaki Bir Sorun Olarak İtaatsizlik*, wer. Ayşe Sayın, Mert Yayıncılık, İstanbul,
Hassanpour, Amir: *Kürdistan'da Milliyetçilik ve Dil*, Wer. İbrahim Bingöl, Cemil Gündoğan, Avesta Yayınları, İstanbul, 2005
İlmiye Çığ, Muazzez: *Kur'an, İncil ve Tevrat'ın Sümerdeki Kökeni*, Kaynak Yayınları, İstanbul, 2005
Jameson, Fredric: *Modernizmin İdeolojisi, Edebiyat Yazıları*, wer. Kemal Atakay, Tuncay, Birkan, İstanbul, 2005
Jusdanis, Gregory: "İmparatorluktan Ulus-Devlete", *Gecikmiş Modernlik ve Estetik Kültür Milli Edebiyatın İcadı*, wer. Tuncay Birkan, Metis Yayınları, İstanbul, 1998
Kasım Aydemir, Özgür, *Hataî'nin Şiirlerinden Hareketle İktidar Çözümlemesi*, http://turkoloji.cu.edu.tr/DILBILIM/ozgur_kasim_aydemir_hatai_iktidar_cozumleme.pdf
Kavafis, Konstantinos: *Bütün Şiirleri, Duvarlar*, Varlık Yayınları, wer. Herkül Millas, Özdemir İnce, İstanbul
Kaynak, Yusuf: *Jînenîgariya Cegerxwîn û Berhemên Wî,* Weşanên Do, İstanbul, 2010
Marks, Karl, F. Engels: *Felsefe Metinleri,* amd. Muzaffer Erdost, wer. Kenan Somer, Ahmet Kardam, Sevim Belli, Vahap Erdoğdu, Yurdakul Fidancı, Arif Gelen, Alaattin Bilgi, Sol Yayınları, Ankara, 2009
Okumuş, Ejder: "Bedene Hükmetmenin Sosyolojisi", Şarkıyat İlmi Araştırmalar Dergisi, h. 2, Kasım 2009, http://e-sarkiyat.com/makaleler/ejderokumus. pdf, (wergirtina ji înternetê 20 Hezîran 2011an)
Ordîxanê Celîl: *Cegerxwîn'in Yaşamı ve Şiir Anlayışı*, wer. Edip Polat, Evrensel Basım Yayın, İstanbul, 2004
Ordîxanê Celîl: *Şî'r û Şaristanî Cegerxwîn*, wer. D. Îzedîn Mistefa Resûl, Spîrêz Press &Publîsher, Dihok, 2009 101

Özalp, Davut: *Jînenîgarî, Têkoşîn û Berhemdariya Cegerxwîn*, amd. Mehdî Tanrıkulu, Weşanên M, İstenbol
Parlatır, İsmail û ên din, *Türkçe Sözlük*, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara, 1998
Paz, Octavio: *Çamurdan Doğanlar*, wer. Kemal Atakay, Can Yayınları Ltd. Şti. İstanbul,1996
Sevan Nişanyan, *Sözlerin Soyağacı, Çağdaş Türkçenin Etimolojik Sözlüğü,* ç. 3, Adam Yayınları, İstanbul, 2007
Sevim, Ayşe*: Feminizm*, İnsan Yayınları, İstanbul, 2005.
Stalin, J. : *Diyalektik ve Tarihsel Materyalizm*, wer. Mustafa Şentürk, Yorum Yayınları, İstanbul, 1993
Todorov, Tzvetan: *Poetikaya Giriş,* wer. Kaya Şahin, Metis Yayınları, İstanbul, 2008
Tuncer, Emrah: "İdeoloji-İktidar ve Mimarlık: Roma Örneği", http://www.sehirplanlama.org/index.php?option=com_kunena&func=view&catid=153&id=682&Itemid=36 (wergirtina ji înternetê 11 Adara 2012an)
Vali, Abbas: *Kürdistan Cumhuriyeti. İran'da Kürt Kimliğinin Gelişimi,* wer. Zeri İnanç Avesta, 2010
Wittgenstein, Ludwig: *Tractatus Logico-Plisophicus,* wer. Oruç Aruoba, Yapı Kredi Yayınları, İstanbul, 1996
Xweşnav, Zilkîf: "Di Helbesta Kurdî De Destpêka Bizava Romantîzmê û Taybetmendiyên Romantîzma Hacî û Cegerxwîn (gotara seminerê ya çapnebûyî)
Yalom, Marilyn: *Memenin Tarihi*. wer. Ayşe Gün. Çitlenbik Yayınları, İstanbul, 2002
Yekdeş, Ömer Faruk: *Nazım Hikmet ve Cegerxwin de Aşk Şiirinin İdeolojisi*, Bilkent Üniversitesi Türk Edebiyatı Bölümü, (Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi), Ankara, 2008 102
Zaza, Nureddin: *Bir Kürt Olarak Yaşamım,* wer. Aytekin Karaçoban, Mezopotamya Publishing Huddinge, Sweden, 1994